


RONÎ

Kovara Çandî, Edebî, Zanyarî



*Dembihêrkek li ser nivîskaran
Li ser jiyanê - Xelîl Cibran
Bo xatirê jinê - Eleaddîn Secaddî
Nirxandina Gotinêñ Gunehkar
Romana Toqa Naletê
Filozofê Kurd - Dînawerî
Zîlan : Împaratoriya kurdan
Sosyolojiya romana kurdi*



Kovara Çandî, Edebi, Zanyarı

Hejmar : 1

Utgivare / Xwedî:

Helwest Forlag





ISBN : 2000 - 5725



Ansvarig / Berpirsiyar : Lokman Polat
Layaout / Rûpelsazî - Helwest
Çap : Peknotryck ofset / Stockholm

Çapa yekem : Stenbol – Stockholm/ 2010

Adres / Navnisan
Tensta Alle 43. 2tr.
16364 Spånga / Sweden

.....
Inonu mah. Babil Sk. No : 27/3
Şişli / Stanbul / Tırkiye

.....
hesabê bankê : 0307111
Akbank - 0020 Kadikoy



helwestforlag@hotmail.com
lokmanpolat2000@yahoo.se



Kovara Çandî, Edebî, Zanyarî

Ronî kovara dengê zanînâ edebî ye û ji bo pêşveçûna kultur û lîteratura kurdî xizmet dike.

Ronî dê bibe kovara analîzî û lîteraturiyê. Dê giranî bide nivîsên li ser danasîn, şirovekirin û nirxandinâ berhemêñ edebî yên kurdî.

Dê di kovara Ronî de gelek nivîskarêñ kurd bi kurdî nivîs, gotar, analîz, nirxandin binivîsin. Hinek nivîskarêñ kurd yên jin jî dê bi nivîsên xwe naveroka kovarê dewlemed bikin.

Di kovara Ronî de dê rîbaza peyva azad pêk bê, lêbelê dê nivîs û rexneyêñ siyasi yên li siyaseta kurdan, li partî û rêexistinêñ kurdan neyêñ weşandin. Ji blî rexneyêñ siyasi yên li partî û rêexistinêñ kurd dê hemû cure cure nivîsên çandî, edebî, felsefî, dîrokî, zanyarî, civakî û rexneyêñ edebî hebin. Dê derheqê weşanêñ kurdî de agahdarî bêne weşandin.

Kovar dê li gor navê xwe bibe ronahî û di gelek waran de riya pêşveçûnê ronî bike, pirs û pirsgirêkên ziman, çand û edebiyata kurdî minaqeşe bike. Ji dagirtina valahiya rexneya edebî hewl bide.

Di kovara Ronî de nivîsên danasîn, nirxandin û analîzên derbarê pirtûkén sînemayê, şano, çirok – novel -, roman û helbestê dê asoyê xwendevanan fereh bike, zanîna wan bêtir bike. Ew ê hewl bide bi hindikayî be jî valahiya rexnegiriya edebî ji holê rake û rê li pêşveçûna rexnegiriya edebî vebike. Pêwîstiya edebiyata kurdî bi rexnegiriya edebî û analîzên zanîstî yên edebî heye û divê ev pêk were.

Di kovarê de nivîsên dirêj dê wek beş bi beş bêne weşandin. Nivîsên dirêj di careke de weşandin kovarê difetisîne. Di her hejmara kovarê de çiqas nivîsên cure, pireng û pirdeng hebin, çiqas babetên cuda, mijarêñ rengoreng hebin naveroka kovarê ewqas dewlemend dibe. Ji bo kovareke rengin, pîrhêlî û dewlemend weşandina nivîsên li ser mijarêñ curbecur pêwîst e.

Weşandina kovara Ronî ji bo pêşveçûna çand, edebiyat û zimanê kurdî pêşveçûneke, hewldaneke, welatparêzî û fedekariyê ye. Ronî berdewama kovara Helwest e, bi navekî din domandina wê ye.

Weşandina kovarê hêsan nîn e. Jê re ked divê, xebat divê. Ji bo kovar jiyana xwe ya weşanê bidomîne divê xwendevanê kovarê mil bidin kovarê û bibine abone.

Hetanî hejmara bê hûn bimînin di xweşiyê de.

Lokman Polat
Berpirsiyar û birêvebirê kovarê

LI SER JIYANÊ



Xelîl Cibrân
Wergêr : Husein Muhamed

Jiyan di deryaya bêkesiyê de giravek e ku zinar hêvî,
dar xewn, gul bêkesî û çem tînî ne.

Kesûkarên min, jiyana we giravek e ku ji hemî girav
û deverên din veqetayî ye. Ferq nake çend keşti ji
beravên we diçin deverên din an çend têr beravên
we, hûn her bitenê dimînin ji ber jan û bêriya bêke-
siyê. Hûn xerîb in ji kesûkarên xwe û dûr in ji dil-
soziya wan.

Bira, min dîtiye tu li ser koma zêrén xwe rûniştî yi
û ji dewlemendiya xwe kêfxweş î - bi gencîne û
xezîneyên xwe serbilind î û bawer dikî ku lepa zêr
xirxalek nepenî ye ya hêvî û ramanên te û xelkê
dighîne hev.

Min tu bi çavêن xwe dîtî ku tu pêşengiya leşker û artêşa xwe dikî û armanca te hilweşandina kel û asêgehên dijminên te ye. Lê ku min dîsan carek dî lê nerî, min tenê dilek bêxwedî li paş sendoqên zér cemidi, di rekehek zérîn a firinneyek tî de dît û di vê rekehê de tenê amanek avê yê vale min dît.

Bira, min dîtiye tu li ser tac û textê şan û şerefê rûniştî yî û gel li derdorî te ye û pesna mezinahiya te, gernasiya te û hişmendiya te dide û li te dinere û mîna ku pêxember bî coşıya giyanê wan hildikeve ber perrêن esmanan.

Ü dema te li bindarêن xwe dinerî, min dît ku ji rûyê te bextiyarî, hêz û coşa serkeftinê dixwiya goya ku tu giyanê wan î.

Lê bibîne, ku min carek din tu dîtî, min dît ku tu bêxwedî li rex textê xwe yî, mîna sergumkiriye kî yê destê xwe bilind dike û ji sawêr û tarmayiyêñ nepenî lava û liyanan dike û bexşandin û dostaniyê hêvî dike - tika dike banek hebe bila bêserûber ji be lê tenê germî û dostanî hebe.

Bira, min dîtiye ku te ji jinek bedew û delal hez kiriye û dilê xwe raspartiye delaliya wê. Dema min dît ku ew bi dilnermî û evínek dayikane li te dinere, min ji xwe re got: Her bijî Evîn ya dawî li bêkesiya vî camêrî anije û dilê wî gihandiye dilê yén din.

Lê ku min dîsan lê nerî, min di dilê evîndar de dilek dî yê bêkes dît ku bi giriyê xwe bêencam té dikoşe ji keçikê re nehîniyêñ dilê xwe derbibe; û di giyana

te ya bi evînê xemldayî de min hê giyanek din a bêkes dît ku mína ewrên livok bû û bîlasebeb hêvî dikir bikare xwe bike xunav û rondik di çavêن dil-dara te de.

Bira, jiyana te jîngehek bi tenê ye, veqetayî ji yên xelkê. Ew xaniyek e ku çavê ti cîranan nakeve hindirî. Heke ew di nav tarîtiyê de ba, lampeya cîrané te dê nikariya wê ron bike. Heke qûtê pêdivî tine ba, te dê neşiyaba wî ji embara cîranan dagirî. Heke ew li beyaristanekê ba, te nedikarî wî raguhezînî gulistanekê ya bi destêن xelkê hatiye çandin û téwerdan. Heke ew li gupika çiyayekî ba, te dê nikariya wê bînî geliyekî piyêن xelkê dewisandî.

Bira, tenêtî beşek ji jiyana te ye, û heke ev tenêtî û veqetayîtî tine bûye, tu dê ne tu û ez dê ne ez bam. Eger ew neban, dema min dengê te dibihîst, min ê belkî bigota ev dengê min e; yan dema min rûyê te bidîta, min ê bawer bikira ku ez di neynik û awêneyê re xwe dibînim.

Ji pirtûka Xelîl Cibran Dengê Mamoste (Voice of the Master) hatiye wergirtin û wergerandin.


Romana Kurdi

û

Pêwîstîya nîvîsîna

sosyolojîya romana

kurdî



Lokman Polat

Ez dixwazim di derbarê romana kurdî de dîtin û ramanên xwe bi çend gotinan pêşkêşê xwendevanên kurd bikim. Li ser vê mijarê çiqas pir nivîs werin weşandin ewqas baş e. Di hejmarên din de jî nivîsên derbarê romana kurdî de bê weşandin baş dibe.

Bi min divê minaqeşe li ser romana kurdî heye, tune neyê kirin. Romana kurdî heye. Lê, di kîjan radeyi de ye? Çiqas qels e, çiqas serketiye? Di romana kurdî di kîjan merhaleyê de derbas bû û niha di kîjan rewşê de ye? Di romana kurdî de şâşî û kêmanî çine? Di romana kurdî de kîjan cure teknîka nivîsinê tê bikaranîn? Tip û karekterên romana kurdî çawanin? Di romana kurdî de

erotîzm çîma kême? Çîma romanên kurdî yên macera – bi heyecan – hindikin? Pirs û pirsgirêkên romana kurdî çîne? Ü hwd di gelek babetan de di derbarê romana kurdî de dikare minaqeşe were kirin.

Pêşveçûna romana kurdî

Heger mirov sî sal berê û niha bide miqabilê hev, niha romana kurdî pêş ketiye, ber bi dewlemendbûnê ve diçe. Lêbelê dîsa jî di nav edebiyata kurdî de, li gor çîrok û helbesta kurdî, romana kurdî qels e. Romanên xwerû bi kurdî ji du sed, sê sedî nabihûrin. Tê bîra min, ji sala 1975an ta 1980yî li Kurdistanta bakur tenê romaneke bi kurdî hate weşandin. Ew jî romana Erebê Şemo “Şivanê Kurd” bû. Di wê demê de gelek kovarên siyasetên kurdan bi kurdî û tirkî derdiketin. Hinek pirtûkên helbestên kurdî jî derketin, lê qet romanek jî bi kurdî derneket. Li gor wê demê niha rewş ber bi başiyê ve diçe. Helbet ev jî encama têkoşîna azadiya gelê kurd e, berhema kar û xebata doza azadiya netewî ye.

Di wan salan de di gel romana Ereb Şemo, romaneke/çîrokeke Cegerxwîn jî li bin xetê derketibû û bi dizî di nav destên xwendevanên kurd yên Kurdistanta bakur de digeriya. Navê wê jî “Reşoyê Darê” bû. Ev pirtûk li gor hinekan roman û li gor hinekan çîrok bû. Bi min mirov dikare wê wek kurteromaneke bi nav bike, yan jî noveleke dirêj.

Ji sala 1975an ta 1980yî, min bi sedan romanên nivîskarên biyanî (bi piranî jî romanên nivîskarên rus, tirk, ewropî û amerîkî) xwend. Lê, ji bo ku di wê demê de romanên kurdî nehatibûn nivîsîn û weşandin, min tenê van herdu pirtûkên ku min bi nav kir (Şivanê Kurd û Reşoyê Darê) xwend.

Sala 1990î bû destpêka romannivîserîya kurdî. (Mexseda min Kurdistana bakur e. Kurdên Kafkasyayê û yên Kurdistana başur ji berê ve hinek romanên kurdî nivisibûn. Lê, romanên ku wan nivisibûn bi tîpêن kirîlî û erebî bû. Kurdên bakur nikaribûn van herdu alfabetian bixwînin.) Li Ewropayê romannivîserîya kurdî dest pê kir. Ji salêن 1990î heta sala 2002an gelek romanên kurdî hatin weşandin. Di nav nivîskarêن kurd de, yê ku herî pir romanên kurdî nivîsî û weşand Mehmed Uzun e. Di gel wî, nivîskar Mustafa Aydogan, Hesenê Metê, Lokman Polat, Aram Gernas, Yaqop Tîlermenî, Mihemed Dehsîwar, Suleyman Demir, Mezher Bozan, Xurşîd Mîrzengî, Zeynelabidîn Zinar, Bubê Eser, Laleş Qaso, Firat Cewerî, Adîl Zozanî, Medenî Ferho, Torî û hwd, jî romanên kurdî nivîsin û weşandin. (Di nav nivîskarêن romannivîser de çar nivîskarêن ku herî pir romanên kurdî nivîsîne û weşandine Mehmed Uzun, Lokman Polat û Laleş Qaso û Medenî Ferho ne.)

Qelsiya romana kurdî

Di gel ku bi dehan nivîskarêن kurd hinek romanên kurdî weşandin jî, ev têr nake. Romana kurdî hej jî di gelek waran de qelsiya xwe didomîne. Qelsiya romana kurdî ne tenê ji bo Kurdistana bakur, ji bo hersê perçeyên din ên Kurdistanê jî weha ye. Li Kurdistanâ rojhilat du, sê romanên xwerû bi kurdî hene. Di Kurdistanâ başûrê rojava de du, sê nivîskar çend roman nivîsîne û hew. Kurdistâ başur ku heftê sal e ji hêla ziman ve azad e, pênc, şes nivîskaran romanên kurdî - zaravayê soranî - nivîsîne. Hejmara romanên wan jî ji tiliya destan nabûre. Herweha qelsiya afirandina romanên kurdî li seranserê Kurdistanê, di hemû beşan de didome.

Ji hêla naverokê de ji qelsiyeke romanên kurdî yên heyî hene. Qelsiya herî berbiçav, tunebûna sahneyên erotîk, ramanêñ felsefi û hestêñ psîkolojîk e. Divê cure cure romanêñ kurdî hebin. Romanêñ realîst, surrealîst, sosyal, civakî, modernîst, postmodernîst, sembolîst hebin. Divê romanêñ dîrokî, romantîk, macera û heta yên polisiye ji hebin. Hinek xwendevan dibe ku ji romanêñ fantastîk an romantîk hez bikin, hinek dikarin ji romanêñ polisiye yan yên ku mijara wê li ser bûyerekî dîrokî hatiye hunandin, hez bikin. Yanê divê romanêñ pirreng û pir cure hebin.

Ziman hebûna neteweyî ye

Ziman, çand û edebiyata neteweyekî hebûna wî neteweyî ne. Neteweyek ku zimanê xwe, çanda xwe, edebiyata xwe wenda bike, ew bi xwe ji wenda dibe, di nav neteweyen din de dihele, asîmîle dibe. Yên ku neteweyan li ser lingan dihêle ziman, çand û edebiyata wî neteweyî ye. Sedemên ku çîma romannivîsiya kurdî ewqas qels maye? gelek in. Lê, sedemê bingehîn siyaseta nîjadperesi û şovenîya dewleta dagirker a tirk e. Ev siyaseta wan a şoven, bi zagonêñ paşverû hebûna netewa kurd û zimanê kurdî qedexe kiribû. Zimanekî ku 80 sal qedexebe, helbet pêşketina wî zimanî wek ku tê xwestin pêk nayê, edebiyata wî zimanî beyar dimîne, edebiyata ku bi hezar zor û zehmetan bê afirandin ji qels dimîne. Civak paşve dimîne û kar û xebata rewşenbirî bi berhem nabe. Heger li Kurdistanâ bakur di dibîstanan de bi zimanê kurdî perwerde bihatana kirin, bi kurdî pirtûk, kovar û rojnameyên rojane bihata weşandin, dê romana kurdî ji bikemiliyana û gelek xurt bibana, pêşvebiketana.

Hebûna cureyên romanan dewlemendî ye

Edebiyata Kurdi a bi devkî gelek xurt e, dewlemend e. Edebiyata nivîskî qelse, lê di van salêن dawîn de, edebiyata nivîskî jî ber bi pêş dikeve, pêş ve diçe, dewlemend dibe. Di nav edebiyata kurdî de qelsiyek jî di hêla romanêن dîrokî de xwe nişan dide. Nivîskarêن kurd yên romanivîser divê romanê dîrokî jî binivîsin. Nivîsîna vê cure romanê edebiyatê dewlemend dike.

Roman û dîrok bi hevûdu ve eleqederin, bi hev ve girêdayîne. Romanek dema bê weşandin, ew roman dixwazî li ser dîrokê û dixwazî li ser bûyerên rojane ya dema nû be, piştê demeke dûr û dirêj -yanê nabeynê de dem û dewran bibûre- ew roman ji dibe berhemek, belgelyek anku pirtûkeke dîrokî. Dema ku roman tê weşandin, şahîdê dema xwe ye, lê piştê demeke ew ji dibe dîrok.

Romana dîrokî di sedsala 19'an de bi romannivîs Walter Scott dest pê kiriye. Berhemên W. Scott, Balzac, Tolstoy, Pûşkin, Dostoyevskî berhemên klasîk yên dîrokîne. Di van berheman de kes û bûyer li gorê rastiya dîrokî hatine afirandin, lê gelek xeyal jî lê hatine zêdekirin. Berhemên Aleksander Dumas li ser bingeha macerayêن dîrokî, wek çîrokên serpêhatinê, lê bi teknîk û forma romanê hatine nivîsin.

Hinek romanê dîrokî jî li ser serpêhatiyêن şexsiyetên dîrokî hatine afirandin. Her wekî romanê ku li ser Hz. Ali, Timûrleng, Raspûtîn, Kleopatra, İskenderê Mezin, Hanîbal, Gilgamêş, Ramses, Hz. Musa û yd, hatine afirandin. (Di vir de hêjayê gotinê ye, ku şaristaniya misri ya kevin gellek hikari li mejiyê romannivîsan kiriye.

Hinek roman ji hene ku ji vê cureya romanê re dibêjin romanên dîrokî yên fantaziyê, yan ji romanên fantaziyên dîrokî. Romana Catherîne Hermâny “Wezirê şevê”, ya Mîka Woltari “Evîndarêن Bîzansê”, ya Umberto Eco “Navê Gulê” û hinek romanên Necîb Mehfoz û Amin Maalouf di vê kategoriyê de ne. Di van romanen de dîrok û fantazî têkilhev dibe. Büyerên ku di van berheman de têne qalkirin bûyerên dîrokî ne û bi fantaziyan hatine xemlandin.)

Divê romanên serokên serîhildanan û serhildêrên çekdarên kurd bê nivîsîn

Hêj ji romana serokên serîhildêrên kurdan nehatine nivîsîn. Bi min, divê romana Şêx Ubeydulahê Nehri, Şêx Seîd, Seyid Riza, Elişer, Qazî Muhammed, Îhsan Nurî Paşa, M. Barzanî, A. Ocalan û hwd bên nivîsîn. Li Kurdistanâ bakur şerekî bîstûpênc salan hat pêkanîn, hêj ji romana vî şerê bîstûpênc salan nehatiye nivîsîn. Di hemû serîhildanên kurdan de gelek mîrxasên bi navûdeng hebûn, ji Yado heta Mahsûm Korkmaz, ji Hesen Keyayê Celkî heta Serdar Ararat bi sedan egîd û mîrxas bi mîraniya xwe ketin nav rûpelên dîroka têkoşîna Kurdistanê. Divê ew hemû egîd û mîrxas bên bîranîn û romanên wan bên nivîsîn.

Guhertinên romanê

Di romanê de pêşketin û guherînên nûh çêdibin. Dinya diguhire, roman ji diguhire. Teknîka nivîsîna romanê diguhire, nûjen dibe. Romanên Tolstoy, Dostoyevskî, Viktor Hugo, Balzac û yên Susan Tamaro, Paulo Cuelho û Aleksandro Barîco ne wek hev in. Romanên berê her cîldê wê 300 - 400 rûpel bûn, yên niha wek

cîld nîn in û her roman ji 150 rûpelî nabûre. Hinek romanê nivîskarên Îtalî 100 rûpel in. Civak çiqas pêş bikeve, modern bibe, ji hêla îlîm û teknîkê ve çiqas pêşketin çêbibin di romanê de ji dê herweha pêşketin çêbibe. Yanê pêşveçûnê di Fîzîk, Astronomî û hemû şaxên îlmê li ser ramanê felsefîk û dîtinê edebî tesîreke mezin dike. Dîtin û ramanê felsefi û edebî ji li ser civakê tesîr dike.

Zimanê romanê divê gelek hêsan be. Zimaneye edebî, lê hêsan ku xelq jê fêm bike. Ji xwe maneya kelîmeya romanê di serî de “pirtûka ku bi zimanê gel hatiye nivîsin” bû. Mirov gava li sedsala 19'an ya gelên Ewropa rojava dinêre, ew dem dema xurtbûn û pêşveçûna romanê bû, lê piştê wê demê ji, romanê pêşveçûna xwe domand e. Romanê wê demê bi zimanê xelqê hatibûn nivîsin û li ser xelqê tesîr kiribû. Di dema ronasansê û reforman de çanda gelên rojava bi romanê formeke nûh stend. Roman bi vê forma xwe ya nûh bû haceta guherandina civakê. Roman bû xwediye fonksiyonek girîng. Ev fonksiyona wê ya girîng hêj ji didome.

Bi kurtahî, Roman hêj nûh e. Sê asir berê hatiye avakirin. Di esra 18 û 19an de gihîstiye kemala xwe. Roman hêj ji ber bi pêş ve diçe, bi teknîkên nûh dikemile. Di romanen de têkiliyên mirovan -însanan-yên bi hevdu re û bi xwezayiyê re bi hawakî berfireh û bi teferuat têt qalkirin, bi hunerî tê hîkayekirin. Di nav van têkiliyan de; ji pirsên ruhî hetanî rewşa aborî û gelek munasebetên din hene. Di hîkayekirina evîndariya du ciwanan de trajedî heye, munasebeta civakî ya wê deverê, wê heremê heye. Roman vekirin û derketina holê ya munasebeta civakî ye. Roman keşifekî nûh e,

îcatekî nû ye. Teknîka avakirina wê tim tê guherandin, tê nûhkirin.

Kar û xebata ku ez dikim, tiştên ku dixwazim pêk bînim, ev tiştin ku nivîskarê hêja Marîo Vargas di demek de hanîbû zimên û li ser girîngiya wî rawestiya bû. Yanê “Niha yek ji xebatê min yên girîng ewe ku, ez bi piraniya xelkê bidim bawerkirin ku lazime em xwedî li edebiyatê derkevin, Hesasiyet û azadiya cîhana pêşerojê girêdayî edebiyatê ye. Edebiyat garantiya azadiyê ye, ji ber ku ew weke her tiştê din nikare were birêvebirin û kontrol kirin.”

Edebiyat bingehike hem ji bo zindîhiştina rexneyan li hemberî rastiya cîhanê û hem ji bo nûkirin û parastina ziman e.”

Pêwîstiya nivîsîna sosyolojiya romana kurdî

Belê, pêwîstiya nivîsîna sosyolojiya romana kurdî heye. Min di pirtûka xwe ya bi navê “Bandora Edebiyatê” û pirtûka bi navê “Bîst Romanên Kurdî” de edebiyat çiye, bandora wê çawaye, roman çiye û çend cure roman hene, bi dirêjahî rave kiriye. Lê, divê li ser romanên kurdî lêkolînên berfireh bêne kîrin û sosyolojiya romana kurdî bê amadekirin.

Ji bo ku dewleta kurdan ya serbixwe tunebû, lomajî kurd bi her awayî ji gelek tiştan mehrûm man. Gel û neteweyênu ku dewletênu wan hene bi her awayî pêş ketin. Di unîversîte, fakulte û akademyên wan de li ser gelek mijaran tezên îlmî / zanîstî hatin nivîsîn, grubênu xebatê hatin pêkanîn û li ser gelek tiştan lêkolînên berfireh hatin kîrin.

Li dibistanan ekolên edebî pêk hatin, lêkolîn û lêgerînên edebî û dîrokî hatin kirin. Wek mînak; grubeye -komeke- li ser edebiyata klasîk lêkolîn dike û encama lêkolîna xwe bi şewe yeke îlmî / zanîstî amade dike û pêşkêşê xwendevanan dike. Edebîyatzanekî yan jî edebiyatnasekî li ser romanên Tolstoy, yek li ser ê Dostoyevskî, yek li ser hemû romanên Malraux, yekî din li ser romanên Stendhal û hwd, lêkolînê berfireh dîkin. Di Universîteyan de, hetanî niha kesekî li ser helbestvan, çîroknivîser yan jî romannivîserekî kurd lêkolîn nekiriye, li ser wî / wê nivîskarî û berhemên wî / wê nenivîsiye. Divê xwendevanên Universîteyê tezên xwe yên doktorayê li ser şexsiyetên kurd, edebiyata kurdî û hwd, tiştêk ku bi kurdan ve têkildare amade bikin.

Herweha hetanî niha kesekî analîzker, lêkolînvan, edebiyatnas li ser mijarêni di edebiyata kurdî de trajedî çiye, çiqas heye, îronî çiye û di kîjan berhemî edebî de îronî heye, şadimanî çiye û di kîjan berhemîn edebî de şadimanî -pevşabûn- heye û çîma di piraniya berhemîn edebî yên kurdî de şadimanî tune, nenivîsiye. Ji xeynê sê, çar kesan piraniya nivîskar, lêkolînvan û rewşenbîrê kurd serê xwe li ser pirs û pirsgirêkên edebiyata kurdî û herweha bi taybetî jî li ser romana kurdî serê xwe neêşandiye.


Di romana kurdî de trajedî, îronî, pêkenî, şadimanî, evîn, nakokiyêni sosyal civakî, şer, pevçûn, macera, ser-pêhatî û bûyerêni curbecur çiqas hene? Karekterên lehengan, rewşa figuran çîne, çawane? Dîsa di romanên kurdî de ramanêni siyasi û ideolojîk, mentalîteyêni tradisyonel û modern hene yan na? Herweha di romana kurdî de îdealizma soyut û realizma somut çiqas hene?

Di hêla psîkolojiyê de romanên kurdî qels in yan na? Gelo psîkolojiya leheng û figurên romanên kurdî bi şêweyeke serketî hatine ravekirin yan na? Di naverokê romanên kurdî de hêlên perwerdeyê hene yan na? Perwerdeya leheng û figurên romanên kurdî di çi radeyê de ne? Romannivîserên ku romanên xwe şibandine berhemên nivîskarên navdar yên cîhanê, bi afirandina berhemên xwe çiqas serketine?


Mirov dikare pirsan gelek zêde bike, lê pêwîst nake. Bersîva van pirsan karê lêkolînvanan e, edebiyatnasan e, rexnegiran e. Ew bi kar û xebata xwe, bi afirandina pirtûkên xwe yên derbarê mijara pirsan de dikarin ji gelek pirs û pirsgirêkan re bersîv bibînin.

Dema ji alî sosyologên civaknas û edebiyatzan ve sosyolojiya romana kurdî bê nivîsin, dê bersîva van pirsan û gelek pirsên din bê dayin. Bi hêviya ku rojeke kurdeki zana dest pê bike û sosyolojiya romana kurdî binivîse.

Di hejmara duyem de em ê weşandina nivîsên li ser romanê û herweha cure dîtinên derbarê romanê de biweşînin û pêşkêşê xwendevanên kurd bikin.



F LOZOFÊ KURD - DÎNAWERÎ



Mihemed Ronahi

Ji hemû qewm û nijadan mirov baweriya xwe bi îslamê tînin û dîbin endamê vê şaristaniyê. Birastî meriv dikare bêje Îslam li her derê bi hêsanî hatiye pejirandin û hemû gelan bi dilxwazî berê xwe dane vê olê. Lê li medayê (welatê împaratoriya Med'an. Nk.) jî li ïranê jî û hê li gelek derên din jî, îslam li dû şer û kuştinên mezin hatiye pejirandin. Serqisê li Kurdistanê li dû gelek şer û serhildanê gîran îslam dikeve nava vê erdnîgarê. Weka serhildanêne babek û xurremiye gelek serhildanêne din têne dayîn. Lê dawiya dawî gel îslamîyetê dipejirîne. Li dû pejirandina îslamîyetê jî, bi tayibetî di warê zanîn û zanistê de gelek pêşketinêne mezin çê dîbin. Gelek zanyar û filozofê mezin derdikevin. Lê meriv dikare bi hêsanî bêje tevahiya van zanyar û filozofen Kurdistanî her çiqas di bin felsefeya îslamê de hiş û mêjiyên xwe bimeşînîn jî ji bandora her sê filozofen medayî yên

kevnar nefilitîne. Felsefeya filozofêñ Kurdistanê her tim di nava xwe de fîkr û ramanêñ her sê filozofêñ medya kevnar stirandine. Niha bi vê nivîsê re em ê derbasî van filozofêñ Kurdistanê yên serdema navîn bibin.

Di nava filozofêñ, felsefeya serdema navîn ya Kurdistanê de navé yekemîn Ebûl Henîfe yê Dînawerî ye. Em ê felsefeya serdema navîna a Kurdistanê bi Ebûl Henîfe Ehmed ê kurê dawidê Dînawerî bidin destpê kirin. Birastî di Kurdistanê de felsefeya serdema navîn bi awayekî sistematîk, bi Şihabuddîn Suhreverdî destpê dike, lê ji ber ku Dînawerî çixir li pêş Suhreverdî û filozofêñ dû Suhreverdî kolaye û rê li pêş wan vekiriye, em ê bi Dînawerî destpê bikin.

Kî ye Dînawerî?

Navê wî Ebûl Henîfe Ehmedê kurê Dawidê kurê Wenand e. Ev navnasa wî ya dirêj e. Lê di nava ehlê îlm û zaninê de, bi tayibetî jî di nava ehlê medresê de weka Dînawerî tê naskirin. Navê xwe ji cîhê jidayikbûna xwe digire. Di 820'an de li Dînawerê (Deynûr) jidayik dibe Dînawer niha girêdayî kurdistana ïranê ye. Li Kermaşanê (Kermanşah) li ser rêya hemedanê ye. Dînawerî ji nava zanyarêñ kurdistanê yên mezin ê ewili ye. İslâm di 632-634'an de tê kurdistanê lê zû bi zû di nava gel de nayê pejirandin. Weka ku me gava berê li jor jî got em vê yekê di serhildana Babekê kurd de jî dibînin, ji 813'an destpê dike heyâ 816'an didome ev serhildan. Yêñ ku di vê serhildanê de cîh digirin jî tev ezerî, ecem, kurd û gelên din ên Mazdeki ne. Ji ber vê yekê diyar e ku İslâm heyâ 150-200 salan jî, hê bi tevahî di nava gel de rûnenistiye. Di erdîgareke wisa de bapîrê Dînawerî wenand jî baweriya xwe diguherîne û dibe

musilman. Anglo Dînawerî bi malbatî ji nifşa xwe ya duyemîn û vir de musilman e.

Niha em werin ser xebat û ramanên Dînawerî. Ez nêzî du mehan e li ser Dînawerî lêkolînan dikim û di derbarê jiyan û xebatêni wî de li agahiyâ digerim. Ji gava ku min dest bi lêkolîna jiyanâ wî kiriye heyâ iro ez li hember mezinahiya wî wisa heyirîm ku, birastî min jixwe û ji lêkolîner û rewşenbîrê beriya xwe fedî kir ku heyâ niha zanyar û filozofekî mîna Dînawerî hê me bi kurdan nedaye naskirin.

Dînawerî zanyarekî pirralî ye. Ne têne li ser qadekê du qadan di gelek qadan de çixir kolaye û rê daye pêş zanyarênu dû xwe. Di warê riweknasiyê (botanîk) de, di warê zoojîyê de, di warê zimançaniyê (filoloji) de, di warê tipê de, di warê mantiqê de, di warê dîrokê de, di warê erdnîgariyê de, di warê astronomiyê de, di warê meteorojîyê de, di warê matematik û mekanikê de berhem nivîsine û van berhemên wî ji alî zanyarênu mezin ên dû wî weka çavkaniyê herî bi bawerî hatine bikarhanîn. Di heman demê de avakarê îlmê qethiyetê ye. Di navâ ereban de weka bavê riweknasiyê hatiye bi navkirin. Ji ber ku bi pirralibûna xwe bala gelek zanyarêni biyanî kişandiye, gelek zanyarêni biyanî li ser lêkolîn kirine. Li ewrûpayê weka di derdora zanistî de weka “dehayê kurd” tê naskirin. Yekem car wî li ser dîrok û antropojiya kurdan lêkolîn kiriye û bi navê “ensab el-ekrad” berhemek nivîsiye. Di vê berhema xwe de ji dîrokê kevnar heyâ roja xwe bav û kalênu kurdan girtiye dest. Dîsa di dîrokê de yekem car wî xerîtaya Kurdistanê xêz kiriye. Navê Kurdistanê di xeriteya xwe de bikarhaniye.

Di pirtûka xwe ya “kitab el-nebat” ê de navê riwekên Kurdistanê bi kurdî girtiye. Dîsa di warê astronomiyê

de ewqas pêşve çûye ku xebatên wî tenê bi berheman tixubdar nemaye di heman demê de nêringeheke ji avakiriye (çavdêrxane, rasatxane). Niha em di vê nivisê de çiqas pesnê wî hildin dê dîsa ji hindik bimîne ji bo wî, lewra ne tenê di nava kurdan de meriv dikare bi hêsanî bêje di nava şaristaniya îslamê de ji zanyarêñ herî bi rûmet yek e. Lê mixabin iro ji ber ku lê nehatiye xwedîderketin, ji bili çend kesen zanînhez bêtir kes bi navê wî ji nizane. Ez niha li ser fîkr û felsefeya wî, li ser jiyan û xebata wî dûr û dirêj rawestim belkî berhemekê dûr û dirêj karibim li ser binivîsim. Lê ji ber ku pêdivî bi kurtgirtina mijarê heye. Ez ê niha tenê berhemêñ ku wî nivisîne ji we re diyar bikim û nivisê biqedînim.

Berhemêñ ku di derbarê zanistêñ matematîk û xwezayê de nivisîne:

- 1- Kîtab el-cebr we muqabile (pirtûka cebîrê)
- 2- Kîtab el-nebat (riweknasî)
- 3- Kîtab el-kusuf (rojgirtin)
- 4- Kîtab el-redd ela reşad el-isfexanî (astronomî)
- 5- Kîtab el-hisab (arîtmetîk)
- 6- Baxt fi hisab-el hind (lêkolîna arîtmetîka hindistanê)
- 7- Kîtab el-cem wel tefriq (arîtmetîk)
- 8- Kîtab el-qîble wel zîwal (astronomî)
- 9- Kîtab el-enwa (meteoroloji)
- 10- İslahel mantiq (mantiq)

Berhemêñ wî yên di warê zanistêñ civakî de

- 1- İxbâr ul-tîwal (dîrok)
- 2- Kîtab el-kebîr (diroka zanistê ya mezin)
- 3- Kîtab ul-fisaha (retorîk)
- 4- Kîtab ul-buldan (erdnîgarî)
- 5- Kîtab ul-şî'r we şûara (wêje)
- 6- Ensab ul-ekrad (diroka kurdan)

SERHED

Fêrgîn Melîk Aykoç

„Welatê Serhedê, xaka gul û beybûnan, bîhûsta gelî û zozanan, govenda rêzeçîyan, evîna awazên dildaran e. Serhed bi çiya, zozan, deşt, gelî, newal, çovig û şaviyên wek biskén li ser hinarikên keçik û bûkan; bi çavkaniyên despêka çeman, bi gol û delavan bi rengên şîn û hêşinahiyên xwe ve bi mîtolijîyan xemiliye. Vê xeml û bedewiya wê rîya hatîna coşê ji hozan û deng-bêjên dilsojî re vekiriye. Hozanê bi nav û deng Evdalê Zeynikê kiriye şalûl û bilbilê vê şeng û şoxiya xwe. Ferzê, Reso, Husêno û Şakiro jî bi awaz û nalînên xwe ve ew şopandine, jiyan dane evîna Siyabend û Xecê. Bi wê bedewiya xwe ya kêşwer stûna wêjeya Kurdi, pîrê hestê netewî, sofistê giyana vî gelê dilsotî û sertacê wela-parêziyê Ehmedê Xanî jî kişandiye nava sîng û berê xwe yê ji bêhna kulîlkan.

Li gor pirtûkên pîroz Adem û Hewa û Homo Sapiens jî lí vir gihiştine rûyê erdê, jiwê mirov dikane bibêje jiyanê li vir eyvan girtiye û riçalên tovê jiyanê berdane erdê. Dibêjin; bi ferмана Xweda li gor mezinahiya Adem ê kalikê mirovahiyê Çiyayê Agirî li vir berz bûye. Lema Ademê duyemin Nûh jî bi keştiya xwe ve hatiye, li vir lenger avetiye erdê. Pirtûkên pîroz jî pîroziyên xwe li ser bingehê diyarde û çîrokên vê bîhûstê wergirtine. Destan û mîtolojî li vir vejîne. Gilgamêşê bi nav û deng, Zalê leheng li vir tirîjên hêzên xwe dane cihanê. Li vir çiya mîtolojîk, gul, çem û deryaçe efsûnî, jiyan bi raz e.

Dibêjin: Pirr zeman berê ku zarokên Adem werin rûyê erdê, gava li ser erdê dem hîna dema jiyana periyan bûye, li welatê Serhedê gakovî û noginkoviyeke bi qiloçen hezar şaxî, pir xweşik û tital hebûne. Navê noginê Mirazê û navê gakovî ji Çimreş bûye. Dema birçi bûne, her yek li çengekî Serhedê çêryane. Her êvar ji li mexeleki gulini gihiştine hev û ketinin nav coşıya aheng û jiyaneke şeyda. Evîneke gelek xwerû, ji cihana evîna mirovan cûda, bi awayê evîna yêzdanî di navbera wan de hebûye.

Keça Şahê Periyan ji destgirtiyê xwe xwestiye ku ew biçe néçîra Çimreş û Mirazê, ji wê re gurçikên herdûyan bine. Destgirtiyê wê ji derdi keve néçîra wan, Mirazê li Deşta Müşê û Çimreşî ji li deşta Erzinganê dikuje. Berê ku her du ajalkovî can bidin, lava ji Xweda dikin ku ew wan bi kemasî bi şeweyekê taybetî bigihijine mirazê wan. Li ser vê daxwaza wan, Xweda ferman dide ferîşteka xwezayê. Ew tê, bi şiva xwe ya avzûnî li wan dide. Bi lêdana şivê re, qiloçê wan dibe şax û çobarên nava çiyan, bedena Mirazê dibe Çemê Murad ê; bedena Çimreş ji dibe Çemê Reş. Li ser emrê Xweda ew li Kebanê digêhêjin dilana zewacê û paşnavê Firatê werdirigin û berê xwe didin deryayêن bê ser û bin.

Çemê Erezê ji xwişka çemê Mirazan e. Navê wê yê ras-tin ji Erezya bûye. Li pey xwişk û zavayê wê bi fermana Xweda dibin çem, ew ji dikeve şîneke giran, bi şev û rojê digiri ku Xweda daxwaziya wê ji bine cih û wê ji wekê xwişka wê têke çemeki taybet. Li gor gotinan Xweda wê daxwaziya wê ji pêk tîne. Wê ji dike Çemê Erez.

Ji wê rojê vir ve jiyan di nav şaxên van çeman de ketiye nav pêsbirka dilanê. Newal û deşten ev çem, şax û pilên wan cobar û robaran té re diçe; bi hêşinahî, dar û ber, bi bistanêngewze û meweyan, bi kelah û şenahiyen xemilîne. Li wir zamawend û vevv e, dilan û şahî ye. Hêviya dil weki tava havînê hêli dide, lê mixabin ku dijminen mirovahî û xwezayê çav berdaye vê xweşî û dewlemendiyê, bi awayeki bê pîvan xwin rijandiye. Her der ruxandî, şewitandî û zulim xistiye warê jiyanê. Lê disa ji şahî, dilan û jiyan bi riki serkeftî ye.

Li ser xaka Serhedê bedewiyêن cihanê, warê azadî û berxwedanê, parêzgehêن gelê Kurdistanê, çiyayêن bi çalim serî hildane. Wan ji erdê ber bi tirijêن rojê bi wan endamên xwe ve bi evîn pejn dane. Bi şanazî berz bûne û pir nemaye ku bigêhêjin piroziya rojê. Van piroziyan ne tenê gelê herêmê parastine, bi hezaran giyanpakên wî jî di nav sîng û berê xwe yê bedew de veşartine. Dibe ji wê be, wan ev gela bi wê şoxiya xwe matmayî û heyirîyen xwe hîştine.

Gul û pêximberê van çiyan, béguman çiyayê AGIRÎ ye. Bi mezinahiya xwe ya yêzdani û endamiya xwe, hem xofê dixe dilê mirovan û hem ji bawariyê dide mirovan. Nola baweriya dînêن asumanî, jiyana hatî ber şemuga têkçûnê, li vir carek din vejiyaye.

Li her çiyayekê bedewiyek û destanekê bêmirin heye. Gernasên van mítolojiyan do yek şerek demên xwe bûn, iroj bi hezaran lehengên tekoşîna rizgariya netewî yên di van asoyêن berz de wek hêviya pêşerojê diçirûsin, bûnin coşa dilên gel. Ma kê navê warê evîna Siyabend û Xecê çiyayê Sîpanê Xelatê, Keştiya Nûh ya li serê Agirî. Hespê gola sîtilan, ava jiyanê ya li ser çiyayên Bingolê nizane?

Dibêjin: Gelek zeman berê mîrekî herêmê bi nexweşîyeke giran dikeve. Bijîskên wê demê nikinan jê re çareyekê bibinin. Ew jî êdi berê xwe dide ziyaret û remildaran, avêن efsûni û riwêkbijîşkan. Di vê gerê de rojekê ji rojan di rîyekê de rastê rûsipîyekî tê. Rûsipî ji wî re dibêje:

„Biçe diharê çiyayê Bingolê, dibe ku tu ji av û nebatiyêن wir şîfayekê bidest bixî.“

Ew jî bi tevê xulamê xwe derdikeve diharê Bingolê, Konekî çarnexî yê bîst û çar stûnî li wir vedigirin. Xulamê wî derdikeve nêcîré. Bi tîra kevanê lêdixe, betekê dikuje. Lê gava bet ji hewa tê xwarê, dikeve nava golê, cardin xweş dibe, difire û diçe. Ew jî tê heyecanê bê ku golê nişan bike, bi qêrin tê cem mîrê xwe. Ji wî re dibêje:

Mîrê min, Mîrê min, min ava bêmiriniyê dît.“

Gava ew diçin, lê dinêrin ku ci bibînin, bi hezaran golên biçük pêk hatine. Ci kirine, nekirine, rê nebirine ser wê gola bi ava bêmiriniyê, lema jî gotine:

”Bîngol e, hezar gol e. Kes nizane kîjan gol e...”,

...

Hima bigire tevhevê terazinan, raste û newalên li bilindan ú çiyan bi hev ve girê didin, yekber zozan in, Cihê berx ú karikan, keç, bûk ú zerîyan in. Evîna bêrîvan ú şivanan e. Cîgehê hezar cûre giha, sosin, kulilk ú gulan e. Meydana evîn ú dilan e. Cihê wargeh ú şenîyan e. Deştên gerîlayêن hêviya gelê vî welati ne. Bêhna kulîk-kên wê yên şeyda mirovan mest dike. Hestê hozani ú awazê radike coşa serkeftina jiyanê. Dibe ji vê be, yan jî ji ber bi xwe ve kişandina wê ya şeyda ú avzûnkar bê! Giyana mirovan celb dike. Lema bingeha stranê dilan li vîr dest pê kiriye ú xwe gihandiye jiyanê. Dildaran gotine : „Lawiko zozanê me bişewîte wa bi gulîne... Dilê min ji ber evîna te bi ax ú nalîne....“

...

Belê Li Serhedê ne tenê heybet ú xişmên çiyan, gelî ú zozanan dilê mirovan dil digire, erdê bi adan, bi bîn ú ber, bingehê şaristaní ú şenahiyên vê cihanê, deştên aso lê tekdiçin jî wek mixladûzê kêtswêr in. Li gel çiya ú zozanan, deştên Serhedê jî ji şaristaniyên wek Urartû re bûye bingeha dewlemendiyê. Dibe ”Baxê İrem“ jî ji van deştan yek be. Deşta İdirê ku ji bo gelê hawîrdor Mezopotamya ye, bêguman yek ji deştên bihuştê ye. Lê deşta Mûşê? Deşteke mitolojik ê bê ser û bin e. Homerosê Kurdan, dengbêjê kul ú derdan, Evdalê Zeynikê jî, di vê deştê re bi sedan car derbaz bûye. Wî bi dengê xwe yê xweş ê wek xwendina Qulingan, li ser deşta Mûşê qaqibandiye. Dengbêjên din bi hawar gotine : Dîharê Mûşa şewti ketim wa bi ... ,

Em ji deşta Mûşê dev û devê çemê Mûradê ber bi berjor bidin rê ú hetanê gundê Tepe werin. Li wê derê çemekî biçük ê ku hemû hêviyên min da, ber xwe ú anî gihad ser çemê Mûradê heye. Sed û yek nav li vê çemi danîne, yên herî nav dar ev in : Çemê Gimgimê, Bîngolê ú çemê Baskan.

Em dev û devê ví çemî ber bi berjor bimeşin. Emê bi-gêhêjin zuxrê teng, cihê pira Evdirehman Paşa lê. Belê ev nava ji bo me hemû Kurdan êşekî gelek giran e. Hêvî û nûra gelê me yê wê demê, kalikê me, pîré me, agirê dilê me Şêx Seid Efendî, li vir bi destê iyanetê ket keminê û hat girtin. „Hayê ha haye ! Ferman e, bavo ferman e !... „

Em rêya xwe ya dev û devê ví çemî bidominin û ji gundê Adê rawirin. Qet demî û sebra min nemaye. Ez dixwazim gavekî pêsta di binê Goma Gorgo re rawirim, di ber Qelencixê re têkevîm Zuxrê Qelencixê ú çend gavan bavêjim, daku carekî din ji dûr ve jî be, gund û deşta ken û şina xwe bi çavên serê xwe bibinim.

Deşta Baskan, vê deşta pênc gundan, vê deşta çal û rast hemû xewnên min, héviyên min ên ciwantiyê ji min dizî. Lê deşteke pir bi xêr û bêr e û gelek rast e. Di xew-nên min de dilfirehî û bihuşt e.

Ev pirsa tim di serê min de ye: Gelo ev deşta çawa pêk hatiye û di navbera çiyayê Şerevdîn ú Bingolê de bûye cihê herî çal û xweş? Dibe ku ew jî wekî min ji ber derd û kulan heliyabe, ji keseran kesiribe û ketibe vê rewşê? Çarenûsa min jî bingehê xwe ji wir girtibe? Yan ji ber serê di navbera çiyayê Bingol ú Şerevdînê de hêrifiye û ketiye vê rewşê?

...

Dibêjin; ji bo ku ew belaya hevkuştinê ya Habîl û Qabîl neyê ji bîrkirin û ji rûyê erdê ranebe, Xweda ferman daye, di cihê wan de wek sembol du çiya afirandine. Ev Çiyayê Bingol ú Şerevdînê ne. Lewma ew hîc ji hev hez nakin. Wê çawa ji hev hez bikin? Gava çiyayê Bingolê serê xwe rakiriye ku bigêhêje yêzdaniya tirijên roja pîroz, çiyayê Şerevdînê li ber pozê wî, hem jî li başûra wî rabûye û pêşî lé girtiye. Wê gavê jî çiyayê Bingolê qehiriye û ji ber qehiran bi hêrsa Qabil ew pihن kiriye. Li ber pihna wî tûmên li şûna deşta Baskan ber bi başûr ve dişeqite, girê kela Seyîdbegê û girê Bejan pêk tîne. Bi wê hêrsa kufinî pêxistî, pihneke din li erdê dixe, kevir, dar û beran bî pihna xwe ve rês dike û dide ber sîngê çiyayê Şerevdînê û bi wî awayî zîmagê Dadîna pêk tîne. Lê dîsa jî dilê çiyayê Bingolê rihet nabe û xişmê

wî danakeve. Çawa ku Qabil kevir radike li serê Habil dixe, ew jî bi wî awayî pihna xwê bi hemû hêz û hêrsa xwe ve li erdê dixe. Erd ji Baskan hetanê binê Çataxê diqelişê û geliyê Baskan pêk tê.

Ciyayê Şerevdinê li hember vê êrişa ciyayê Bingolê hê ji wî bêtir diqehire, welî Qabil dibe kufe kufa wî, carê pihneke bi zeft li ber sîngê ciyayê Bingolê dixe, Erd dişeçite, li hev kom dibe û hima li ber sîngê ciyayê Bingolê diwerimê, ciyayê Înalî pêk tê. Dilê Şerevdinê bi vê pihnê rihet nabe. Ew pihneke din li ber sîngê ciyayê Bingolê dixe û girekî din li ber wî girî diwerime. Ew jî dibe Berojê Dodan. Lê hêrsa Şerevdinê bi vê pihnê jî danakeve, lema jî hetanî tê de heye pihneke bi zeft li erdê dixe; kevir, xweli, dar û beran bi pihna xwe ve kaş dike, çermê zikê ciyayê Bingolê qat dike û du werimandinêni di rézekê de pêk tîne, Ew jî girê Boxa û berojê Qulan in.

Di navbera vê pevcûnê de gazinî bi erdê dikeve. Erd ji ber jana canê xwe dike axin û hawar. Yêzdanê mezin vê rewşê ranagire, lingé ciyayên Bingol û Şerevdinê bi hev ve girê dide û bi axê dipêçe. Li ser wî rasteke mezin pêk tê. Em jê re zozanê Çapanikê dibêjin. Ew roj e, ev roj e, deşta Baskan heye û şerê di navbera ciyayên Bingol û Şerevdinê de rawestiyaye. Niha hunê bibêjin:

”Errrik te jî li hev anî!”

Ezê bibêjim na! Hin rastiyên jiyanê vê zelal dikin. Li mirovên li vir dijin, binérin! Ew wisa serhişk û qarqarok in, mirov nikane venivisîne! Wekî Habil û Qabil iş û karêwan hev kuştin e. Li aliyê din eger ez di cihekî wisa de nehatibama vê cihana derewîn, dê qedera min ti car wiha reş neba. Qedera min tenê bi serê xwe dikane vê rastiyê bide pejîrandin. Jixwe, li welatê Serhedê jî ber van pékhatinen mítolojîk kes nikane bi miradê xwe şâ bibe. Eh! Eger hûn bi min bawar jî nakin, Hûn û kêfa xwe. Ji min gotin.

Dembîhêrek li ser nivîskaran û erîşen li ser stûnên Kurdewariyê

Êxan Penaber

Min xwest bêjim hîmêن bingehîn ên neteweyekê ne tenê nijad û xwîn in, ziman û nirxên hevpar in. Bi nêrîna min mirov bi kîjan zimanê berheman bide, dibe malê wê. Kurdekk ji ber ci sedemê dibe bila bibe, heger bi Rûsî berhem da, Rûs e. Bi Almanî be Alman, bi Romî (Tirk) be Rom (Tirk) e. Erê dizanim dê gelek kes biqehirin, xwe li min sor bikin.

Nasnameya neteweyî ne tenê bi xwînê ye

Wekî we pêderxist, min negot "nivîskarêñ Kurd" lê min got "nivîskarêñ ji bo Kurdan dinivîsînin". Dema mirov ji diya xwe dibe, tê jiyanê, rastî rewseke amade tê. Dê-bav kivşe ne, rewsa aborî û azadiyê kivşe ye. Mirov heyâ bi per-baskan dikeve nikare vê rewşê biguherîne. Ya girîng jî hîmêñ nasname û kesayetiya xwe jî di wê rewşê de digire.

Kurdbûn, Almanbûn an Tirkbûn ne tenê ji genetîkê ye. Hemî Alman bi eslê xwe ne Alman an German in. 45% ji gelheya Almanyayê ji Keltan e. Kelt jî ji Asyayê cûne Ewropa, bicihbûne. Herwiha tenê 25% ji Almanan ji berêñ Germanî ne. 10% ji Almanan ji Cihûyan in. Li

rûyê erdê ti qewmek saf nîne. Hin ji qewman kêm tevlî yên din bûne (bo mînak Rûs, gelê Sam, Gallî, Kurd ûed), hin jî gelek (bo mînak Tirk, Ereb ûed).

Li Tirkîyeyê tenê 3% kes Tirkên xas in, ji Asya Navîn hatine. Pirraniya xelkên Tirkîyeyê ji qewmên din in û ji ber ku Tirkan serokatiya Îslamê bidestxistibûn, di bin giraniya wan de heliyane. Van salêن dawiyê ku zanîstiya genetikê gelek bipêşketiye, Tirkan bi xwe lêkolîn kirin û dîtin ku ew derewên heyâ niha kiribûn êdî bi kêrî tiştekê nayêن. Anatoliya li ser koka xwe dijî. Tirk hatine, bi şûre Îslamê ziman û olêن xelkê guhertine lê ji her qewmê gelên Anatoliya û Kurdistanê li cihé xwe mane.

Ev e tabloya genetik a Tirkên Tirkîyeyê

Hin zanîngehêن Tirkîyeyê bi tevî Zanîngeha Stanfordê li ser koka Tirkan lêkolîneke berfireh dikin. Xebata xwe bi navê "Profila genetik a Anatoliyayê" binav dikin û diweşînin.

- Ji Tirkan 33.8%, gena J dihewînin (ango gena Bakurê Afrikayê, Rojhilata Navîn û qismek ji bakurê Deryaya Naverast)
- 24% gena R dihewînin (ango yek ji genêن Ewropayê, pirraniya Kurdan ji ji heman genê ne)
- 11.4% gena E (dîsa Afrika, Başûrê Ewropa)
- 11% gena G (Qefqas, Bakurê Îranê û qismeke Îranî)
- 5.2% gena I (ango Bakur û Rojhilate Ewropa)
- 4.2% gena L (xelkên Hindistanê, li Tirkîyeyê Qereçî heliyane, bûne Tirk, hejmara wan kêm nîşan didin)
- 3.9% gena N (Sîbîrya û Finlanda)
- 3.0% genêن C, Q, O (genêن Asya Navîn, ango Tirkên xas)

- 2.5% gena K (Pakîstanî)
- 1% gena A (Afrîkaya Navend, ango mirovên çermes)

Komên mirovan ji roja li parzemîna Afrika peyda bûne heyâ iro koçber in. Komên qels di nav cand û desthilatdariyêng xurtan de heliyane. Roj hatiye xurt îcar bûne qels an xurt ketine bin bandora xurtiran. Şarezayîyen mirovahiyê geh li vir geh li wir vedane. Şarezayiya Kurdistan û Mezopotamyayê dora xwe kiriye, çilmisiye, rê daye ku şarezayiya Egîptê (Misir) kulilk vede. Wê jî dora xwe daye Greka Antik (Yewnanistan). Îro jî Ewropa û Bakurê Amerîkayê pêşengiyê dikan.

Binêrin iro Kurdistan jî, Misir jî, Yewnanistan jî ne serkêşen cihanê ne. Heya bigire Kurdistan xizan, paşdemayî û wêran maye. Rojek were wekî çawa niha Ewropa û DYA pêşengiyê dikan, cografyayêng din bikin. Ji niha ve zanist dibêjin 30-40 sal şûnde Çin û Hindistan dibilin dewlemendêng cihanê. Wekî pêşiyân gotine "Dor bi dor e, ne bi zor e". Roj were dê Kurdistan dîsa rola xwe bilîze.

Min çima ewçend dirêj kir? Ez çima ji babetê dûr ketim? Min xwest bêjim hîmêng bingehîn ên neteweyekê ne tenê nijad û xwîn in, ziman û nirxêng hevpar in. Bi nêrîna min mirov bi kîjan zimanê bijî dibe malê wê. Kürdek ji ber ci sedemê dibe bila bibe, heger bi Rûsî jiyana xwe bidomîne ew Rûs e. Bi Almanî bijî Alman, bi Romî (Tirk) bijî Rom (Tirk) e. Erê dizanim dê gelek kes biqehirin, xwe li min sor bikin.

Em Kurd in, lewra 40 hezar salêng mirovahiyê yê dawî, em kirine Kurd. Di bin roja pîroz de çendin ba, bager û tofan li me dane.. Dem hatiye bûne xurt û zordar (Mittanî), dem hatiye bûne împeryalistên dema xwe (Med), dem hatiye wekî ev sed salêng dawiyê ne, bûne bindestêng xelkê. Em her Kurd mane. Hin ji berên Kurdistan assîmîle bûne heliyane. Bûne Tirk, Ereb, Ermenî,

Asûr ûed. Hin ji komên Tirk, Ereb, Ermenî, Asûr ûed. bûne Kurd. Wiha ye çerxa felekê.

Kurd bi ziman û welatê xwe yên bav-kalan (dê-dapîran) hene.

Kurdî û Kurdistan movikên Kurdbûnê ne, bêî wan Kurdbûn nîne, nabe. Erê, iro Kurd bindest in. Welatê wan hatiye dagirkirin. Şerê azadî û serxwebûnê bidawî nebûye. Dagirkeran zimanê Kurdan qedexe kirine, nehiştine pê perwerde bibe. Helbet em behsa Başûrê Kurdistanê nakin. Li wir Kurd çê-xirab azad in. Nivşen Kurd assîmîle bûne û dixin. Wiha be dê bi taybetî li Bakur Kurdî nemîne.

Hûn ê bêjin "ma te dît, rewş ev e û ev jî ne sûcê me ye". Rast e, sucê min û we nîne. Bindestî ev e, pişavtin ev e, mirina Kurd û Kurdî ev e. Pêşengên vê rewşê dagirkeren Kurdistanê û sazûmaniya bêdadî ya cîhanê ne.

Her kes karê xwe dike. Dewleta Tirk karê xwe dike. DYAYA, karê xwe dike. Ewropa, Rûsyâ, Japan, Çin ûed. hemî karê xwe dikin. Cîhan li ser berjewendiyê hatiye avabûn. Sifreya guran e. Kê bû mih û berx, wê dixwin.

Em ci bikin? Bigirin? Li hêviya Godot bimînin? Helbet na. Têkoşîn divê û Kurd jî bi tevî hemî şaşîyan viya dikin. Carcaran bipêş dikevin, nêzîkê azadiyê dixin. Carcaran jî têkçû û şerpeze dixin. Heya niha wisa bû. Lê di her mercê de, bi her awayê Kurd li ser axa xwe diman, bi Kurdî diaxivin.

Di serhildanan de bav-kalêن me virde-wêde diçûn. Li Botanê şer heba diçûn Serhedê, li Behdîdan heba diçûn Botan. Li hemberê zordariyê xwe wisa diparastin. Lê iro ne wisa ye. Têne di van 30 salêن dawiyê de 5 milyon Kurd ji Kurdistanê hatine derxistin. 5 hezar gund hatine tunekirin. Herwiha Tirkî ketiya gundan jî. Sivanén serê ciyan êdi bi Tirkî diaxivin. Jinêن Kurd ji TVêن Romê fêri Tirkî dixin.

Xema kê ye?

Tenê dîsa em Kurd dikarin birînên xwe bikewînin. Tenê em dikarin xwedî li ziman, welat û nasnameya xwe derkevin. Ev jî bi xebatê, berxwedanê dibe. Xema partiyê Bakur ba dê heya niha tistekê bikirina. Kovar û kovarokên li biyanistanê têra jiyanê nakin. Problem jî ji vir e. Xema pirraniya pêşeng, partî û ronakbîran nîne ku Kurdî dimite. Ji wan re bes kariyer, nav û xelatê ronakbîriyê bes in.

Nivîskarêñ esil-Kurd û mejî-Tirk

Heger nivîskarek Kurdesil bi Tirkî biaxive, bi Tirkî bijî, bi Tirkî binivîsîne, çi xêra wê ji me re heye? Yaşar Kemal, Suzan Samancı ûêw. dibe ku ji dê-bavek Kurd peyda bûbin, dibe ku li Kurdistanê mezin bûbin, ew hemî aîdê Tirkî û wêjeya Tirkan e. Heger dilê xwe negirin ez ê bibêjim hemî jî Tirk in, ne Kurd in. Ji xwe gelek caran wan Tirkbûna xwe jî anînê ziman. Werin em êdî li kewandina birîna xwe bigerin. Tiştêñ ku ne aîdê organîzmaya me ne, bavêjin, bila ziyanê nedin me. Hûn jî dizanin ku van nivîskarêñ Kurdesil roleke mezin di Tirkizekirina Kurdan de listine û héj jî dilizin.

Nivîskarêñ dil-Kurd û ziman-Tirk

Pirraniya nivîskarêñ Kurd ên Bakur di vê grûbê de ne. Siyasetmedar in çenêñ wan gelek xurt in. Mirov tî dibin avê dîsa tî vedigerînin. Bi Kurdî kêm dizanin an naxwazin bi Kurdî binivîsînin. Yekê ji wan re gotiye "Tirkî zimanê (heşa) Xwedê ye, kê bi Kurdî bijî dê here dojehê". Ew di kûrahiya kesayetiya xwe de mazoşist in. Tirkan mezin xwe biçûk dibînin.

Bixwazin di nava mehek-du mehan de kêmasiyêñ xwe yên Kurdî derdibin û ciwan ciwan Kurdî dinivisinin. Lê tiştekê di ruhê wan de heye destûrê nade. Pêpelûkek heye têñ-diherin nikarin ji wê derbas bin. Helbet bi van kesan re nexweşiyêñ civakî û derûniyê hene. Ne ew viya

tînin ser xwe, ne jî gelê me ewçend guh dide hûrkolînê.

Heger dilê xwe negirin ez ê bêjim ev kesana ji bo Tirkî fêr bibin di zaroktiyê de gelek lêdan xwarine, hatine şermezarkirin. Heqaret li kesayetiya wan hatiye kirin. Wisa motîve bûne ku bibin Tirkek xas. Mazoşîzmê rehêن xwe berfireh kiriye, kûr cih girtiye.

Van kesan piştî bi Kurdbûna xwe hesiyan, dest bi Kur-dperweriyê kîn jî xwe di nava rêxistinêن Tirkziman de dîtin. Di wan rêxistinan de her tişt bi Tirkî bû û kesê ji viya fedî jî nedikir. Roj hat van kesan xwestin bala xwe berdin Kurdî, girêyên di zaroktiyê de di kesayetiya wan de reh vedane, dest neda, nehîst. Diviyabû ev kesana yan bihatibana tedawîkirin an jî gel bi stûyê vana bigirta bihejanda ku li xwe varqilin, gavan bavêjin. Guhertijna tevgerêن kesayetiyê ne wekî guhertina partîyan e.

Derman heye. Lê divê nexwes ji bo saxbûnê wê şirûba tehl (ango xwerexnekirin û hewla serdestkirina Kurdî di jiyanê de) vexwin. Hejmara van nivîskarêن Tirkziman bi hezaran e. Di rojnameyan, kovaran, foran, malperan de ew li qora jor in. Mirina zimanê Kurdî nabînin, naxwazin bibînin.

Hin taybetmendiyêن reaksiyonêن nivîskarêن Kurd ên Tirkofon (Tirkziman)

- Xwe ji vê babetê dûr digirin an henekêن xwe dikin. Hûn wan rexne bikin, bi zanebûn bersivê nadin. Van rexneyan izole dikin. Di rojnameyan, kovaran, malperan úêd. de cih nadin gotûbêjên wiha. Ango gel ji rastiyan dûr digirin. Lewra gel bi qelsî û nexweşîyêن wan bizanibe, kariyer namîne. Kariyer nebe jî ew dikevin depresyonê û nikarin wekî Kurdek ji rêzê bijîn. Divê him diz bin, hez rezvan bin, him bacgir, him pis-porê dimsê (mot), him şerabxwir bin. Kariyerîzm nexweşîyeke sereke ya nivîskarêن Tirkofon in.
- Bersivêن wan ên klasîk hene: "Biratiya gelan", "em ne

nijadperest in", "bêî dewletê ziman nikare berxwe bide", "roja Kurdistan ava bû, dê Kurdi bigihê felatê", "çî bikim zimanê min ê sereke Tirkî ye" hwd. Hin caran bersivên gelek xerîb jî didin. Yekî nivîsi bû: "Heger ez bi Kurdi binivisînim, dê bi xwe re bikevim nakokiyê. Lewra xelkên bêjin heya niha çîma bi Kurdi nenivîsiye". De werin safi bikin. Ev nivîskar xwedî gelek pirtûkên Tirkî ye û li pişta Kurdish xweş siwar bûye. Ev kesana rola xwe ya di assîmîlekirina Kurdish de nabînin.

Nivîskarêñ Kurdmejî û Kurdziman

Mixabin hejmara wan li Bakur gelek kêm e. Ji bo Kurdi li berxwe didin. Barê giran ketiye ser milên wan. Ji aliyekê ve dagirker, neyar û sazûmaniya assîmîlasyonê, ji aliyekê ve rêxistinêñ Kurd ên Tirkziman ku qîmetê nadîn zimanê Kurdi..

Bo mînak heger bixwazin li gundekê kursa zimanê Kurdi bidin, divê destûrê ji wan rêxistinan bixwazin Heger destûrê bidin jî te terorîze dikin. Divê tu pesnê wan bidî, herî meşen wan, tevlî çalakiyêñ partiyêñ wan bibî. Te wisa kir jî îcar Dewleta Romê tika xwe berdide te, te wekî mîlîtanekê didarizîne.

Êrîşen bi dehan nivîskaran li nirxên Kurdish. Kurdo haydarê mala xwe be, disa hatin!

Van demêñ dawiyê gelek nivîskar û siyasetmedarêñ Kurd, karêñ xwe hiştine, li pûçderxistina nirx, bawerî, çand û dab-nêritêñ Kurd digerin. Yek dibêje "Newroz ne ya Kurdish e, Kurdish ew diciye", yek dibêje "Mem û Zîn derew e. Memê Alan mirovekî qehbebav ê Tirk bûye", yek dibêje "Ezidî ne Kurd in, bi eslê xwe Ereb in", yek dibêje "Zerdeşte Kal Tirk e", yek dibêje "Zaza ne Kurd in, Tirk in", yek dibêje "Medî ne Kurdbûne", yek dibêje "Şêx Seîd peyayê İngilîzan bûye", yek dibêje "Mele Mistefa Barzanî Cihû ye, Barzanî hemî Cihû ne", yek dibêje "Seyîd Riza xwestiye alîkariya Şêx Seîd bike lê wî nepejirandiye", yek dibêje "Seyîd Riza Şêx Seîd

vexwendiye mala xwe wî gotiye ez xwarina Elewiany naxwim" hwd.

Ez dikarim linkên hemiyan bidim û hûn jî dizanin. Îcar beriya ku mirov ji babetekê axivî, çêtir e mirov derbareyê de kêm-zêde xwedî agahî be. Mixabin ê me ne wisa ye. Kes nabêje ma gelo ci bûye, ci qewimiye? Çima çar alî êriş tînin ser mezinên Kurdan û nirxên wan ên neteweyî..

Di civata Kurd de gelek edetên baş hene ku em rojbiroj wan winda dikan. Bo mînak di civata Kurd de, temendirêj li serê dîwanê, qora jor rûdinê, qîmetê dibînin. Lê heger zanist, dengbêj an mêvanek were civatê, bêî şêwirkirin civat wan jî dide qora jor. Hiyerarşî heye. Çêtir e mirov ji bo qîmetê bibîne û li qora jor be, têgihîştî be. Yan cemaet cara duyemin cih nade.

Erê Nasname platformeke azad e. Her kes bêguman dikare nêrînên xwe bîne ziman û mafê birêz Cemil Gundogan e jî. Bi qasî ez dizanim Gundogan demekê dirêj li zîndanan maye û ji Apoyiyan re xebitiye. Di rojname û TVên PKKê de peywirdarî kiriye. Nasîna min ev e. Bi qasî min ji nivîsarên wî pêderxistiye, di nava cemaeta xwezayî ya Kurd de nejiyaye, temenê wî pirranî di nava rêxistinê dema real-sosyalizmê de avabûbûn de, boriye. Herwiha nêrînên wî jî ji wan para xwe girtine û hin caran wî xistiye nava şaşiyân.

Di Nasnameyê de wan rojan li ser Newrozê gotarekê nivîsî û got "Newroz ne ya Kurdan e". Ev bû sedem ku vê sohbetê bi we xwendevanên xwe re bikim. Bila kekê Gundogan tiştekê neyîne ser dilê xwe. Tenê ji bo wî nîne gotinê min.

Şaşiyên nivîsara Cemîl Gundogan

1) Newroz ne metayek (bo minak das, kevir, bêr ûêd) e ku bê parvekirin. Newroz kevneşopî û cejnek e, bi taybetî bi têkoşina sal-deman ve ji bo Kurdan êdî bûye nirxeke neteweyî.

2) Kurd ji wekî Fars, Belûc, Gilak, Mazenderan ûêd. saxek ji cîhana Îraniyan in. Îran ne tenê Fars e. Îran an Aryan navê cîhana hevpar a gelên Aryayê ye. Mirov nikare dewlemendî û rengên wê tasnif bike, bêje bo mînak "Ristemê Zal ê Kurdan e, Kawa yê Gilakiyan, Zerdeşt ê Mazenderanan e". Lewra gelek dijwar e û mentiqeke şas e. Heya niha ji ber ku sedsalek zêdetir e desthilatdariyeke Kurdan nîne, Farsan ji xwe re wekî Tirkan dîrokeke fermî çêkirine û Kurdan bi xwe ji li ser xwe xebat nekirine. Tenê bi xebatê Ewropayîyan mane.

3) Gundogan jiyan û gundê xwe bingeh girtiye gotiye "li gundê me Newroz nedihate zanîn, me ji xwe re Newroz ji ber xwe çêkir". Çavkanî nedaye.

Evan şaşıyan gotinêñ mirov ji qonaxa zanistiyê dadixînin jêr, baweriya mirov kêm, hezkiriyêñ mirov gumanbar dikin. Gundogan dema ji dayîka xwe bûbû Newroz qedexe bû. Bi taybetî li herêma wî komkujî û sirgünêñ mezin pêkhatibûn. Helbet pênehestina wî gengaz e.

Hawar a Bedirxan behsa Newrozê dike ku hêj Gundogan ji diya xwe nebûbû. Osman Sebrî di sala 1924ê de li ser Newrozê nivîsiye. Gorî Gundogan ew hemî derewan dikin. Baş e. Şêx Nehrî, Nalî, gerremanêñ (seyah) rojavayı yên 1800ê, Koyî, Melayê Cizîri hemî behsa pîrozkirinêñ Newrozê kirine. Gorî Gundogan ew hemî derewan dikin. Nabe. Yek radibe bi mirov dikene.

Min got birêz Gundogan ne tenê babet e. Van demêñ dawiyé hin kes bi navê "nivîskarê Kurd" wekî qimilan ketine nav nirx û baweriyêñ Kurdan.

Nivîskarno xelkê bi xwe nedin kenandin. Xwe nexin şûna dadgeran, kesê ev selahiyet nedaye we û ya rastî mirov bêî ku zanîngeha dadweriyê bidawî bike ji xwe nikare bibe mirovê hiqûqê ji.

Nivîskarno hûn van nivîsêن xwe bi Tirkî dînîvîsînin û Kurdperwîrîyê dikin. Serî de vê kirâsê bêyom ê nakokîyan ji xwe derînin. Ev bi tena serê xwe baweriya we kêm dike. Yekê bêje "hela carê bi Kurdi binivîsînin, paşê wê mafê di xwe de bibînin ku li ser Kurdologiye biaxivin". Dibêjin jî.

Nivîskarno bi qasî ku hûn mîrkutan li stûna Kurde-wariyê didin, ma hinekê jî li stûnê xelkê bidin. Ji xwe re babetêن nû yên hewîniyê bibînin.

Nivîskarno Newroza we ya derbasbûyî pîroz be, em hez ji we dikin. Hûn in dîsa nivîskarêن me, hûn in dil-nerm, hûn in rehîm, hûn in birayêن me.

Têbiniya kovarê : Ev nivîsa bi zanyarı , tiji û bi çaveki kurdî hatiye hûnandin, dikare ji bo yên ku bi kurdî nanivîsin bibe neynik. Ew dikarin di wê neynikê de kê-masiyê xwe û şâsiyê xwe bibînin. Rexneyêن weha rastiyân derdixe holê û pêşîya mirov ronî dike. Kovara Ronî dê di hejmarêن din de jî nivîsêن rexneyî yên balkêş biweşîne.



Bo Xatirê Jinê

Elaeddîn Seccadî

Wergêr :

Husein Muhamed

Hê ew top û tiveng û heytûhot venemirîbûn, roj her roja şûr û tîr û rim û mertalan bû. Ev Tekşê ku wiha dibînî êxtiyar û şîl û kor bûye, li dema xwe li hemî de-vera Gelwaxî wisan navdar bû ku tenêbihata gotin "Tekş hat", ta zarok jî di landik û dergûşan de bêdeng û bêpêjn dibûn.

Xortek nûgîhayî bûm, nûbişkivî bûm, min kes di ser xwe re nedidit. Spêdeyekê rabûm, min xwe amade kir, şâşik û kumê xwe kir serê xwe û tîr hilgirt, mertal da pişta xwe û rim girt destê xwe. Min mehînek hebû, hema difirî, lê siwar bûm û berê min li ciyê nêçîre li ser rêya xwe tuşî vê karesatê bûm:

Li serê çiyayên Kewle digerîm, ji dûr ve li geliyê teniştâ Xirose sawêrek bi ber çavê min ket. Min bala xwe dayê; ku nézî bûm, diyar bû zelamek derdorî 25-salî, hindî bêjî berkeftî û lihevhatî, şûrek di ber re bû û her birr çekêñ din jî pê re hebûn û li mehînek kihêl siwar bû. Hê jê dûr bûm, min dît ku ji mehîna xwe peya bû, hef-sarê wê xist destê xwe û doxîna xwe vekir û rûniştin mîstînê. Ez giham raserî - hingê dinya wek niha bi dekûdolaban û fêlbaziyan nehatibû tewizandin, bira bî-rayê xwe avêti ber bextê wî nedikuşt; dijminê xwindarî jî ba, diviya te jê re bigota: niyeta min xerabî ye, amade be.

Min nerî ku mîrik ranabe. Neçar mam bang bikimê: "Kuro! Rabe ser xwe, siwar be, li vê çolê yan ez ê te bikujiyan tu min." Mîrik her ji ciyê xwe got: "Tu û bextê xwe! Sond bixwe ku ta siwar nebim dest naki min." Min bi devê xwe jê re sond xwar ku ta siwar nebe, ez ti lê nekim.

Vêca rabû doxîna xwe girê da, ket ser rê û hespê xwe bi dù xwe ve kêşa! Ev ji min re pirr seyr bû û min gazi kirê: "Kuro, ev tu çi dikî, de siwar be!" Got: "Te sond xwariye ku ta ez siwar nebim, dest naki min. Lê ez ji siwar nabim ji ber ku ma ez nizanim ku tu Tekş îl?"

Pirr li min ecêb bû ku wisan digot! Ez lê xurrîm: "Kuro, siwar be, roj dereng e, iro te her tişt ji dest min kir. Yan tu dê min bikujiyan ez te." Lê ev gav yek û ev gav du, ew siwar nebû. Got: "Xwe nadim kuştin; çi dikî bike." Nêzî du seatan bi pey ketim lê ti pê ve nehat! Neçar mam vejerim ser rîya xwe û wî jî bi wî awayî xwe filitand.

* * *

Roja piştî wê dîsan min lez da xwe, siwar bûm û min rast berê xwe da ciyê roja berî wê. Hê negihabûm serê çiya, min dît ku ji dûr ve siwarek têt. Vêca çi hatinek bû? Bi leza ba dilezî. Ji bejnûbala wî min got ku hebenabe yê duhî ye, iro heke biçe ber perrên esmanan ji ji destê min xelas nabe.

Min got hê çavê wî bi min neketiye divê ez xwe bigihînimê daku ne ya duhî bîne serê min. Min li qûntara çiya xwe da ber, kêm mabû bigihimê lê min tew dît dîsan ji hespê xwe dabezî û wek duh dest bi mîstînê kir! Min got: ya rebî, ev çi bela ye û çawan xwe jê xelas bikim?! Jixwe nabe ew peya ez êriş bikimê. Min xwe negirt, neçar mam û çûm ji pişt ve lê xurrîm: "Kuro, bes e, rabe, wek duh neke! Rabe, yan tu dê min bikujiyan ez te!"

Min dît berê xwe da min û qet dey nekir. Ku min baş lê nerî: kuro manê (naxwe) ev ne yê duhî ye!.. Lê qet pêjnek jê nehat, bi rehetî rabû doxîna xwe girê da, pê li rikêbê na, xwe avêt ser zîna li ser pişta hesp û bi rê ket. Min da pey: "Kuro tu kî yî?" Dîsan her guh neda min û çû. Ëdî wisân qehîrîm ku hema dê ji kerban biteqîma. Lê xurrîm: "Kuro! Yan tişt û mişt û mehîna xwe bi cî bihêle û here yan jî tu dê min bikujî yan ez te!"

Awirek da min û got: "Kuro, here ser rêya xwe, ez ne hevtayê te me. Heke mîranî di te de hebe, min mijûl û matil nakî!" Gotinên wî ji min re seyr bûn çiku wek ji zarokekî re bipeyive wisan got. Min gotê: "Kuro, ev tu çi dibêjî? Yan ez ê xwîna te birijim yan tu ya min. Ma tu li gel kê diaxivî? Bizane ku ez Tekş im, Tekş." Hema ku min wiha got, min tew dît ku rima wî li ser singê min e. Got: "Va min tu kuştî yan na?.. De here rêka min berde û zêdetir min gîro û mijûl neke." Rima xwe ji ser singê min rakir û dest bi çûnê kir!

Ku min ev yek dît, ez qehîrîm ji ber ku ew bi vî awayî rikeberî min rabûbû. Min ji xwe re got: hey tu nemînî, Tekş, heyf li te û xîreta te! Ev tu li kû yî, ma tu razayî? Dîsan min xwe paşve lê neda û ketim pey û min hê ji xwe bi şeraniyê anî der. Min bang kirê: "Kuro, wek mîran were meydanê. Madem wiha bû, yan tu dê min bikujî yan ez te." Guhê min lê bû ku got: "Kuro, tu li xwînê digerî, malkembax! Ez talûke me, çîma beriya min bernadî?" Ta min dest bir şûrê xwe, min hind dît ku pelamarî min kir û ez ji ser mehînê xistim erdê û rima xwe da ser singê min û xencereya xwe da bi stoyê re û got: "Min tu kuştî yan na? De here beriya min berde." Rabû siwar bû û dîsan ket ser rêya xwe. Ku min ev dît, êdî ti tişt ji min nehat. Min xwe avêt hefsarê mehîna wî û got: "Ya te li min kir, hê kesî li min nekiriye. Ji min re bêje tu kî? Ü tu kû ve jî biçî, ez bi te re mel!" Serê xwe hejand û got: "Tu dîn bûyî! Hefsar berde; talûke me." Min got: "Nabe, yan kuştin yan hatina li gel te."

Vêca got: "Bira, ez ê biçim nav deryaya xwînê! Ew cí ne ciyê yên wek te ye." Min gotê: "Xwe mijûl neke, ez ji te venabim, dê bi te re bim." Ku dît ti çare nîn e û ez ji dû wî venabim, got: "Hefsarı berde, siwar be û bikeve dû min." Bi rê ve hêdî-hêdî serpêhatiya xwe vegot:

"EZ Semsamê Sorsorî me. Min mamek heye, Cîhanbexş, li welatê Tergeverê ye. Wî keçek heye bi navê Gulendam. Ev heft sal in ku dilê min û wê ketiye hev. Kes nema ku min nekir xwazgın û cih nema neçûmê lê hê jî çareyek jê re nehatiye dîtin. Daxwaza mamê min next û qelenek pirr e lê jî min nayê. Ti rê di dest min de nemaye, véca ez ê biçim wê birevînim!.. Vê jî ji te re bêjim: mamê min hoz û binemalek boş heye, herwiha heft kur jî. Te ez dîtim; her yek ji wan dê çar ên wek min bixin bin lepê xwe! Jixwe nav û dengê çelengî û férisiya mamê min jî li hemî deverê belav e. Wê yekê jî dizanım ku destê min lê ranabe lê neçar im ku her biçim. Ev serpêhatiya min e. Dîsan jî tika ji te dikim tu bi rîya xwe biçi, bila serê te jî di vê rê de neçe."

Ku min ev gotinên wî bihîstin, jî dil û derûn û hêz û taqet ketim û ecêbiyekê serê min girt! Min got: "Bira, ez bi te re me û ta serê min bi vê rê de neçûbe, ez te bernadim." Got: "De madem wisan e, yallah, em biçin lê divê ez ci bêjim tu wisan bikî."

* * *

Dazdeh roj û dazdeh şevan me bi çargavkî şeqand, êvara roja dazdehê em gihan ciyekî. Got em dabezin û em peya bûn. Mehînên me berdan nav wan mîrgan û hat teniştâ min û got:

"Ho, ew konên jî dûr diyar mala mamê min in."

Bi rastî ku min dît, ta çav bisihirîne bêhejmar kon bûn. Got: "EZ ê biçim, vê spêdeyê min bi keçikê re jivan e, ew jî dê bêt û em ê bi elinda spêdeyê re bigîhin vir. Heke hingê nehatim, bizane ku tiştek hatiye serê min.

Êdî qet nesekine, siwarî hespê xwe bibe û yê min jî bibe û here. Ne ku bikeve serê te ku rabî bi van re şer an tiştekî bikî. Tevî hemî wê zîrekî û çelengiya xwe jî, min dît ku ew gelek ditirsî, wisan diyar dibû ku mam û pis-mamên wî hê ji wî jî pirr bîdestûdartir bûn. Herçi ez bûm, min bi temamî rengê xwe avêtibû. Rabû şûrê xwe kir kevanê, mertal xist navmilên xwe, rim xist destê xwe, xatir ji min xwest û bi piyan bi rê ket. Min jî hesp anîn, kurtan jê kirin, êm û alif kirin, av dan û berdan wan çîmenan.

Du par ji şevê borîbûn-neborîbûn min hind dît ku ji dûr ve du tarmayî peyda bûn, bi leza ba dihatin. Pirr pê neçû, min dît Semsam e û jinek li gel e. Şev bû, min her hind dît ku jinek lihevhatî û berkeftî bû. Êdî em rûnenişt, ji min re got siwar be, bi xwe jî siwar bû û jin xist paş xwe, berê xwe da min û got:

"Em biçin. Ta niha dijmin tirs nexistiye min lê carinan li ser milê xwe li paş xwe binere. Heke te dît ku leşkerê hemî dinyayê civiye û daye pey me, qet guh nediyê û hespê xwe biajo her wek tiştek tine be û ji min re ji nebêje lê eger te dît heşt siwar tê, ji min re bêje: êdî xelasbûn nîn e!!!"

Vêca me qamçî li hespan veweşandin û em çûn. Cevêca ci çûnek bû! Ba û bahoz jî nedigiha me. Carinan min awirek dida paş xwe û wisan em çûn ta berbang û gizingê lê da û dinya bi tevayî ron bû û hingê min carekê çavek li jinê gerand û min dît ku keçek derdorî 18 salan e, dikarî ne bixwî û ne jî biki lê tenê li gerdena wê binerî, bejnûbalek dirêj û xweşik hebû, sor û spî, çavêن wê mina mercanan, gep û alekên wê wek sêvên Serdeşte. Pirça serê wê şibî davên reş ên hevrîşmî û armûşî belavi sermilên wê dibû û dadiket navtengê. Vêca ci navteng bû? Te digot qey gerdena ask û xezalan e! Bi rastî jî Gulendam gulendam bû. Gulendam hejî hindê bû ku wî Semsamî ser û canê xwe bo dikir gorî û qurban!

* * *

Roj hilhat û tav û tîrêjên xwe bi ser dinyayê de belav kirin û bi Gulendamê û pirrpirrokên kezî û biskên wê dest bi veşartokanê kir. Bûbû bernîvroya dereng dema ez li ser milê xwe zivirîm û min dît ku heşt siwar - yek li pêş û heft li paş - bi leza birûskan têñ. Ku çavê min pê ket, min bangî Semsam kir ku va ye heşt siwar ketine pey me. Di cî de Semsam mehîna xwe rawestand û ji min re got: "Êdî xelas!.. Tu vegere welatê xwe lê carinan min bîne bîra xwe!" Bi van gotinêñ wî dilê min bi wî şewitî, rondik û hêşir ji çavêñ min barîn. Ew ji mehîna xwe dabezî, hefsarê wê da dest Gulendamê û girî li gewriyê gotê: "Here lê siwar bibe û gerdena min aza ke û kû ve biçî, bi xér biçî madem her mirada me bi hev hasil nebû!" Herduyan rondik werandin. Ji min re jî got: here li wê dera han raweste û temaşeyî vê pevcûn û milanê bike. Bi xwe jî li ser rê, destikê şûr di destî de, hemberî siwaran wek singekî sekinî!..

Gelek pê ve neçû, siwar gihan wir. Min dît ku yek ri-hdirêj e û heft xortêñ nûgihayî li pey wî ne, hemî ji nişaneyên fêrisî û pelewaniyê li rûyê wan diyar e û agir ji wan dibare. Semsam ji min re got ku yê rîspî mamê wî ye û yén din jî dûndeya wî ne. Ew hatin hemberî Semsam rawestîn.

Yê rîspî got: "Semsam, te çima ev agir vêxist! Bo cî li nav hemî êl û eşîra Tergeverê te ez ji hîlak kirim!?" Semsam jî gotê: "Mamo, heft sal e rica û tika nema min nekir lê te dîsan jî Gulendam neda min daku ez bibim yê wê û ew ya min. Te em dan xatirê malê dinyayê. Niha jî tiştek nebûye, bêje "min da te" û ez tiştek din ji te naxwazim. Mam awir da kurek xwe û gotê: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Kur xwe wek kêçê tê werkir, ji mehîna xwe dabezî û şûr di destî hat hemberî Semsam rawestî. Semsam gotê: "Mamo, bo xatirê Xwedê, nebe sedema xwîndariyê di navbera me de, ji ya Şeytan were xwarê." Lê mam dîsan jî bangî kurik kir: "De ka serê wî ji min re bîne!"

Li wê meydanê ew herdu darterr, ku hê nû tamiji baxê jiyanê bûbûn, bi şûr û tîran pev çûn. Dema min dît, min got: wella Semsam rast digot dema ji min re diyar kir ku her kurmamek wî dikare çar ên wek wî bixe bin lepê xwe. Wisan bi lez bû pevçûna wan ku min nedizanî li liv û tevgerên kê ji wan binerim!

Bi wî awayî kurik xwe nêzî nîv seatê hemberî gurz û pelamarên Semsam ragirt. Lê dawiyê ku kurik dihat şûrê xwe li Semsam bixe, vî şûrê xwe veweşand sermilê wî û di perasûyê wî yê çepê re derkir! Kurik ket wir. Min êdî xwe ranegirt, rondik bi çavêن min de hatin xwarê. Min hay jê bû ku Gulendam jî qorre-qorr digirîl..

Ku Cihanbexş ew yek dît, berê xwe da yek din ji kurên xwe û gotê: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Yek din êriş kirê. Semsam dîsan gazî kirê: "Mamo, bo xatire Xwedê, bes e, bila êdî hew xwîn bi neheqî birije." Mam jî gazî kirê: "Qurban, hê hestiyê pişta te neşkestiye, niha ew jî dê bişkê. De tu bisekine, hê ev destpêk e!"

Semsam dijî wî jî şer kir û gelek pê neçû ku ew jî kuşt!.. Mam dîsan bang kir yek din ji kurên xwe: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Ew jî hat meydanê û ew jî hat kuştin!

Wisan yek bi yek kurên xwe şandin û bi destê Semsam dan kuştin. Pirr seyr û sosret bû ku ev karesat û bela hemî qewimî lê gotinek tal ji devê yekî dernediket: vî her digot "mamo, bes e", yê dî digot "qurban, hê ev destpêk e"!!!

Vêca ku kes nema, min hind dît ku Cihanbexş bi xwe rikêb li hespê xwe da û hat raberî Semsam dabezi û got: "Qurban, ta niha şer şerê kaviran bû, niha jî şer şereqoçana beranan e; tu bibîne mamê te dê ci li te bike!" Dîsan Semsam hewar kirê: "Mamo, bila bes be..." Mamo jî gotê: "Qurban, besa ci niha? Were meydanê, were!..."

Mam û biraza li wê deşteçolê, li raserî wan heft termên kuştî û xêrneditî, şûr û tîr li hev veweşandin!

Qurban, bawer bike heke bibêjim melekên esman bi çavên tijîrondik hatibûn temâseyî wê karesatê, qet ne derew e, bawer bike! Ev kurê xort û ev kalepîr dihatin û diçûn û herdu jî ji şêrên birsî û tî dirindetir bûn.

Roj êdî li ber avabûnê bû, tavsork li rojavayê wenda dibû... Carekê Cîhanbexş nirrî: "Semsam, qurban, de êdî bes e! Şûrê xwe dane." Semsam jî got: "De mamo, tu jî bes bike, ez jî dibêjim bes e!" De vêca binere Feleka xayîn ci dike! Di dema wan şûrên xwe didanîn de, wan berê xwe neda serikê şûrên xwe û xwe jî neparast. Şûrê Semsam kete stoyê Cîhanbexş û serê wî jê firand! Yê Cîhanbexş jî stoyê serê Semsam ji leşê wî dûr avêt! Guhê min lé bû ku got: "Mamo, te qenc kir?" Yê mamo jî li aliyê din gotê: "Qurban, wiha baş e!"

* * *

Ku ti tişt nema, ançax komkujî û qelaçoya wan bi dawî hat. Neh term di nav xwîna xwe de digevizîn. Min dît ku Gulendamê desmala xwe deraniye û çavên xwe ziwa kirin, yek bi yek çavên wan girtin bê ku qet kinkinekê bike. Vêca ci ket serê min? Min jî xwe re got ku madem ev bela qewimî, bivê-nevê ev keç ji min re ma. Min berê xwe dayê û gotê: "Gulendam, te bi xwe dît ku ci qewimî û rû da. Niha digel min were em biçin. Diyar bû ku Xwedê ez bo te û tu bo min dayî!"

Ku min wiha got, min hew dît got: "Hay ji xwe hebe." Û min hind dît ku ez avêtime erdê û keçik li ser singê min çok daye û got: "Ha, ci dixwazî?" Min gotê bes e. Rabû û got:

"Bira! Ez ji van şêran im ên li vir ketin. Te bi xwe dît ka çawan bûn. Te dît bav û heft bira û dezgirê min Semsam li vir ketin. Ya ji te ve te ji xwe re hingivîn li nav çiya û keçek li nav kelex û miraran dîtiye. Ez ji te

re bêjim: ti kesî ta niha pişta me - ne mérén me û ne jî ya jinên me - nedaniye erdê. Ta niha ez bo Semsam bûm lê bavê min bo pare ev anî serê me! Ji niha pê ve ez bo axê me!"

Şûrê bavê xwe - yê Semsam pê hatibû kuştin - rakir, ta min gotê keçê dê çi bikî, li ser leşê Semsam da stoyê xwe û daweşî ser termê wî û bo hetahetayî bedena herduyan hev hemêz kir!

Êdì tenê ew di dest min de mabû ku li mehîna xwe siwar bûm û bê dest bikim tiştekî vegeŕim ciyê xwe.

Niha jî ku ew bûyer têt bîra min, kela dilê min difûre û şirrik rondik ji cavên min dibarin.


Qurban, ma heke mamê Semsam pêşî ew next û qelen û şîrbayê zêde ji wî camêri nexwesta, dê çîma ev bela bihata seri!?

* * *

- ilona 1946 -

ji soranî: 12/2002

Çapa orîjînal: "Le pênatî afreta!"



Şanoya JANA ZIRAV

-Serpêhatiya Listikekê-

M.Sait Alpaslan

Dem hene ji hemî deman xweştirîn in. Dem hene tahl in. Her çi qas ji tahliyekê bûyibe ji, rojek / demek mîna Newrozê, bûye hêviya hemî gelên rojhilata navîn. Demên tahl û demên xweş di dîroka mirovahiyê de tim timî li pêy hev hatine. Bo wê mirov baweriya xwe bi gotina “paşıya tengiyê firehî ye” anîne. Li ser jiyanê, çand û hunerê, li ser muzîk û şano, li ser hemî beşên hunerê, gelek caran li pêy tengasiyên û bêbinî, ji berxwedana mirov ev qas firehiyên xweş pêkhatine ku, dem ji iro ji mirov lê dinihêre, matmayî dimîne. Bi rastî çîroka “Jana Zirav” ji çirokek wusa bû. Bo vê yekê dixwazim di derbarê janek zirav de binivîsim.

Li Kurdistana Bakur, di qada fermî de, bi Zimanê Kurdî, lîstika şano ya yekem “Jana Zirav” bû. Mijara lîstikê serpêhatiyên Şemsê Alak a ku li navçeyek Mêrdînê, ji aliyê malbat û gundiyên xwe ve hatiye reciman-

din bû. Di sala 2003'an de, di 16ê Kewçêrê de "Şanoya Bajêr ya Şaredariya Sûrê" lîstikê derxistin ber temâşevanan. Berî ku lîstik derkeve ber temâşevanan, di réyek teng û bizehmet de meşiyabû. Ez şahdeyê hemi zor û zehmetiyên lîstikê me. Bo vê yekê dixwazim Kovara Ronî de, di derbarê "Jana Zirav" de çend tiştî binivîsim. Lê berê, bona ku armanca min qenc bête fêhmkirin, divê ez di derheqê kurtedîroka Şanoya Şaredariya Amedê hin agahiyan bidim xwendevanên hêja.

Şanoya Bajêr ya Diyarbekirê di sala 1990'an de hate damezirandin. Qandî 40 kesî bi azmûnekê, wekî xebatkarên teknîkî û hunermend û lîstikvaniyê di şanoyê de bicih kirin û şano dest bi pêşkêsiyên xwe kir. Mixabîn di sala 1994'an de partiya olperestan hate rêvebiriya şaredariyan û şano, koroya muzikê û hwd. li ser navê çand û hunerê ci hebin hatin bela-wela kirin. Beriya vê demê, di sala 1992'an de şanoger, bi azmûnekê ji karkeriyê derbasî karmendiyê bûbûn. Bo vê yekê hemi qedra şanoya bajêr dan ber destê Şaredariya Sûrê. Ji ber ku rêvebirê herî hov şaredarê Sûrê bû û bi armanca ji kar avêtinê, hemiya şano girt bin banên xwe. Hemî hunermandan dan çopê, zabitayê. Forta li wan xwendin û ji 40 xebatkari, tenê 6 hunermend û 2 xebatkarên teknîkê xebatkariya şaredariyê domandin. Yê din gişt dev ji kar berdan. Bi saya ev polîtikaya qirêj damarek ji jiyana çand û hunera herêmê hatibû birrin.

Ji ber ku Şanoya Bajêr ne tenê ji Amedê re, digel Amedê xizmetê dida hemûya herêmê.

Di navbera salên RP û hilbijartinên 1999'an de hunermanden ku li şaredariya mabûn, gav bi avakirina şanoyê taybet, gay di bin banên şaredariyê de hunerên xwe domandin. Di hilbijartinên 1999'an de DEHAP bi den-

gekî mezin hate rêvebiriyên şaredariyan. Lê ji ber ku pirsgirêkên gel ên 80 salî û pirsgirêkên politîk giran bûbûn çand û huner tîm di paş van pirsgirêkan de ma. Hunermendêن şanoyê jî bi gazinc û rexnan dîsa vege-riyan Şaredariya Sûrê.

Tiştên ku heta niha nivîsandim, gellek carî bûbûn mi-jarên nivîsên min. Ji ber, çawa ku di têkoşînê de pêwist be, di derbarê “Şanoya Kurdi” de jî dîroknivîsî hewce dike.

Di navbeyna salêن 1984 -2002'an de sazî û komên Kurd an jî şoresgerên Tîrkan, her ci qas di gotin û axaf-tinê de tûnd bin jî, di lêkerê de, xebatêن xwe ji bilî Azîz Nesin, Orhan Asena, Tuncer Cucenoglu, Nazim Hîk-met û hwd. wêdetir nebiribûn. Ev jî dor li xebatan pê-çiya, xebatan kud û teng hişt û bona firehî û pêşveçûnê de rêçikek nû venekir. Di vê navberê de şerê azadiyê her ku diçû şewla xwe bi her aliyê jiyanê ve dixist. Û bi pirrani jî, li ser çand û hunerê. Saziyêن mîna NÇM ve-dibûn û him li aliyê muzîk, şano û çandê de, him jî li aliyê weşanê de çirayek nû pêdixist û qedexeyiya sed sali dişikandin. Ev li qada taybet şoreşek mezin bû. Li Stanbûlê, NÇM, li hêwana Müammer Karaca lîstikên kurdî, yêن mîna “Komara Dînan” bi zimanê dayikê di-lîst û qandî ku eleqedariyek mezin didît, rastî gelek ten-gasiyan jî dihat.

Di sala 2002'an de dema em li Şaredariya Sûrê bûn, bi kurtelistikan koma me, bona piştgiriye tevlî hilbijartinan bû. Di navberê de me stranêن kurdî, çend gotinêن kurdî li nav lîstikan dixistin û bi vî awayî hisreta xwe ya ji zimanê xwe re aş dikirin. Êdî rojek nû, politîkayak nû hewce dikir. Him di jiyanê de, him jî di şano de. Ez

bi xwe ji 1991'an vê de, bi zimanê kurdî, di gellek cûreyên wêjeyê de mijûl bûm. Du pirtûkên min ên helbestan, sê – çar pirtûkên min ên wergerê hatin weşandin lê tim di qada şano de ez bi tirs bûm. Ji ber ku zimanê şano zimanek taybet e. Ne zimanek wêjeyî ye. Divê zimanek zindî, zimanê ku li kuçê tête axaftin be. Ya na hêst bi rastî nayê zimên, kêm dimîne. Zimanek kud jî di qada şano de bona mirov eziyet e. Bo vê yekê, belê helbest, novel, çîrok bi zimanên xwe yên taybet têne nivîsandin, lê belê bi rastî jî zimanê şano zimanekî zindî bû û ez jî ji ber vê taybetiyê zehf ditirsiyam.

Li Kurdistana Bakur,
di qada fermî de,
bi Zimanê Kurdî,
lîstika şano ya yekem
“Jana Zirav” bû.

Wekî min li jor jî nivîsand, di dawiya 2002'an de li navçeyek Mêrdînê, jinika bi navê Şemsê Alak, teví Xelîl Açîl'ê ku navê wan pev ra derketibûn ji aliyê malbat û gundiyên xwe ve hatibûn recimandin û bi mirîtu li qada gund ve hatibûn hiştin. Di vê recmê de Xelîl miribû, lê Şemsê hîn can nedabû. Ji aliyê rêwiyekî rewşa Şemsê hatibû dîtin û Şemsê bi wî halê xwe ve rakiribûn nexweşxana fakulta Amedê. Li wir, Şemsê ji aliyê saziyên pîrekan ve hatibû parastin û şes meh bi wî aliyê xweyî lawaz bi çepilêñ jiyanê ve girtibû.

Dema ez bona nivîsandina lîstekêk li ber kompîturê rû-niştim, armanca min li ser jinê welêt lîstikek nivisan-din bû. Ji ber ku jina kurd bi du ali ve di cenderê de bû. Him ji ber jinbûna xwe û him jî ji ber kurdbûna xwe hemî tengasî li ser serê jina kurd ve bariyabûn. Kêm û zêde ez saet di 9'ê êvarê de li ber kompîturê rûniştim û kite bi kite, gotin bi gotin, diyalog bi diyalog lîstik ji me-jiyê min weşîya ser tikên klavyê. Bêsekin 12 saet nivî-sandim. Dema min gotinê "tarîbûn û perde" nivîsandin, li saetê nihêrtim, saet 9'ê sibehê bû. Lîstikê çap kirim û anîm nava koma meyi şano. Hevalan bi ele-qeyek mezin listikê rahiştin û xwendin. Her ci qas ar-manca min, rewşa jina kurd be jî, dema hate xwendin min bi xwe fêhm kir ku, min çiroka Şemsê Alak nivî-sandibû. Ji ber ku ûcdanê min tu cari kuştina Şemsê qebûl nekiribû. Min tu carî bi vî awayî darazîn û kuştina mirovan qebûl nedikir/nakim û divê min tiştek li dijî vê bextereşiyê bikira. Ev jî bi gotina janek zirav û bi lîstika Şemsê, ji hişê min herikîbû ser kaxezên sipî.

Bi rastî her ci qas berpîrsiyarê şanoyê ez bûm jî, dîsa min biryara bijartina lîstikê ji hevala re hiştin. Hema heta nivrojê, ya ku min dît, heta rol jî hatibû belav kirin û wekî serpêhatiyekê me dest bi lîstikê kir. Dema me dest bi provayêن lîstikê kir, koma me ji 6 kesî pêk dihat û di koma me de jin tunebû. Bona rolên Şemsê û dayika wê 2 lîstikvamêm jin hewce dkirin. Me agahî ji der ú dor û saziyan re şandin û daxwazî û hewcedariyên xwe ji wan re gihadin. Ji ber ku, ka dê bi ci awayî têkildar bibin, ka dê piştgiriyê bidin an jî dê desturê nedin, me nizanîbûn, dema me dest bi provayêن xwendinê kirin, koma me bêyî destûra rêvebiriya şaredariyê dest bi xebatêن xwe kirin. Di çapemeniyê de gelek hevalên me hebûn û dem demî di derbarê xebatêن me de jî me di-

pirsîn. Dema van hevalana mijar û bi Kurdîbûna lîstikê bihîstin, wekî li ser serê me bibarin, ji her aliye dinê nû-çevan hatin û hevpeyvinan bi me re kirin. Îdî em ji ber eleqa ku nîşan didan aciz bûbûn. Ji ber ku bona pro-wakirinê wext ji me re nedima. Di vê navberê de ji Navenda Piştgiriya Jinan Selîsê hevala Sema û bi saya nasan Dewran tevlî xebatan bûbûn. Rojekê şewirdarê şaredarê Sûrê, li ser navê komê bangi min kir û nivîsek ji wilayeta Amedê hatiye nîşanî min da. Nivîs ji wilayetê hatibû, li ser nûçeyek rojnameyek kesayetiya listikvanan û xebatê dipirsîn. Nivîs ji wilayetê dihat lé bona bersivê navnîşanê wekî Ewlehiya Amedê nîşan dayîbûn. Bi rastî şaredariyê bersivek bitirs, wekî ku, “lîstikvan kar-ker in, di demên xweyî vala bi amatorî van xebatan dimeşînin!” da ewlehiyê. Ez ji ber vê tirsê şikestem. Ji ber ku mîna me tenê hiştibûn û di vê mijarê de jî şanoyê dîsa tenê hiştibûn. Lê jixwe dema me dest pê kirin, me her tiştî dabûn ber çavên xwe. Ger şaredarî xwedî lê derneketa em ê wekî şanoyek taybet, mesref ji xwe der-ke-tina ser dikê. Bo vê yekê me xebatê xwe hê jî geştir kirin û lîstik berbi temamîyê ve çû.

Tîştekî ecêb e; lîstik li ser navê şaredariya Sûrê bû, lê me cil û berg bi perê şaredariya mezin, teknîk bi perê şaredariya Yênişehîrê, ronahiyê bi perê şaredariya Pe-yasê û afiş û rîsale bi perê şaredariya Baxlarê ve amade kiribûn.

16'ê Kewçêra 2003'an bona ser dikê dîroka me bû lê bona serîlêdana wilayetê li şaredariya Sûrê kesî ku dax-waznamê destxet bike tunebû. Cîgirê Şaredar Cezaîr Serîn xwe dida alî, digot; “bêyî serokê şaredariyê ez ni-karim destxet bikim!” 6 roj ez li pêy cîgir û şewirdarê şaredar ve geriyam lê mixabîn çareser nebû. Da ku şa-

redar Cezaîr Serîn ji gera xweyî Ewropa vegeriya û ez tevî parêzger Newzat Kaya çûm cem wî... Cezaîr Serîn ji ber ku Newzat Kaya parêzer bû, ji wî re pirsa; “Tu dibêje çî? Ez destxet bikim an jî na?” kir. Bersiva Newzat Kaya tu carî ji bîra min ve naçe, ji ber ku bi vî awayî bersivê da; “Welle maqûl tu dizanî. Ji ber ku ev berpirsiyariyek politîk e. Lê ez bûma, ez ê biketima bin vî barî!” Li ser vê bersivê êdî her tişt zelal bûbû. Daxwazname hate destxet kîrin û di 16'ê Kewçêrê de Jana Zirav bi balkêşiyek mezin derket ser dike.

Belê, hestêne me, hestêne lîstikvan û temâsevanan pev ra rabûn. Him li dijî zilma kevneşopîyan, him jî li dijî qedexeyiyêن li ser zimên. Bo vê yekê Jana Zirav ji Wêranşarê heta Çolemêrgê, ji Elkê heta Koln û Stuttgartê bê minnet bi zimanê zîkmakî derket ser dike. Li Mannheimê bi germenî hate lîstin. Û li Tirkîyê, di qada fermî de bû lîstika kurdî ya pêşîn. Bo vê yekê Serokwezîrê Tîrkan li Yekîtiya Ewrûpa de; “Ma kengê kurdî qedexe yi? Ma ne rojname û pirtûk têne weşandin. Heta li Amedê şanoya şaredariyekê lîstikêن bi kurdî jî dilizin!” digot.

Her gera lîstikê bi serê xwe serpêhatiyek e. Li Beytuşşebabê, li Wanê, li Qoserê astengiyêن ku dîtine... Her yek mijara lîstikekê, nivîsekê ne.


Li pêy ev qas salî çend hevalê qenc û jîr, bi kîrin û alîkariyêن xwe, bi rastî spasiyê li xwe heq kirine... Serokê DEHAP a şaxa Amedê Firat Anli, tevî rêvebiriya partiyê piştgiryek mezin dan me. Em bê hêwan bûn, bi daxwazya wan şaredariya mezin him bona prowa him jî bona lîstikê hêwana xwe bêberdêl dan me. Dema ji ber lîstikê di navbera me û şaredariyê de pirsgirêk der-

ketin, dîsa partî dest danî ser pirsgirêkan û bona çare-seriyê xebitîn, ji ber vê yekê, ez bi xwe spasdarê wan im.


Divê ez di vê xebatê de spasdariyekê jî ji endamê Mec-lîsa Şaredariya Sûrê Parêzer Newzat Kaya û ji Şaredarê Sûrê Cezaîr Serîn re ji bikim. Ger hema dawiya dawîn jî be, li xebatê xwedî derneketina, bi rastî jî dê barê me bi du-sê qatî girantir biba.

Îro bi projeyên hé jî nûjentir û pêşengtir, bi tena serê xwe rûniştibin, ev ne ji nezaniya me, lê ji bêxwedîtiya me ye. Bi rastî Jana Zirav, Hilbijartin, Wendarî, Şûjin, Zext bi şewla têkoşînê derketin ser dikê û holê... Mixabîn îroj em li rûmetê xwe xwedî dernekevin û bi civakî li ser pirsgirêkên xwe xwar nebin, tim mîna sêwiyêni li ber dîwaran, em ê bi kirinêن wekî din dilên xwe biêşinin û lîstikînê mîna 33 Gule, Îlondar, Zagona Çiya, Çarsim Axa û hwd. li ber dikan, bê dik û bê hêwan, bi zimanekî lal bisekinin...

Divê vê sekina bona hisyeta pênûsê û bona xîreta ro-nakbîriyê dile me piçekî biêşîne...



ZÎLAN: İMPERETORIYA KURDAN A KU ROME HEJANDIYE



Bedel Boseli

A1- Çend gotin

Mijara vê nivîsarê împeretoriyeke kurdan e û bi gelemperî me hay jê tune ye. Ez cara yekem di pirtûka Prof. Dr. Mehrdad R. Izady de pê hesiyam û bala min pir kişand (1). Ez li ser çavkaniyên rêzdar Izady hûr bûm û min ji xeynî wan zêdetir çavkanî jî peyda kirin. Di çavkaniyên kevnar de wekî Împeretoriya Îranî tê pejirandin, Kurd jî gelekî Îranî ye. Ew çavkanî diyar dikin ku ev Împeretorî ji 3 dewletan pêk tê, her sê dewlet ji heman neteweyî ne. Yek ji wan, Dewleta Komagene ye. Û ew peykereyên li çiyyayê Nemrûdê bermahiyêñ Dewleta Komageneyê ne. Em kurd jî dipejirînin ku Komagene dewleteka kurdan e ji ber ku zanista dîrokê wûsa şanî me dide.

Me gotibû tev çavkaniyên dîrokî dibêjin Împeretoriya Zîlanê Êرانî ye. Hinek jî dibêjin Persiyayî ne. Lê divê em eßkere bikin ku rojavayıyan demen berê carna ji hemû gelên Êranê re digotin Persiyayî. Wan ji kurdan re jî digotin Persiyayî. Ka çawa em niha ji tirkan re dibêjin ROM. Di çavkaniyên yewnaniyan de gelek caran ji Sasanîyen faris re Medî tê gotin. Ji şerê Yewnan û Fârisan re digotin: Şerên Medik. Van şerên Medik Pz. 492 di navbera faris û yewnanan de dest pê kiribûn. Weke din ger hûn niha jî li malpera hûnermendê kurd ê navdar Bahramjî binérin wiha dibêje: "Bahram 1952'ê li bajarê kurdan Kîrmanşahê ku li Persiya ye hatiye dinê". Ger hûn niha jî li www.livius.org binêrin mijara Medyayê di nav beşa "Persia" de ye. Lê belê divê li pêsiyê em bizanin ku gelek caran ji Kurdistanê re Persiya dihat gotin. Dema we di çavkaniyên resen de peyya "Persiya" dît bila ev pêzanîn bê bîra we.

Weke din jî hînek general û dîrokzan û generalên li ser mijarê nivîsandine wê heyema tevlî Şerê Zîlanî û Romeyê bûbûn. Ango li wir bûn û nivîsandin.

Hêjayi gotinêye ku dema kurdên Medyayê ber bi rojava ve diçin rastî Zîlaniyan têñ. Bi hev re şer nakin. Ji ber ku ji heman neteweyî ne. Artêşa xwe dikin yek. Weke din piştî Medya têk diçe jî rêveberên Medyayê tevlî artêşa Zîlanê dîbin li hemberî Romeyê. Di şerê li hemberî Lucculus ê generalê Romeyê de rêberê medîyan *Mithradata* tê kuştin û kurê wî Mede şûna wî digire. Jixwe qralên Zîlaniyan her bi Êranîbûna xwe pesnê xwe didan.

A2-Destpêk

Ew împeretori ji yekitiya 3 dewletan pêk dihat û navê wê Zîlan bû. Beriya avabûna dewleta Medyayê (Bz. 727) hebû û piştî wan jî li ser piya bû(1). Zîlaniyan axa Ewropa, Anatoliya, İskît (derdorê Rusyayê), Qibrîs, Ege û Marmara, Ermenîstan û pareke Mezopotamyayê xistibûn di nav dewleta xwe de. Mezopotamyaya mayî û Êran jî wê çaxê di destê hevalkarêñ wê dewletê, kurdên Medyayê(2) de bûn.

Medayê her alikariya Zîlanê dikir. Qralê Ermenîstanê alikariya Medîyan dikir ku leşker û cebirxaneyên xwe li hawara Zîlaniyan bibin. Pisporê erdnîgariyê Strabo wê heyamê wiha dinivîse: “Zîlaniyan Împeratoriya Romeyê ji Asyayê derxistin û li pareke biçûk a Ewropeyê asê kirin, dorpêç kirin, birçî û bêzar hiştin...”. (3) Beriya tev neteweyan Zîlaniyan ola Isa Pêxemberî (Filehti) qebul kirin. Akademiyêñ felsefeyê yên li Yewnanîstanê pêş xistin. Jixwe zanistê İranî Ali Şeriatî yê faris di pirtûka bi navê Modernizm û Medeniyet de dibêje: “Kurdan Yewnanî hîni felsefe û şaristaniyê kirine kirine...”.(4) Mîna Romeyê olîmpiyat dardixistin. Lê olîmpiyatêñ wan ji bo xurtkirina yekitiya Împeretoriyê bû. Modela dewletek ji wan cumhuriyet bû. (5) Rêzgirtin li nîjadêñ din digirtin. Wan kurdan di dîrokê de yekem car fermaña azadkirina xulaman dabûn. Dîrokzanê Romeyê Cassius wiha nîvisandiye: “Li hemû dinê xulam, bindest û jaran hawara xwe digihandin Zîlaniyan”.(6) Sparta-kusê di dîrokê de navdar bi pistevaniya Zîlaniyan serhilda û qralê wan vewwend Italyayê. Serhildanêñ li İspaniyayê –ku hûn di filman de temaşa dîkin- wan Zîlaniyan provake dikirin. Li Wanê leşkergehêñ jinan ava kiribûn. Ku ji wê çaxê heya niha jinêñ kurd di şeran de cih digirin. Jixwe kesê li çiyayê Kurdistanê binêre dê vê rastiyê bibîne. Carekê -bi tenê- jinêñ kurd çûbûn şerê Romeyê û artêşa Romeyê têk birin. Generalên Romeyê ji ber vê şermê û bêrûmetiyê demeke dirêj ji malêñ xwe derneketicin(7). Wan gelek şano û pirtûkxaneyêñ navdar ava kiribûn.

Zîlanî Kî Ne?

Zîlanî navê xanedaniyeke li rojavayî Kurdistanê ye. Li herêma Yozgat û Zîleyê ne. Heya niha jî bi navê Zîlan û Milanê dimînin. Împaratoriya Zîlanê ji 3 dewletan pêk dihat. Her 3 dewlet jî ji binemala kurdêñ Zîlanê bûn. Ev dewlet, Kapadokya, Komagene û Pontûs in . Di nîvisêñ kevnar de dema li hemberî Lîdyayê alikariya Împaratoriya Medayê dîkin em dibînin. Lê ev dewlet beriya Medîyan jî hebûn. Di çavkaniyêñ Assuran de qala wan tê kirin. Zîlaniyan li gel Medîyan yekitiya xwe saz kirin û bi artêşa hevkar heya bi Ikonion (Konya) û Angorayê (Enqere) serdest kirin. Dema farisan dewleta

Medya ji kurdan stand dewletên Zîlaniyan jî serdest kirin. Qralêñ Kurd ên Zîlanî ji welatê wan koçber kirin. Wan qralan li rojavayê Anatoliyayê parêzgerî ango walîti dikirin(8). Piştî dewleta Axameniyêñ faris ji aliye ïskenderê Mezin ve hat hilweşandin Qralêñ Zîlanê di Bz.333'an de vegerin ser axa xwe. Piştî Medya ket destê farisan jî gelê Medyayê leşker û cebirxane dişandin arî-kariya qralê Zîlaniyan ê Pontûsi.



Navê Qralêñ Wan

Em dê niha li 3 dewletên Zîlanê binêrin. Ev her 3 dewlet di heman demî de hebûn. Qralêñ wan cida bûn lê yekitiya wan xurt bû. Di şer û aşitiyê de vêkre bûn. Em di pirtükên kevnî de dibînin ku ji piraniya qralêñ her sê dewletan re û peyre ji rêveberên Medyayê re jî “*Mithradata*” tê gotin. Peyva *Mithradata* ji “Mithra” û “daden” tê. Niha ev peyv weki Mîhrdad, Mehrdad, Mehrzat.. tê bikaranîn. Yewnanî ji *Mithradata* re dibêjin ‘*Mithridates*’. ‘Mithra’, peyveka Îndo-Ewropî ye û wateya wê: “Dayina rojê ye (Rojda)”. Peyva “*Mithradata*” li pêşiyê li şûna Qral û peyre li şûna “Xweda” hatibû bikaranîn

(9) Ji xwe em di çavkaniyan de dibînin ku hinek ji wan qralêن navê xwe dikin Mithridates dibêjin “Ez Xweda me”. Lê belê di vê xalê de peyva “Nemrut” tê bîra me. Jixwe Nemrûd ú Mithridata heman kes in. Dîrokzanêن Romeyê dibêjin navenda Komageneya Zîlaniyan Çiyayê Nemrûtê ye. “Daden” jî rehê peyva “dayînê” ye.



Împeretoriya Kurdén Zîlanê, (Heyama Mithradathayê Mezin, BZ. 86)

Çêkerê nexşeyê: Prof. Dr. Mehrdad R. Izady

Çavkaniyên nexşeyê: Appian (*History of Rome*, The Mithridatic Wars), Diocassius (History), Strabon (Geographica, XII.iii.1-2)

Dewletêن Zîlaniyan

d1- Dewlata Zîlaniyên Kapadokyayê (Cappadocia)

Wateya “Kapadokya”yê: Peyveka Îranî ye. Jê re hem “Hvaspadakhim” û “Katpatuka” dihat gotin. Herdu peyv jî heman wateyê dihewînin. Anglo “Welatê hespêن bedew”. (10)

Paytextê wan pêsiyê li Melediyê bû peyre bû Mazaca (Kayseri). Çavkanî şanî me didin ku gelê Kapadokyayê û Melidê lêzimên hev bûn. Di wê heyamê de demokratiktitirîn dewleta Zilaniyan bû. Çanda wan ya qraltî û gesrê pir pêşketî bû. Çav li Romeyê kirin û rêvebertiya dewleta xwe kirin CUMHURIYET (Bz. 95). Rêvebertî bi hilbijartinê bû. Ji aliyê olî ve çalak û bibandor bûn. Ji bo hemû herêman keşeyên ola filehtiyê wan perwerde dikirin. Parastina perestgehan ji aliyê wan ve dihat kirin.

Ji tev cîvakên dinê ya beriya hemûyan bûye fileh (ola Isa Pèxemberî qebûl kiriye) Zilaniyên Kapadokyayê bûn. Ji aliyê felsefeyê ve Zilaniyên herî pêşketî ev bûn(11).



Wêne: Barzanê Arî yé 3'yemîn

(Qralé Federasyona Zelaniyên Kapadokyayê)

d2- Zilaniyên Komageneyê (Commagene)

Wateya “Komagene”yê: Tev dîrokzanên mijarê dibêjin ku li Komageneyê hemû nijad bi hev re bi aştiyane dijin. Nijadêن cihê ji bo hev rêzgirtineka ji rêzê der dirirtin. Li ser vê têgehê em li wateya navê Komageneyê binêrin. Ji “koma” û “gene” pêk tê ev nav. Koma: Kom, Gene: Kinête, nifş, nijad. Wesxwe wateya “Komagene”yê, bi kurmanciya niha “Koma Kinêteyan” û “koma kinêteyan/nifşan”, “Koma Nijadan” e. Ev peyv

malê hemû zimanên Índo-Ewropî ye. Di zimanên Índo-Ewropî yên rojhilatî de bi derbazbûna dem “g” xwe diguhere û dibe “z”. Ger hûn li ser “gene” yê bihi-zirin vê rêzikê bihînin bîra xwe. Peyvên “zan/zayîn/zayend”, “zane/zanîn”, “nas/nasîn” ji “gene” yê peydabûne. Ger di <http://www.etymonline.com> ‘e de li “**gno**” “**gnos**” û “**gene**” binêrin hûnê vê yekê bibî-nin. Li herêma Behdînan û Hekariyan ji bo “genetik” û “nîjad” peyva “kinête” tê bikaranîn. Jixwe ji ber ku ji gelek kinêtîyan pêk hatibû jê re digitin “komagene”.

Lê belê Zîlaniyêن Komageneyê li herêma Semsûrê dewleta xwe ava kiribûn û peyre mezintir bû. Ev malbat heya niha ji li herêmê bi navê Kowa/Koma dimîne. Ev 3000 sal in ew malbat li wir e. Di Bz. 850’ye de Assuriyan behsa Dewleta Komageneyê kirine. Wê çaxê Komageneyê bac dida dewleta Assuran. Assur, kalên Sûryaniya ne. Ka kurd çawa lêzimên farisan e, Asûr ji wûsa lêzimên ereban e. Di salên Bz. 550’yan de li pêşiyê Îskenderê Mezin ê Makedonî û peyre faris dewleta Komageneyê dagir dikin. Di Bz. 130’an de Komagene xwe dîsa ji dijminan rizgar dike û tevlî Împeretoriya Zîlanê dibe.

Sazûmaniya dewleta Komageneyê ji bo neteweyên cihê rêzgir bû. Di wê dewletê de nîjad ne giring bû. Ew dewlet ya tev cîvakan bû. Qral *Mithradata* (Mithridates I) ji tunebûna hizra neteweyî nerazi bû û ji bo xwirtkirina vê hîzrê her sal li Komageneyê olîmpiyat dardixistin. Û di van olîmpiyatan de *Mithradata* bixwe pir zîrek bû. Ev olîmpiyat mîna yên yewnaniyan pêşketî bûn.

Mithradata yê qralê Pontûsê (Mithridates I (Bz. 109-86)) li gel jineke seleukos (yewnani) zewicî. Kurekî wan hat dinê û navê bavê jina xwe lê kir. Navê kurê xwe kiribû Antiochos. Piştî Julius Sezarî Împeretoriya Zîlanê Bz. 47’ê têk bir dewleta Komageneyê ma tenê. Împeretoriya Romeyê pir êriş dianîn ser. Ji ber vê yekê Qral *Mithradatayî* (Mithridatesi) angó Nemrûdi li gel Xwedayan

peymanek çêkir. Û gel bi vê yekê da bawer kirin. Perestgeh ava kirin û peykereyên xwedayan çêkirin. Navê wan xwedayan Yewnanî-Îranî danîn. 14'yê Tebaxê weke roja xuyabûna xwedayan hat qebul kirin û qral *Mithradatayî* wê rojê tac kiribû serê xwe. Di vê rojê de gîrgire û kesên pîroz li çiyayê Nemrutê kom dibûn. Generalên Romeyê pir pesnê berxwedana û yekitiya Komageneyê didin. Û diyar dikin ku artêşa Komageneyê ya biçûk li gel Romeya mezin şereke sosret û jê rîzê der kiribû. Û Pişî têkbirina Împeretoriyê Rome 147 salan nikarîbû Komageneyê hilweşîne.


Mithradatayî kurê xwe Antiochos kir qral û vêkre perestgehek li çiyayê Nemrûdê ava kirin. Antiochosî navê xwe kir Theos (Xweda). Ezê li dawiyê di mijara Nemrûtê vê de mijarê binivîsim. Li Komageneyê bazirganî pir pêşketî bû. Romeyî û Partî dijminê hev bûn. Ji ber van têkiliyên nebaş ji bo bazirganiyê li Komegeneya kurdan têkilî peyda dikirin. Bazirganên ereb, faris, yewnanî, romeyi û hwd. ji bo bazirganiya xwe Komagene kiribûn navend(12).

d3- Zîlaniyê Pontûsê

Mezintirîn dewlet bû ji Zelaniyan. Şerker bûn. Li pêsiyê Deryaya Reş û peyre rojavayê Anatoliya, Anatoliya û Derya Spî serdest kirin. Li hemberî Romayê li gel İspanyol, Kartacayî, Galyayê Frenseyê û gelên Îtalyayê yên serhilder têkiliyên xwe baş kirin. Bz. 120'ê desthilatiya kurdên Pontusê li Asya û Ewropayê bicih bûbû. Di dema qral *Mithradatayê Mezin* (*Mithridates the Great, Mithridates 6*) de roma ji Asyayê derxistin. Ukraniya, Yewnanistan û piraniya Balkanan bi dest xistibûn. Peyre Gürcistan û Bakurî Kafkasyayê ji serdest kirin. Ji bo standina Romayê Behra Adriyatîkê asê kirin. Derdora Îtalyayê bidestxistin.

Dîrokzanê leşkeriyê APPIAN vê dorpéçkirinê wiha dinivise:

“Mitîhrîdatesî ji 400’an pirtir geşti, ji 50.000’an pirtir leşkerên Siyari û ji 250.000’an pirtir leşkerên piyade û têra wan cebirkane amade kiribû. Hevalbendên wî, Qralê Ermenîstanê û Prensên Îskîtiyan bûn. Piştevaniya serhilderên Romayê dikir. Li gel Galyayiyan (Fransiyâ) têkiliyên xwe xwirt kirin. Ji Klikiyayê ta Cebelitarikê (Strait of Gibraltar) behr ji geşti û salaran (komando) tejî kiribû. Bi vî awayî rêka Romeyê ya ba-zirganiyê asê kiribû û Romeyî demeke dirêj birçî man. Bi kurtî, Mîthrîdatayî ji rojhlatê ta rojavayê mezintirîn tevgera dîrokî pêkanî bû. Ji hêz û kirina mirovan tiştek nemabû ku bi cih ne anije ji bo vê dorpêçkirinê ...”(13).



(Mîthrîdatayê Mezin, Qralê Zîlaniyê Pontûsê)

Dîrokzanê wê heyamê Cassius di pirtûka xwe de dibêje: “Mîthrîdata (Mîthrîdatesê Mezin) ji bo bindestan RIZGARKER bû. Tev bindestan hawara xwe radigîhandin wî. Ji zordestiya Romeyê feqîr û jaran xwe diparast Mîthrîdatayî. Di dîrokê de yekemîn azadkerê xwilaman e. Di împeretoriya xwe de ferma azadkîrina xwilaman dabû . Bi kîşkirina Mîthrîdatesê Zîlanî li İspaniyayê li hemberî romeypê serhildan çêbû, li italyayê Spartakûs û xwilamên din serhildan. Ü Sparta-kûsî, Mîthrîdata vexwend serdestkirina İtalyayê”. (14) Gelek Qralên din ên kurd hevkariya Mitîhrîdatesî kirin. Qralê Mediyayê wê çaxê di bin serdestiya Partiyayê ve bû lê dîsa li hawara Kurdên Zîlanê çûn.

Qralê Medyayê Mîthradata ji bo alikariya Zelaniyan li gel generalê Romeyê Luculusî şer kir û di wî şerî de hat kuştin. Kurê wî Mede hat şûna wî. Zanistê ziman û şaristaniyê Prof. Dr. Izady wiha dibêje: “Mithridatesê Medyayî ji bo parastina birayên xwe yên Pontûsi çûbû şerî û di wî şerî mir. Kurê wî “Mede” Darius rûnişt şûna wî”. (15) Zavayê Mîthradatayî Tigranes, qralê Ermeniyan bû. Bi piştevaniya Mîthradatayî, Ermeniyan dewleta Seleucidê bindest kiribûn. Hewlêr û Sûriye gi-handin Ermeniyan. Ü ev desthelatiya ermeniyan dibû alikarê Mediyên ku ji bo hawara Mîtihrîdatesê Zelanî dicûn. Leşkerên xwe dışandin Kurdistanê û rêka wan diparastin, erzaq didanê.

Lê bi derbazbûna salan êdî dewleta Zelaniyan her paş ket û qels bû. Ku baş qels û sist bû Julius Sezar ê qralê Romeyê di sala (Bz.) 47'î de şiya qralê Zilaniyan Farnekesi (Pharnaces II). Ü bi wî şerî İmperetoriya kurdan yekcar hilweşiya. Pişti vi şerî Julius Sezarî ev peyvén navdar ji bo senatoya Romeyê şandin: “EZ cûm, min dît, têk bir” (Veni, vidi, vici) Pişti hilweşîna İmperetoriya Zilaniyan, Zilaniyên Pontusê ji 100 salan pirtir li Ewropayê hebûna xwe parastin. Car car împaratoriya Romeyê mafê xwerêvebirinê dida Zilaniyên Pontusê. Lé ji Zilaniyan temendirêtir dewlet ya Komageneyê bû. Heya sedsala 1'ê (Pz.) li ser piya ma. Di têkçûyîna İmperetoriya Zelaniyan de şerê birakujiyê roleke giring heye. Mezinên kurdan gelek caran şerê hev dikirin. Qralê Zilaniyên Kapadokayayê Barzanê Arî (Ario Barzan, Ariobarzanes) alikariya Julius Sezarî kiribû. Julius Sezarî ji bo xatirê vê alikariyê perçeyeke mezin ji axa Ermenistanê diyarı Barzanê Arî kir(16).

Pişti dewleta Romeyê kurdên Pontusê têk bir, dewleta Ermeniyan a hevalkarê kurdan jî dagir kir. Êdi li Asyayê tu dewlet neman ku Romeyê dagir nekiriye. Bi tenê kurdên Komageneyê xwe li ber Romeyê girtin.

Prof. Dr. Mehrdad R. Izady di pirtûka xwe ya bi navê

“Kurd” de li beşa zîlaniyan wiha dibêje: “Yewnaniyan wê çaxê ji bo Zîlaniyan digotin Persî. Ji ber ku wê çaxê Rome û Yewnaniyan ji bo tev gelên Îranî -û kurdan jî-digotin Persî . Kurd Îranî bûn û Îranî ne... Wê çaxê farisiş û kurdî pir nêzî hev bûn. Pisporê erdnigariyê Starabonî digot, medî û farisan wê çaxê ji zimanê hev fam dikirin”.

MITHRIDATISM :

Mîthradatayê 4'ê (Mithradatayê) (Bz. 120-63) dijminê Romeyê yê herî jîrek û fama tê pejirandin. Wî ferman-darêñ Romeyê yên herî fêris têñ qebûlkirin Sulla, Lic-culus û Pompey têk biribûn. Bi hûnera şerekî taybet rê neda ku Împeretoriya Romeyê dakeve Asyayê. Pir ziman jî dizanîn.

Ji bo ku xwe ji jarkirina/jehrkirina dijminan biparêze her roj hinek jar vedixwar. Da ku leşê wî hînî jarê bibe û êdî jar wî nekuje. Di zanista modern de ji vê xwepa-rastinê re Mitihridatism tê gotin.(17)(18)



ÇIYAYÊ NEMRUTÊ

Dema dewleta Osmaniyan li gel Almanan peymana çê-kirina rêya Trénan girêdaye. Endazyarekî Almanî ji bo xebatê diçe Melediyê. Ji gundiyan dibihîze ku çiyayê Nemrûdê heye û li wir peykereyên nûwaze çêkirîne. Li


gel gundiyan diçe wir û şaş dibe. Bi çöseke mezin nameyeke ji bo Profesor Otto Puchsteinê Almanî rîdike. Ü ev zanist li gel şagirtên xwe tê Kurdistanê û hûner û Dewleta kurdan bi dinyayê dide nasandin .

Wekî me li jor dît dewleta kurdên Komageneyê beriya 2000 salan li herêma Meledî, Semsûr û Zeugmayê ava bûbû. Li ser Sûriye, Hatay, Dîlok û Gurgumê (maraşê) ji belav bûbû. Ev dewlet heyâ piştî zayînê sala 72'wê li ser piya mabû. Li gel dewleta kurdên Pontusê û dewleta kurdên Kapadokyayê konfederasyon çekiribû. Kurdên Medyayê ji yekitiya xwe li gel wan xurt kiribûn. Mezin-tirîn qralê kurdên Komageneyê Mîthradathayê (Mithridatesê) 1'ê bû. Lê ji her sê dewletên kurd, mezintirîn qral yê kurdên Pontusê bû û navê wî Mîthradathayê 6'ê ye. (Mithridates VI). Jê re Mîthradathayê Mezin ji tê gotin. Mîthradathayê 1'ê li çiyayê Nemrûdê perestgeh avakirin, peykere çekirin û oleke nû derxist. Ev ol, ji yekkirinina olên Yewnanî û Îrani pêk dihat. Armanca wî ew bû ku vê olê ji Nemrûdê belavî cihanê bike. Mîthradathayî kurê xwe bi çanda Îrani û Yewnanî mezin kir. Navê bavê jina xwe li kurê xwe kiribû. Navê kurê Mitihridatesî Antiochos bû. Jixwe ev navlêkirin û yekkirina olan gaveke politîk bû. Qralê kurdan dixwestin bandora xwe li rojava û rojhilat bikin.

Piştî ku Antiochosê kurd bû qral. Bi alikariya bavê xwe ol û mizgeftên xwe pêşxistin. Pirtir peykereyên pîroz çekirin.

Antiochosî ji diya xwe pir hez dikir. Ji ber vê yekê di nivîsan de navê wî weke “Yê ji diya xwe pir hez dike” hatiye xézikandin. Navê xwe, Xweda (Theos) û yê diya xwe Xwedawend (Thea) danî bû. Di nav peykereyên xwedawendan de yê xwe û diya xwe ji çekirine. Li rex Zeusî ve li aliyê cepê peykereyê qralê Komageneyê ango yê xwe danî. Ü li aliyê Zeusî yê rastê peykereyê diya xwe danî.

Hûnera kurdên Komageneyê ji hûnera Rojhilat û Rojava têkel bû. Hûnerê ciyekî giring hebû. Di kombûna zana û hûnermend dihatin vexwendin. Û qralî ew weke hevalên xwe binav kribûn. Di dema Mîthradathayê 1'ê de giraniya hûnerê li ser rojhilat bû. Lê di heyama Antiochosî de giraniya hûnerê ket ser Rojavayê/Yewnanê.(19)



01-) Origin Of The Kurds, Prof. Dr. Izady ,
<http://www.kurdistanica.com/?q=node/2>

02 -) Strabo, XI.13

03 -) Justin, XXXVIII

04 -) Dr. Ali Şeriati, Modernizm ve Medeniyet, Yeni Zamanlar Yayınları

05 -) Justin, XXXVIII

06 - Cassius, History XXXIX

07-12- 10-19- KURD: Bir El Kitabı Kürtler (Izady,

Weşanêن Doz, Rp.84, 85, 86, 87, 88)

08 - Herodotus, I.72

09 - Calvert Watkins, "Dictionary of Indo-European Roots," 2000

10 - www.etymonline.com/index.php?term=Cappadocia

11 - Justin, XXXVIII

13 - Appian, Romaica, XII. xvii.119

14 - Cassius, History XXXIX

15 - Prof. Dr. Mehrdad R. Izady, Kürtler, s. 88, Doz Yayınlar.

16 - Cassasius, History, XLI.63

17 -) The Concise Oxford Dictionary of English Etymology, T. F. Hoad

18-) Celsus, *De Medicina* (V.23.3)

Ji bo héj agahî û ragihîna çavkaniyan:

> KURDS: Concise History and fact book (Prof. Dr. Mehrdad R. Izady, Weşanêن Taylor and Francis)

> KÜRTLER: Bir El Kitabı (Prof. Dr. Mehrdad R. Izady, Doz Yayınları)

> www.livius.org (Ji bo xwendina , Strabo, Justin, Appian, Cassius ...)

> <http://www.archive.org> (Ji bo kevnepirtûkên, Strabo, Justin, Appian, Cassius ...)

>

<http://penelope.uchicago.edu/Thayer/E/Roman/Texts/Strabo/home.html>

GOTINÊN GUNEHKAR

Û

GUNEHKARÊ BÊGUNEH

A. Bedirxan



Pirtûkên Hesenê Metê ji alî piraniya xwendevanên kurd ve têne ecibandin û xwendevan bi dilxweşî pirtûkên wî dixwînin. *Niba wî berhemekê din li berhemén xwe zêde kir.* Navé pirtûka wî ya nû “Gotinên Gunehkar” e. Ev pirtûk li Swêdê di nav weşanên Apec de û li Stenbolê di nav weşanên Avesta de derketiye. Pirtûk 172 rûpel e. Pirtûk ji alî wergêrê kurd Muhsîn Kizilkaya ve li tirkî hatiye wergerandin û niha di nav weşanên “Îthakî” de li Stenbolê derketiye.

Di pirtûka wî ya bi navê “Labîrenta Cinan” de labîrenta edebiyatê heye. Realîteya civaka kurd, rastiya gundiyên Kurdistanê, qarektera mîrê kurd di pirtûkê de hene. Gelo di pirtûka wî ya bi navê “Gotinên Gunehkar” de çi hene? Ez ê di nivîsê de şiroveya vê pirtûkê bikim û li gor zanîna xwe wê binirxînim.

Hesenê Metê di her berhema xwe de şêweyêن nû û teknîkên curbecur yên nivîsinê dicerbîne. Ew di “Gotinêن Gunehkar” de rîbaza jiyana rojane, başî û xirabiya di ruhiyeta însan de, di çerçewa pêvajoya dîrokî û mîtolojîk de digre dest û bi şêweyeke edebî û hunerî ji xwendevanan re rave dike.

Referansên Hesenê Metê yên çandî û olî guhertina însen û herweha mirov çawa dibe baş yan xirab yan ji çawa dibe gunehkarekî. Di berhemên wî de motîfên rengîn û leheng, karekter û tîpêن balkêş hene. Li hev anîn, pevgirêdan û hunandina berhemên wî edebî ne û serketî ne. Leheng û figurên wî yên ku di berhemên wî de ne kesen ji têzê yên civakê ne, kesen normal in. Tîp û figurên bi azamet, bi ihtişam, kesayetyîen pîroz û kesen pozbilind, qure û hesûd di berhemên wî de cih nagrin. Kesen normal û kesayetyîen – şexsiyetên – samîmî wek leheng û figur di berhemên wî de cihên xwe digrin.

H. Metê di berhemên xwe de peyvîn ji bîlasebe bikar nayne û berhemê di nav teferuatan de nafetisîne. Ew peyvan di cih de bi kar tîne û peyvîn ku divê bêne bikaranîn li hevudu diquncîne. Hinek berhem hene bi teferuatan hatine wermandin. Di yên H. Metê de wermandin tune, guncavtineke hunerî ya edebî heye.

“Gotinêن Gunehkar” berhemeke edebiye ku mirov dikare wê wek noveleke dirêj û kurteromanekê nûjen binav bike. Ji xwe romanêن nûjen yên nivîskarêن ewropî di navbera sed û sedûpênce, herî pir dused rûpelan de ne. Hinek kesen pozbilind û qure romanêن kurdî qels dibînin û serketî nabînin. Heta hinek eqilmendênebiaqil ji xwe dibêjin romana kurdî qet tune ye. Ro-

manêñ kurdî hene û ji xwe divê minaqeşeya ku romanê kurdî heye, tune neyê kirin. Romanêñ kurdî hene û hinek berhemêñ novel û romanêñ kurdî kême yên areban, tîrkan, farisan û heta ewropiyan nînin. Berhemêñ H. Metê û yên hinek nivîskarêñ kurd yên din weke berhemêñ ewropî, asyayî û amerîkiyan in. Divê kurd dev ji psîkojîya xwebîçûkbûnê berdin û herweha berhemêñ kurdî û nivîskarêñ kurd biçûk, neserketî û qels nebinin. Piştî van çend gotinêñ gelempêri, niha em li naverok, teknîk, awayê nivîs û hunera edebî ya berhema kurdî “Gotinêñ Gunehkar” binérin.

Di berhema H. Metê “Gotinêñ Gunehkar” de, jiyana rojane, tevgera gundiyanê û herweha hêla wê ya psîkojîk û felsefi hene. Lehengê romanê navê wî Behram e. Ew li bajarê “E” yê di dibistana bilind ya îlahiyatê de dixwine. Li bajêr xaniyek kirê dike. Navbera wî û xwedîyê xanî baş e û xwedîyê xanî wî dawetê gundê dike.

H. Metê di berhemêñ xwe de navêñ ku di nav civakê de zêde nayêñ bikar anîn, navêñ ku hatine jibîrkirin ji nû ve jîndar dike, divejîne û di berhemêñ xwe de li leheng û figurêñ berhemê datîne. Navê xwedîyê xanî Lûlúxan e, navê jina wî Geştîna ye, navê xezurê wî ji Mekrûs e.

Behram vexwendina xwedîyê xanî qebûl dike û diçe gund. Ew li gund di malê de mareke dibîne, dixwaze mari bikuje lê jina malê Geştîna nahêle ku ew mar bikuje û jê re dibêje “ev marê malê ye.”

“Gotinêñ Gunehkar” berhemeke herikbare. Di nav besan de hevudu girêdan heye. Vebêj xwendevan vala nahêle û di dwaiya her bei de di nav meraqê de dihêle.

Meraq dibe sedem ku xwendevan, dema xwendina beseke diqedîne bi meraq dest bi xwendina beşa li pey dike.

Lûlûxan ji xanima xwe Geştîna daxwaz dike ku ew bû-yera bavê xwe û marî ji Behram re qal bike. Bûyer bû-yera hîkmeteke ilahî, hîkmeteke asimanî ye. Loma xwendevan jî eraq dike ka ev ci bûyere û lewre jî xwendina xwe didomîne.

Di berhemê de gelek motivên tasavufî, olî hene. Heger xwendevan bi çavên ataîstekî, materyalistekî li berhemê binêre, dê tu qîmeteke nede pê, lê heger bi çavên edebiyatbezîkî lê binêre, li gorê pîvanên zanyariya edebî li ser bifikire û li gorê pîvanên wêjeyî wê binirxine, şirove bike, dê qîmeteke giranbiha bide berhemê.

Herweha heger xwendevan bi berçavika bawermendekî olperest û mihefezekar li berhemê binêre, dê li dij be û bibêje nivîskar gotinên gunehkariyê, gotinên kufri nivisiye û ew ji şeytan hez dike. Lê heger ew jî li gor zanyariya edebî, li gor pîvanên cure yên novel û romanê li berhemê binêre, dê li dij dernekeve. Romannîser di romanên xwe de dikarin insanên baş û nebaş biafirînin û bi destê wan bûyerên baş û nebaş pêk bînin.

Di pirtûkê de çîrokên folklorîk, xebroşkên gelêri bi şeweke hunerane cih girtine. Çîroka gola cin û periyân, çîroka Şivan û Perîzade rengek dane berhemê û xwendina wê bi mirov xweş dike. Bûyera Markûs efendi û Marî jî bûyereke balkêş e. Markûs efendî ji bo avê bîr dikole. Du zilam jî ji bo kolana bîrê pê re dibine alîkar. Markûs efendî di kolanê de zêr dibîne. Herdu zilam dixwazin bi jehrê Markûs efendî bikujin. Ew jehr dîkin

nav şîr. Lê mar derdikeve, şîr vedixwe ú Markûs efendi xilas dike. Di nav gelê kurd de gelek varyantên dosta-niya mar û însan wek çîrok, xebroşk têne gotin.

Evîn kîngê û çawa tê dikeve dilê mirov nediyare. Dema Behram keça xwediyyê xanî ku navê wê Nagîna ye, dibîne agirê evînê dikeve dilê wî. Hestêv evînî xwe li ruhê – giyanê – wî radipêce. Evîndar di çavêv hev de pir rind in. Dema yek aşiqê yekê dibe, li gor wî/wê herî rind evîndarê/a wî/wê ye. Di çavêv Behram de Nagîna wek horiyeke ku li bihuştê pengiziye. Ew ewqas pir rind e, spehî ye, bedew e.

Di berhemê de hevokeke erotik, baş û xweş heye. Dema Nagîna xwe tazî dike û dikeve avê, Behram bi dizîka lê mîze dike û xweşikî, spahîbûn û bedewiya bedena wê ya tazî bi taswîreke erotik rave dike. “Laşê wê –Nagîna- ya xweşik, pêşîrên bilind, deqêن serê memikan, li jêra pêşîran navikeke xweşik û şérîn....”

Pevşabûna Behram û Nagîna jî pevşabûneke, şadimanîyeke erotik e. Niviskar H. Metê di pirtûk û novelên xwe yên berê de sahneyên erotik rave nedikir û wî novelên xwe bi nexşen erotik nedixemilandin. Lê di vê pirtûka “Gotinên Gunehkar” de sahne û nexşen erotik hene. Ji xwe ji ber ravekirina erotîzmê û pevşabûnê ye ku lehengê berhemê xwe wekî gunehkarekî dibîne û li gor wî ew gunehkare û herweha peyvên erotik û ravekirina pevşabûnê ya bi gotinên erotik herweke gotinên gunehkariyê û gunehkarekî ye.

Di vê berhema edebî de xeyal û alegorî hene. Taswîrên xeyalî û alegorîk naveroka berhemê û hêla wê ya edebî, hunerî hîn pirtir xurt kiriye. Ravekirina gotinên Behram

yên qalkirina pevşabûnê, sahneya erotîk ya şadimaniyê û hezkirina wî ya ji Nagînayê, anku bi kurtî evîna Behram ew kiriye gunehkar û ji ber sedema vê evinê gotinê gunehkariyê ji devê wî derdikevin. Ew dibêje : “....min ji Xwedê bêtir ji wê – ji Nagîna – hez kit.”

Hevûdudîtina Behram û Mekrûs efendî xeyalî ye. Behram gelek tişt ji Mekrûs efendî fêr dibe. Gotinê Mekrûs efendî gotinê filozofî ne, manedarin, bi raz in. Mekrûs efendî bi eslê xwe ermenî ye. Nagîna – ku navê wê ê eslî li gor gotina Mekrûs efendî Demora ye- û ew newiya Mekrûs efendî ye. (Dibêjin şeytan xwe dixe her şiklî. Mirov dikare Mekrûs efendî wek şeytan bihesibîne. Yanê şeytan dikare bikeve şiklê Mekrûs efendî ji.)

Behram ji ber evîna xwe dikeve riya şeytan û êdî gotinê wî gotinê gunehkar in, gotinê gunehkariyê ne. Yê ku nebûye evîndar bi êş û xweşiya evîn û evîndariyê nizane. Yê ku bûye evîndar dizane. Dibêjin evîndar wisa pir ji hevûdu hez dikan ku hezkirina wan ya ji bo hevûdu ji hezkirina ji Xwedê/a bêtire.

Mekrûs efendî çîroka xwe ji Behram re qal dike. Ew kurê malbateke ermenî ye. Navê wî ê eslî Markûs e. Di sala ku ferмана kuştina ermeniyan ji alî dewleta împaratoriya Osmaniyan ve derket, siwariyên çekdar ji bo ermeniyan bikujin, qetl û tehcîr bikin têne gund. Li gund li ber dêra Ezîz Gevork ermeniyan kom dikan. Di nav komê de keç, jin, zarok û kalepîr hene. Mêr tunin. Diyare mîran kuştine.

Leşkerên artêşa dagirker wek kefteran çav berdidin keç û jinan û ji bo tecawizê wan bikin, wan dikşînin hundirê dêrê û li wir bi wan xirabî dikan. Diya Markûs jê re di-

bêje bireve û here mala Domîna xanimê. Markûs ji nav komê derdikeve û direve diçe mala Domîna xanimê. Domîna xanim keça mîrekî kurd e. Li gund qesra wan heye. Ew ji diya Markûs hez dike. Ew Markûs diparêze, ji kuştinê xilas dike.

Di komkujiya – jenosîda – ermenîyan de gelek ermenî ji alî kurdan ve hatin xilaskirin. Hinek dibêji alayên Hemîdî – ku ji kurdan pêk hatibû – ermenîyan kuştine. Alayên Hemîdî, ji xwe navî li sere, hêzeke leşkerî a dewleta împaratoriya Osmaniyyan bû û bi fermana dewletê tevdigeriya, kiryanan pêk dianîyan. Ji bo ku hinek ermenî bi destê hêzên çekdar yên alayên Hemîdî hatine kuştin, kurd bêne tawanbar kirin neraste û nebaş e. Di berhemeke edebî ya kurdî de qalkirina komkujiya ermenîyan tişteke baş e. Ev mijara bûyera dîrokî ya jenosîda ermenîyan wek babet di gelek berhemên edebî yên cîhanê de cih girtiye.

Di pirtûkê de mîrê mezin heye. Mîrê mezin şeytan bi xwe ye. Hevûdudîtina lehengê berhemê Behram û mîrê mezin – şeytan. – gelek balkêşe û axaftina wan a bi hevre ravekirina çîroka xuliqandina benîademan ji devê mîrê mezin – şeytan – gelek manedare. Sedemên quliqandina dinê – cîhanê – û afirandina însan ji alî Xwedê/a ve bi devê mîrê mezin – şeytan – tê ravekirin. Şîrovekirina vê ravekirinê û rastî û nerastiya wê, girêdayê ku mirov bi kîjan çavan, bi kîjan berçavikê lê dinêre. Lînêrîna li şeytan û gotinê wî ji bo materyalistekî ataîst, bawermendeke oldar ê xaçperest û misilman û ezidiyeke ji hevûdu cuda ye. Materyalist ji van tiştan bawer nakin, olperest li dijê şeytanin û êzîdî bi çaveke din li şeytan dinêrin. Li gorê olên semawî şeytan însanan dixapîne, ji rê derdixe û dixe riya xirab û wan dike

gunehkar. İnsan xebera Xwedê/a nakin, di riya wî/wê de naçin, xebera şeytan dikin û li ser riya wî diçin. Loma jî Xwedê poşman dibe ku di sureta xwe de insan afirandiye. Ji xwe di Tewratê de dibêje : "...Û Xwedê ji afirandina ademîyan poşman bû û pê eşiya."

Di pirtûkê de mîrê mezin – şeytan – ku ew xwe wek "Ahrîman" bi nav dike (di ola Zerdeştiyê de Ahrîman remz û temsîla xirabiyê ye) çiroka serpêhatiya xwe û Xwedê ji Behram re dibêje. (Lêbelê ew zayenda Xwedê/a nabêje ku gelo ew nêr e yan mî ye) Rastiyên ku li gorî şeytan rastin û gotinên şeytan li xweşa Behram diçe û ew dixwaze rastî û gotinên şeytan bike pirtûk. Ew vê daxwaza xwe ji şeytan – Ahrîman – re dibêje. Ahrîman jî jê re dibêje : "Tuyê jî pirtûkek li pirtûkan zêde bikî. "Li gorê Xwedê şeytan gunehkarê herî mezin e. Olên semawî şeytan gunehkarê herî mezin dibînin. Şeytan ku xwêdî hunera xapandinê ya bêpayane, benîademên Xwedê dixapîne û careke jî Xwedê dixapîne.

Gelo şeytan Xwedê çawa dixapîne? Piştî xapandinê ci bûyer tê serê Xwedê/a, ez ê bahs nekim. Ev bi tevahî di pirtûka "Gotinên Gunehkar" de tê qalkirin. Di pirtûkê de gelek bûyer û tiştên ruhanî, olî hene. Lehengê berhemê Behramê ku di dibistana bilind a îlahiyatê de dixwend û bawermendekî olperest bû, ruhê – giyanê – wî ji baweriya oldariyê tê şûştin û paqîj kirin. Guherînên bîrûbawerî û fikrîn oldariyê di Behram de guhertin cê-dike û ew digehure, jiyana wî tê guhertin.

Di pirtûkê de mesaja herî manedar pesinandin û nîşanda mezinahî, pîrozî û rûmet û azameta evînê ye. Evîndar ji Xwedê bêtir ji evîndarê/a xwe hez dikin.

Mesajeke din a girîng jî ev e ku; bi devê şeytan tê gotin ku gunehkarê herî mezin Xwedê/a ye.

Çima şeytan Xwedê/a bi gunehkariyê tawanbar dike? Argumentên tawanbariya şeytan bi vegotina şeytan bi devê wî di pirtûkê de tê ravekirin.

Wek çend gotinê dawîn, ez vê bibêjim;

Hesenê Metê nivîskarekî jîr c, berhemkar e. Gelek pirtûkên wî yên novelan hene. Di hêla wergerê de jî xebatê hêja pêk aniyâc û ji Puşkîn, Çexov, Dostoyevskî û ji ni-vîskarê swêdî berhemên edcbî wergerandiye kurdî.


Ew di vê berhema xwe de felsefeya başî û xirabiyê û herweha sedemên gunehkariyê bi devê leheng û figurên berhemê dide şîrovekirin. Ew xeyal û rastiyan tevlihev dike û bi hevûdu dide hunandin. Sedemên trajediya mirovan ji dema qedîm ta niha radixe ber çavan. Bandora olan û gunehkarî û hêzbûna evînê bi şêweyeke balkêş pêşkêşê xwendevanan dike.

Nivîskar di berhema xwe ya edebî de bala mirov dikşîne ser guhertina însan. Însaneke olperest çawa dikare bigehure, dide nîşandan. Di guhertina însan de bajar û gund rolên curbecur dilîzin. Hinek cih û war û hinek bûyer di-karin jiyana mirov tevlihev bikin û bigehurînin. Lehengê berhemê Behram ji bo ku aşiqê Nagînayê dibe, di hest û ruhê wî de guhertin dest pê dike û ew ber bi gunehkariyê ve ling diavêje. Rêwîtiya wî ya xeyalî gelek tişt pê dide zanîn.

Rêwîtiya Behram di esasê xwe de rêuwiya zanîstiyê û evînê ye. Ew di vê rêuwiyyê de pêrgê gelek tiştan tê. Rastê astengan tê. Ravekirina bûyerên qedîm û çîrokên mîtolojîk rengeke didine berhemê û naveroka wê xurtir dîkin. Xeyalênu ku di hişê Behram de derbas dibin ji bo Behram weke pêkanînê gunehkariyê ne.

Du ziman û romanek: Miranên Bê Wext Erken Ölümller

Azîz Aliş



Romana A. Pertev Işikê ku bi uslubekî nûjen, wekî bîr-romanê nivîsandiye, bi navê Miranên Bê Wext (Erken Ölümller) ji nav weşanên Astare bi du zimana derket pêşberî xwendevanan. Miranên Bê Wext ku tirkî û kurdiya wî wekî du pirtûkên cûda hatine çapkirin, romana nivîskar a yekemîn e.

Nivîskar di romana xwe de wekî peyîvdar e. Bi hestêن zarokê kurd ku hê di welîdîna xwe de bûye kujerê diya xwe dest bi romana xwe dike û xwendekariya xwe ji dibistana seretayî heta zanîngehê bi hurgeliyekî baldar lê-dikole. Piştî xwendekariyê jî ev car çiroka sê kurê xwe radixîne ber çavan ku kûrekî wî zabitê orduyê ye, kurekî wî humanîstekî dijî şerê çekdarî ye, yê biçûk jî gerîllayekî kurd e. Nivîskar di romana xwe de li labîrentên evîndariyê de gerekî dike û di vê gerê de hestêن ciwanekî kurd jî tîne ziman.

Mizgîn di bûyîna xwe de dibe sedem û diya wî jiyana xwe winda dike. Dibistana seretayî li cem xaltiya xwe dixwîne. Hê di zarokatiya xwe de dilê wî dikeve Botavê keça xaltiya xwe. Dibistanê navendî û lîscyê li bajêr dixwîne. Di vê navberê de malbata wî bi Botavê re nîşaniya wî çêdike. Mizgîn, ji bo zanîngehê diçe bajarekî mezin. Li vê bajarê xopan jî evîndariya du dilan derdikeve pêşberî wî. Dikeve bin bandora bedewî û famdariya du keçikên ku bi her awayî xwe ve ji hev cûda ne. Mizgînê ku di navbera her du keçikan de diçe tê, taliyê tercîha xwe ji alî Sarayê biaqilê cûhiyan bikartîne. Lê piştî ku bi Sarayê re dizewice û ji malbata xwe dûr dikeve, tiştekî ku qet nayê bîra wî çêdibe: Botav di dilxweşîyekî di navbera herduyan de ducanî maye. Mizgîn vê yekê heta bi derengî jî nizane.

Botanê kurê Botav, bavê xwe yê ku zexelî li diya wî kirî ye, efû nake, jê nefret dike. Ji ber vê nefretê, navê xwe yê Botan dike Volkan. Pişt re jî dikeve dibistana leşkerî û dibe zabitekî serkeftî ya orduyê. Kurêna Sara Dilxwîn û Baran jî zanîngehêni bi serkeftî diqedînin û yek dibe bijîşk, yê din jî dibe endezyar.

Dilxwîn, her çiqas ji malbatekî maldar û arîstokrat were jî dixwaze deynê bavê xwe yê ku ji kurda re deyînder e, bide. Ji ber vê yekê jî li bajarokekî biçûk ya kurda dest bi bijîşkiyê dike. Ew nasnameyê însanan ewqas girîng nabîne. Aştîxwazekî idealîst e û wekhevî û demokrasiyê diparêze. Baranê ku di dema xwendekariya xwe de bi tevgera kurdî re hevnasîn bûye jî, rîya azadiya kurdan di şerê çekdariyê de dibîne. Mizgînê bavê van jî di nav ray û ramanê cûda yê kurêna xwe û di nav evînêna xwe de bêçare ye.

Têbiniya kovara Ronî : Ji kurtedanasîna naveroka romanê jî diyar dibe bê romaneke bi naveroka xwe dewlemend û bi mijarêna balkêş c. Bi hêviya ku romannivîserê kurd hêja A. Pertev Işik li pirtûkxaneya kurdî romaneke din jî zêde bike. Xwendevanêna kurd li benda berhemên wî yêne nû ne.

Romana

”TOQA NALETÊ”



Aram Gernas, nivîskar û wergêrvanekî kurd e. Ji Farqînê ye û kurdîya wî baş û paqîj e. Wî bi kurdî bi sedan nivîs, gotar di weşanên kurdî de weşandiye û di redak-siyona çend kovarêñ kurdî de kar û xebat kirîye. Ji zimanê Swedî romanêñ zarokan, pîyes û kurteroman wergerandine zimanî Kurdi. Ji bo perwerdeya zarokan bi navê ‘Baxçeyê Zarokan 1,2’ du berhemên ji stran û muzîka Kurdan pékté nivîsandine. Bi navê ‘Hemend’ berhemek çirokan nivîandiye. Piyesa ‘Zembîlfroş’ ni-vîandiye. Romana Hraç Koçeryan bi navê Bêrî ji zimanê wergerandiye zimanê Kurdi. Di malperêñ Kurdi de jî li ser mijarêñ cûda cûda dînîvîsine. Mamoste Aram

bi zimanê Swedî jî dinivîsîne û endamê Pen a Swedê ye. Ji bo muzîka Kurdî jî xebatê wî hene û çend tekstên wî bûne stran. Li ser ziman û muzîka kurdî jî xebatêñ wî çêbûne. Berhema Shakespeare ya bi navûdeng “Romeo û Juliet” jî wergerandiye kurdî û weke pirtûk di nav weşanên “Helwest” de derketiye. Romana wî ya yekem di sala 2007-an de bi navê “Toqa Naletê” di nav weşanên “Doz” de li Stenbolê hatiye weşandin. Naverroka romanê li ser serpêhatiya keçeka kurd ku ji alî malbata wê ve biryara kuştina wê dane û xwestine wê bikujin, hatiye hunandin. Romaneke li gor şêweya sosyal realîzmê ye. Romaneke civakî ye.

Aram Gernas berê li Swêdê dijiya û niha li Amedê dijî. Romana Aram Gernas ”Toqa Naletê” 158 rûpele û du car hatiye çapkiran. Çapa yekem di nav weşanên ”Doz”ê de li Stenbolê û çapa duyem di nav weşanên ”Helwest” ê de li Stockholmê derketiye û ketiye destê xwendevanên kurd.

Li ser romana ”Toqa Naletê” gelek nivîsên danasîn, nirxandin, şirovekirin û analîzê hatin weşandin. Hemû jî gotarêñ hêja bûn di derbarê romanê de. Digel ewqas nivîsén hêja pêwîst nedikir ku ez jî li ser romanê binivîsim. Nivîsa min jî dê bibana weke dubarekirina wan nivîsan. Lewre wan ji xwe rastiyê anîbûn zimên û min jî dê wan rastiyen dubare bikira. Lîbelê ji amadekirina pirtûka xwe ya bi navê ”Pênce Romanên Kurdi” divê min di derbarê vê romanê de çend gotin binivîsandana û wê jî têxistana nav rûpelên pirtûkê û wê di nav pênce romanên kurdî de cihê xwe bigirtana.

Ez ê pêşî çend gotin di derbarê mijara romanê de bîbêjim û paşê bi çend hevokêñ nivîskarêñ ku li ser romanê nivîsîne hêjayiya romanê binirxînim û serketina

wê raxim ber çavên xwendevanan. Beriya ku ez dest bi pêşkêşkirina kurtenaverokê bikim ez vê jî bibêjim; li Swêdê pisporê kurd ê karmendê wezareta çandî ya dewleta Swêdê a fermî di derbarê romana "Toqa Naletê" de gotareke baş bi Swêdî nivîsî. Pisporê kurd yên wezareta çandî zû bi zû romanên kurdî naecibînin lê ev kesê pispor romana "Toqa Naletê" eciban-dibû û lewre jî baş nirxandibû.

Mijara romanê mijareke balkêşe, naveroka wê li ser êş û birîna civakî û adet û tradisyonên nebaş yên kevnare hatiye hunandin. Hêj jî di nav kurdan û gelên rojhilata navîn de jinên kurd ji ber namûsê û sedemên virde wêde têne kuştin.

Lehenga romanê Gulizar hêj fama mirinê nake, bavê xwe di serhildana Şêx Seîd da winda dike; ji zarotî derbasî ciwanî dibe lê heqê hezkirin û hilbijartinê jê tê sitidin; di bihara emrê xwe da bedewîya xwe najî, ji meya sêhirdar a evînê venaxwe; ev têr nake digel hevalka xwe dikeve ber dasa urf û adetan û êsa jêkirina poz û guhêñ hevala xwe di kûrayîya dilê xwe yê pirpitî da his dike; ferманa eşîrê wek toqa naletê dikeve stûyê wê û ew bi çol û pesaran dixe; Sîh sal ji mirinê direve û bi vê tirsê xweziya xwe bi gurê serê çiya tîne; piştî sîh salan azad dibe lê vê carê daxwaz û bendewariyên guherînê xewnîn wê derewkar derdixe û wê bi temamî ji nasnamaya wê dûr dike û davêje gerîneka nefretê li hember welat û gelê wê; bela jê venagere, kurê wê jê distîne û davêje doza kurdîtiyê, ber derê zîndanan û dinyayek din; ji vir þûnda rastî karesatek din tê û li dû kurê xwe, him dewleta ku bi serê wê sond dixwar him jî Kurdên ku bûbû nefret di dilê wê da ji nêz va nas dike. Nas dike û dikeve jîyan û têkoperiyek trajîk....

Serpêhatiya Gulizarê, vekirina dozek e li hember urf û adetên kevin; dadiyek e li hember zordestî û hizrêñ kevneþopî yêñ feodal; qırînek ragihandin, lêpirsîn û gengeþiyê ye da ku azadîya jinan bi xurtî bikeve rojeva Kurdan.

Di derbarê romana "Toqa Naletê" de birêz Eyûb Mili, Receb Dildar û Dr. Omergotarêñ hêja nivîsîn. Ez ê bi çend hevokan dîtinêñ wan jî bînim zimêñ.

Birêz Eyûb Mili di derbarê romana "Toqa Naletê" de weha dibêje :

" Naverok û struktura Romanê.

Mijara romanê serpêhatiya jinek Kurd, bi navê Gulîzarê ye. Gulîzar ji gundekî Farqînê ye. Hin biçûke, bavê wê dimre û ew dikeve ber destê apan. Apêñ wê, Gulîzarê li pismamekî wê mahr dikin. Buxtanek lê dibe, jiyana wê dikeve xeterê. Poz û guhêñ wê bê jêkirin û bê kuştin. Ji kerba ruhê xwe jî gund direve, berê diçe Diyarbekirê, cih li wir nakevê, dikeve trêñê û diçe Edenê. Li wir dizewice, dibe xwedî zaro. Gulîzar demekê li Mêrsînê ï dimîne. Paşê vedigere gundê xwe. Di piştî 20-30 salan ra li gund jî hertiş wek berê nîne.


Di romanê da du mijarêñ grîng derdikevin hole: Yek kevneþopîya Kurdan e, ya dudya Ji aliyê dewletê ve asî-milasyona Kurdan e.

Aram dûmek dirêj di nav siyasetê da bûye. Loma bandora dagirkerryê û kevneþopiyêñ kurdan rind dizane û mijar raxistiye ber çavêñ xwendevanan.

Hin kes û hin bûyer ji jiyana rastî hatine wergirtin. Struktura romanê bi hostatî hatiye hûnan. Wisa xweya dike ku Aram ji berhemên xwe yê wergerî ji wêjeya Dinê xweş nas dike. Loma bûyerên rastî û hinek çêkirî li hev tîne û dihûne.

Cî û Mekan ji rast in. Gundê Slîvan, Slîvan, Diyarbekir, Edene û Mersîn. Roman ji van deran pêtir Diyarbekirê teswîr dike.

Roman bi formê ez hatiye nivîsandin. Em romanê ji devê lêhenga romanê Gulîzarê dixwînin. Hûnan, ziman, dem û mekan xweş li hev rûniştiye. Bûyerên rastî û çêkirî bi hev ra hatine hûnan.



Trajediya Gulîzarê li gelek ciyan bi haveki lîrik têñ ifade kirin. Qahr, tirs, kelecan û heyecanêñ Gulîzarê di dâwiye da dibe trajediya gelê Kurd.

Encam. Toka Lanetê romanek bi zaravê kurmanciye. Ziman, uslûb û hûnana romanê xweş li hev kiriye. Ev roman hêjayî xilatê ye û divê wergere zimanêñ biyanî. Çunkî ev roman dikare, him bi naverok, him ji gorayê hunerê romannîvîsiyê edebiyata Kurdi temsîl bike. Eger Aram Gernas di pêy vê romanê ra graniya xwe bidi ser romannîvîsê, romana kurdî dibe xwedanê ni-vîsakarekî baş.”

Birêz dr. Omer Uluçay jî ji bo romana “Toqa Naletê” dibêje : “Bo tiştên nebaş ên ku qewimî re ”nalet“ tê gotin, wek Şeytan. Tiştê nalet ne kes in, lê kar û bare wan in, bi dû re kes jî dibil mînak. Gotinek giran e. ”Nalet li te be“ nifirek e. Nalet kirin, jî civatê derxistin e (aforoz).

Serpêhatiyê Gulîzarê ne ceribandin û xwestinêne wêne. Ew gula bi zarezar e, bi nalîn e, bi hawar e, bêkes û belengaz e, hewceyê qenciyê ye, janjîyan e; direve, bêkes û bêsitâr e, xweparastin û hesret e, neynoka jîyana jinan e, xwenasîn e. Li gor dîtina min, roman navekî, kirasekî nû dixwaze. Ji bo ku nav û naverok bi yek bibin, li hev û din bişidin.

Toqa Nalete, wek romana Yaşar Kemal Yılani Öldürseler (Ku Mar bikujin), bi taybet li ser mijara ‘di civate de jîyana jinê’ disekine. Qehremanê herdu romanen jî jin in. Jinê xwedî kul û derd, girtî û mexdûrê urf û adetan. Mijarêwan çiqas ku ji hev dûr bin jî giyan, sîtem û hewldanêne wan wek hev in. Girtîyen kevneşopiyê ne.”

Romana Aram Gernas “Toqa Naletê” weke ku min di destpêka vê nivîse de jî gotibû; naveroka romanê li ser serpêhatiya keçeka kurd ku ji ali malbata wê ve bîryara kuştina wê dane û xwestine wê bikujin, hatiye hunandin. Romanekê li gor şêweya sosyal realîzmê ye. Romanekê civakî ye.

Birêz Dr. Omer Uluçay jî bal dikşîne ser vê hêla romanê. (Di şûna ku ez vê rastiya sosyal realîzm û civakiya romanê jî nûve dubare bikim, ez bi hevokeke birêz Dr. Omer Uluçay vê rastiyê bînim zimên hîn baştir e.)

Dr. Omer Uluçay dibêje : “Di romanê de pirsgirêkên civakî; 1. Ku bira mir, li birakî din markirina jina wî ku bî maye, urf û adet e. Apê Gulîzarê Selîm jî dixwaze dîya keçikan li xwe mar bike; ku di mal de bimîne, ji ser zarokêن xwe ranebe. Lê jînik, du qîzêن xwe di mal de dihêle û dihere mîr. Herdu zarok dikevin ber destêن ap û amojinê. Ew hal ji bo jinê û zarokan, ji bo mala mazûvan pirsgirêkek mezin e.

2. ” Siftê axa, bi dû re zava ”, tiştekî zordarî, derî exlaqî û bêdînî ye. Di romanê da Mahrem Beg kirdar û mînaka wê ye. Bindestan serî daniye, bêdiî sukût mane, ji xwe re sebeb peyda kirine, wek ”gulle li Mahrem Begê kar nake, tê de nare”. Hetta ku digihê û tê Flîtê mîrxas û ciwan. Gulleya Flît, qapaxa serê Mahrem Begê parce û belav dike, wê adetê ji holê radike.

3. Derew, fesadi, bêbextî, qewadî, nebaşî li her derê, di civatan de hene. Xeloyê Çavbeloqî, tiştekî nebûyî digihîjîne gundê Gulîzarê, hin ku ewna venegerîne, malbat dest bi haziriya kuştina wan dike. Bi vegera wan re bê-pirs û bêbersiv lêdana ji bo kuştinê dikin. ”Doza namûsê ye, namûspaqîjkirin e”. Kuştin pêwist e, ku nebe poz û guh jêkirin, qewitandin, pars û belengazî guharê jinê ye. Ji peyayan re tiştek nîn e. Lê belê gelek caran ew jî tênu kuştin. Li Semsûrê, havin bû, di dema razana li ser xanîyan de guhê mîrekî bi vî sedemî hatibû bir-rîn.

4. Eliyê Rezo, minakek berbiçav e, ji bo dijîti û dijwarîya gundan. 5. Mîrkujî û tolhildan, bi destêن malbatan dibe. Li teqîbat û cezayê dewletê guhdarî nakin û bawerîya xwe pê nîn in. Dûr nêzîk dixwaze ku bi destêن xwe heyfa xwe hilînin.

6. Cendermekî dewletê tê, hemû gundi li cihê bêdera kom dike, neheqî bêhed û bêhisab e. Lêdan û tazîkirina jinan e, mîran didin ber qundaxên tivingan, li ber sile û kutekan, di bin solan. Hal perişan e û di nav xwînê de mane, lê serdanîn û bêhewldan e. Çima?


7. Xaltîya Perîxan, qala qedexekirina zimanê kurdî dike. Li dibistanan hînkirina tirkî gelek zehmet e. Kî ku bi kurdî biaxive wê ceza bixwe. Mamosteyê tirk kevirekî gilover davê destê zarokan. Kî ku bi Kurdî biaxive kevir wê di destê wi de be, heta ku hevalekî wî bi kurdî diaxive. "Kevirekî naletê" wê her roj bidin mamoste, teví ceza. Hem wê zimanekî biyanî hîn bibe, lê mixabin wê nizanibe û di ser de ceza bikşîne. A herî balkêş û xetere ew e ku, súccdar nebîne, wê hevalên xwe súccdar bike, bawerîya di nav wan de ji ortê rake. Bi vi tehrî wê fêt bibe ku berferman, bê şirîk, bê serdest, bi serê xwe bimîne, nikaribe tekiliyê peyda bike, qudûmen xweparastinê lê nemîne, muxbîriyê hîn bibe, li ser vi xesletê nebaş bisekine. Qedexekirina makzimanê Kurdî (mixabin hîn ji qedexe ye). Asimilasyona Kurdan berde-wam e. Nivîskar, li ser pirsgirêkên civakî cur be cur tehlîl û şiroveyan dike. Ew ji derfeta romanê ye. Büye-rên dirokî bi tehrekî zanistî, berfireh hatine tehlîlkirin. Xetere û neheqîya asîmîlasyona li ser kurdan berbiçav dibe.

8. Zewaca bêdil, pirsgirêkek insanî ye, li her deverê, .di her demî de heye. Lê mixabin "firotina keçan" ji heye. Zêdetir, a bi eş ew e. Keça 14-15 salî û kalê 50-70 salî, ma wê çitol bibe, ma wîjdan e? Serpêhatîyên Kejê, Lezgîn, Xezalê, Senemê, Nazê çend mînak in, di van halan de.

9. Şerê 25 salan, gelek astengî û pirs peyda kirin, ji tiştên ku hatibûn qedexekirin re azadî, li gorî rewşa cîhanê, ji kurd û kurdî re heqên civakî têñ xwestin. Pirsgirêkên mezin li ber me ne: Şer, koçberî, xizanî, belengaziya insanê li girtîgehan, qâçaxî, jînfirotin, tendurustî, aborî, tunebûna kar û bar, ciwanêñ ku li kolanan mayî, malêñ belavbûyi, cahşîti, kuştîyêñ failnegirtî, sîxurî, civata belavbûyi, nirxêñ wenda dibin û pirsêñ valahîyêñ wan. Nasîn û perwerdekirina bi zimane Kurdî, nasnameya civakî ji bo Kurdan, wekhevî û tevjiyanek bi rûmet. Toqa Naletê, romanekê rasteqîn, modern, taybet, bi kurdiyeke bedew, xwedi hunerek edebî û rastîyek kurdî ye, pirsgirêkên civatê berbiçav dike. Baş tê famkirin, hêsan tê xwendin. Teswîr, tehlîlêñ civakî û zanistî, rêza bûyeran li cîh e, di rola şexsan de kifş e, ji hev cuda ye, têra xwe ye. Hişyarî, kevneşopî, gotinêñ pêşîyan, dîrok, şirove, tehlîlêñ gîyanî hatine bi kar anîn.

Belê êdi pêwîst nake ku mirov li van gotinêñ rastîn gotinêñ din zêde bike.

K. Ronî





Paş romanên "Kewa Marî – Mêkew", "Filozof-Katibê Şêx Seîd)", " ", "Rojnamevan" , "Robîn", "Kodnav Viyan" , û gelek pirtûkên kurteçêrokan, wek "Evîn û Jiyan", "Jin û Zindan", "Evîndar" , "Gulîzar" û hinekêñ din, vaye kek Lokman Polat ji me re "Nûrheyata Licî" derxistiyê û wek soz di dawiyê vê romanê da daye, ew di demek nêz da romana "Axîna Licî" li ser têkoşîn û berxwedana Licê derdixîne.

Lokman Polat ê li Swêd dijî, û ji zû ve li derveyî welêt e, hîn bêtir damarêd xwe berdide axa Kurdistanê û xwe bi niştê xwe va hîn bêtir dizemirîne, tew naxwaze bibe biyanî. Dibe jî ew bo Swêd paş evqas dem hîn biyanî be, lê bo Kurdistanê, ew malxweyekî wefadar maye, çermê xwe wek hinek niviskarêñ me yên din nafiroşe

û zimanê Kurdi bi zimanekî dî naguhêre û her û her li gel gundiyan, cotkaran, karkir û masîvanan, keç û lawanên şervan, dayik û bavê, ku çavrêyê zarokêd xwe yêngirtî dikin dimine, bi zimanê wan ê asan dinivise, wek bi wan re ji dûriya xwe va bi telefonê dipeyive. Ki ji Kurdên Licê, Diyarbekirê, Mêrdinê, Girê Sor "Qizil Tepe" an ji Kardaxa "Kurdaxê" û Behdinan berhemêd Lokman Polat bixwêne, bi asanî têdigihîne wate û ramanêd wan berheman, û wilo niviskarê me yê delal baxekî fireh û rengareng ji gulan pêda dike, ku her kurdekkî di nav re bigere û di nav da xelkê wek xwe bibîne, bi wan re bi zimanê xwe bipeyive û ji wan her peyvekê fêhm bike. Eve ji karekî baş û mezin û giring e bo yekkirina zaravokên Kurmanciya bakur. Min berê ji di nirxandina kurteçêrokênd Lokman Polat va şeweya bi karanîna zimên berçavkiriye û li ser nivisandiye.

Ev kurteroman ji 88 rûpelan e û ji aliyê weşanên "Helwest – Förlag –" û weşanên "Doz" va, li Stanbolê, hatiye çapkiranê, hema ne diyar e, ka ev îsal derketiye an sala çuyî. Li ser bergê wê yê pêşin Nûrheyat a çeleng û bejinlihevhati bi cil û bergêd jinêndan, li ber çiyayekî bilind rawestiye, ku ji çavêd wê evîndarî û viyan dibare, hema li ser bergê paşin ew piçekî pîrtir û rûxeyidi, bi mîrankî di cil û bergêd şervanekî da, bi şûr û mertal dîsa li ber çiyaye. Eve ji naveroka kurteromanê ya serekîn e, ku Nûrheyat hem jinek xweşik û nazik e, hem ji cengawer û mîrkuj e.

Tîştekî seyr û hêja ye, mîr Zeydîn, tevî ku gelek kurêd wî hene, ew dilteng e ji ber tunebûna dotekê "qîzekê" di nav wan da, ew li ber Şêxnûrê pîroz digere û nizane ci bike, da bibe bavê keçekê. Li ser azariya "nesîheta" Şêxnûr ew her şev li ber Xwedê digere...

Di civata kurdi da, rast pir cudahî tune bû di navbera nêr û mêtê zarokan da. Keçik û kurik bi hev re diçûn ber pêz, h'êlik û h'ezèle bi daran ve girêdidan, da xwe pê ve h'êl bikin, bi hev re diçûn nêçîra çivîk û masiyan û gava bav û dayikan deng li keçikê dikirin, digorin: "Kurêl!" Ev jî taybetiyek civaka kurdî ya gundi û koçerî bû. Di romanê da Lokman Polat li ser zimanê lehengên romana xwe dibêje:" Ewlad ewlad e, ci keç be ci kur be, herdu jî şêrin in." (r.04).

Fantazî romanen xweşiktir dike û romanek bê fantazî jar û ziwa ye. Di romana Nûrheyata Licî da fantaziyek xweşik û kevnare heye, tê da agir dibe mirovek û bi Şîrvanê, dayika Şîrzad re dipeyive û daxwaz û xewnêd wê bi cih tîne. Heyv "Hîv" dadikeve ser keleha Etaxê û bi mîr Zeydîn re dipeyive. Sirûst û mirov têdighînin hevdu û bi hev re dikevin têkiliyek mirovi, harîkariya hevdu dikin.

Azadî di xewna Şîrzad da dibe asikek "xezalek" û ji ber wî direve, ew çiqas li pey asikê dibeze nagihe wê. Eve jî pir xweşik û hêja ye di romanê da.

Lokman Polat dîroka herêmê bi kar tîne û tiştê jê re di wê dîrokê da giring û pêwîst dixîne nav diyalogên romanê, wek di rûpel 12 û 13 da, ku li ser gelên Yacûc û Macûc ên di Qurana pîroz da hatîne bi navkirin û wek Iskenderê Makedonî radiweste. Wilo romana wî ber bi "Romana dîrokî" ve diçe. Li ba Ereban di vî warî da Corcî Zêdan navdar bû. Mixabin kek Lokman Polat pir guh nedaye hûrikiyên dîrokê, û hema di ser re lezkiriye. Çiqas niviskarê romanê azad be jî, lê divê mirov bo pişt û nijadên bênen hinek rastiya dîrokê jî bide diyarkirin. Di hinde waran da jî romanerê me pir kin diçe ber bûy-

eran, bo nimûne: Teví ku Şîrzad kesaniyek giring e di vê romanê da, ji bûyîna wî da ta bi ciwaniya wî tenê du rêt di romanê da hene: "Jê re kurek çêbû. Wê navê wî Şîrzad danî. Şîrzad mezin bû, êdî bûbû xort. Dilê wî ketibû Nûrheyatê..." Ez dibînim bo rewştina jîn û dorjîna kesaniyek serekîn di romanekê da ev hindik û kêm e.

Di romana Lokman Polat da afret "jin an keç" qehreman e, dadikeve qada şer, û meydanê ji mérâ dixwaze, bi wan re dikeve pevcûnên xwînî, seriyêd wan bi şûrê xwe difirîne û mejiyêd wan dipijiqîne, lê ew ne jinek normal e, efsûniye, ew ji aliyê hêzên nedîti va hatiye amadekirin û fêrkirin, û gava dikeve cengê guhartinek dikeve bejn û dîmenê wê, wek mérâ dibe.

Di vir da du pirs têna bala mirov:

- Gelo, mebesta niviskar ewe, ku jin pêdivê hêzek nedîti ye an ji pêwîst e ezman piştgirtina wê bike, da bikaribe wek mér bibe qehreman?

- An jin ne ji bo şer û pevcûnê ye, û gava ew bikeve nav cengê mîbûn li ser wê namîne û ew dibe mér, wek di romanê da hatiye, ku ew di cengê bi tevayî tê guhartin?

Di her romanekê da, di nav pevek û axiftinan da, nameyek ramanî, filosofi an siyasi heye, carina li ba hinekan, wek romanerê hêja Mihemed Uzun wilo aşkere û fireh û req diyar e, ku êdî ew pirtûk ji nav baxçeyê romanen dertê û dibe pirtûkek fêrkirina dîroka ramyarî an nasdana bir û baweriyeke, ku têkiliya wê bi hunera romanê re té birrîn. Li ba hinekan ji roman zincîrek ji bûyerên li pey hev û din e, pir baş hatine li hevhûnandin û bi hevxistin, tê da fantaziya ku bingehhek giring a romanê ye, hêja ye û ciyê pesnê ye. Bo çi

ew roman hatiye nivisandin, niviskar dixwaze ci bibêj? Ez dikarim ji wê romanê fêr bibim ci wateyan? Felsefeya niviskarê wê çiye?....

Di navbera herdu şêweyan da, roman wek hilgirê ramanekê, ji me re romana Aldous Huxley (1894-1963) "Cîhana xweşik a nûjen" nimûneyek mezin e. Aldous Huxley bo Utopiya xwe şeszed sal berekêş dibeze, da bo me cîhanek dî, cîhanek bi mirovekî dî, ramanin dî, dan û standinek dî û hevjînek dî bide nasîn, û tevî ku fantaziya zanist "Science Fiction" romanê ji serî da ta bi dawiyê digire, lê belê ew hilgirê ramanin mezin û balkêş e, ku wek geya teviya baxê romanê rapêçane. Di romana "Filosof" a kek Lokman Polat da, bêtir li ser ramanên niviskar hatiye nivisandin, lê di vê romanê da "Nûrheyata Lici", tevî evqas fantazî ú bûyer û pevçûnan, aliyê ramanê qels e. Hinek ramanên baş ên romanê hene, wek "Şêr şêr e, ci jin e ci mîr e" an "Xwekuştin gunah e." an ji diyarkirina neyarêñ gelê Kurd, lê dîsa ji mirov ji xwe dipirse: "Gelo, daxwaza kek Lokman di vê romanê da çiye?."


Di romana Nûrheyata Lici da fantaziyek xweşik ú kevnare heye, tê da agir dibê mirovek ú bi Şîrvanê, dayika Şîrzad re dipeyiye ú daxwaz ú xewnêd wê bi cih time. Heyv "Hiv" dadikeve ser keleha. Etaxê ú bi mir Zeydîn re dipeyiye.

Zimanê romanê Kurmanciyek nas e, asan e û nerm e, lê carina mera dikare hin asantir bike, wek: "Ezê bixwazim" li ciyê "Ezê daxwaz bikim." An "Mîr Zeydîn ê ci bikira" li şûna "Mîr Zeydîn dê ci bikiral..."

Kurd dibêjin:"Bila berxikekî baş bizê, bila bi derengî bê." Di pirtûkê da hinek çewtiyên çapê hene, diyare ku ji lezkirinê ye. Divê roman di ber çavan re baştirbihata derbaskirin. Wek di rûpelên 40 û 41 da. Diviya bû li ciyê "Ew çiqas di xeterê de de" bihata nivisandin "Ew çiqas di xeterê de ne." û di peveka "Tu beniademekî tune ku bikaribe şerkerê sêzdemîn..." divê peyvek wek "bikuje" li dawiyê heba, an pevek wilo ba:"...bikaribe zora şerkerê sêzdemîn bibe." an bi terzekî dî...

Şaşiyên wilo li ba gelek romaneran pêda bûne, ji ber ku roman di rojekê da naye nivisandin, demek dirêj jê re pêwîst e. Di romana Don Kîşot a Sérvantês da kerê peyrewê lehengê navdar dimire, lê paş pelekî dî ew peyrew li kerê xwe suwar dibe û bi rêya xwe da diçe... Hema pevekek wek vê pevekê di romana kek lokman Polat da, wê dilê zimanzzanan biêşîne: "Nûşîrvan zirxê hesîn ji xwe derxist!" çawa zirx ji xwe derxist?. Bêguman mebesta niviskarê hêja:"êxist", ne "derxist" e. Di romanê da, rûpel 60 da hatiye, ku Alparslanê turk navê "Kurdistan" dide welatê Kurdan û egera vê yekê ji li gor dîtina niviskarê romanê ewe, ku "tan" bi wateya "welat" e li ba Tûraniyan. Di rastiyê da ew ne ji "tan" hatiye, ew ji "stan" hatiye, weku di Ingilizî da "State", di Farsî da "Stan", di almanî da "Staat" û di hinek zarêñ dî yên Indo-Europî da ji.

Ciqas em bibêjin, yekî binivîse ji yekî nenivîse bêtir berdestiya gel û zimanê xwe dike. Lokman Polat ji gelek zîrek û xebatkar e di warê nivisandina bi Kurdî da, ew xudanê gelek berheman e, û Kurd pêdiviyê kesén wek wî ne... Ez hemî berhemêd wî dixwênim, û min gelek ji wan ji nirxandine û rexne kirine, ez ji ramanêd wî hezdikim û ji Kurmanciya wî ya asan û zîrekiya wî di her hunerek wêjevanî da...û lew re ez bo wî serkeftinê her dixwazim.



Ev pirtûka bi navê Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê, ji aliyê Zeynelabidin Zinarî ve hatiye amadekekin û Pencînar Weşanxaneyâ Çanda Kurdî li Stockholmê weşandiye.

Pirtûk 220 rûpel e ú bi çapeke cuwan, spehî û delal hatiye çapkirin. Mezinatiya wê 15x22 cm ye. Di pirtûkê de, çewa ku ji navê wê jî té zanîn, 37 şaxên cuda hene ku pêdiviya her kesî bi wan çêdibe. Ew şax ev in:

- 1- Dewlemendiya Zimanê Kurdî
- 2- Saziyê Parastina Zimanê Kurdî
- 3- Di Zimanê Kurdî de Bikaranîna Daçekan
- 4- Di Zimanê Kurdî de Zayenda Peyvan

- 5- Di Zimanê Kurdî de Tewandina Peyvan
- 6- Peyvên ku ji Peyvan Çedibin
- 7- Peyvên ku Piranetî ji Wan Çenabe
- 8- Peyvên Dijber ku Bi Herv re Têne Gotin
- 9- Li gor Toreya Kurdî, Tewrên Axaftinê
- 10- Axaftin û Nivîsandin
- 11- Usluba Axaftina Bi Kurdî
- 12- Di Zaravayê Kurmancî de, Awayê Jimartinê
- 13- Cudatiya Zimanê Kurdî ji Siyasetê
- 14- Giringiya Yekbûna Alfabeyê
- 15- Zimanekî Standart An Alfabeyeke Standart?
- 16- Kêmasiya Du Tipan Ji Alfabeya Kurdî ya Latêni
- 17- Dewlemendiya Folklorâ Kurdî
- 18- Dewlemendiya Çirokên Folklorî
- 19- Sûda Xwendina Çirokên Folklorî
- 20- Bingeja Çiroka Folklorî
- 21- Nexşeya Çiroka Kurdî
- 22- Di Çirok û Stiranên Folklorî de Mêjûya Kurdî
- 23- Di Çirok û Stiranên Folklorî de, Cil û Bergên Kurdî
- 24- Di Çirok û Stiranên Folklorî de, Çek û Teqemenî
- 25- Di Çirok û Stiranên Kurdî de Erotîk
- 26- Destanên Kurdî
- 27- Çêkirina Filîman ji Naveroka Çirok û Destanên Folklorî
- 28- Medreseyâ Kurdî û Şaxê Zanistiya Wê
- 29- Klasîkên Kurdî û Bingeja Wan
- 30- Hunera di Biwêj û Gotinên Pêşîyan de
- 31- Metoda Lékolînê
- 32- Amaca Nivîsandinê
- 33- Çewtiyên Medyaya Kurdî
- 34- Internet û Cehalet
- 35- Xetera li Ser Ziman û Toreya Kurdî
- 36- Rewşenbîr û Berpirsyariya Rewşenbîran
- 37- Îhmalkariya Rewşenbîran



ZAROK Ú ÇIROK (Destpeka Pedagojiya Kurdi)



Pirtûka Ramazan Pertev ya bi navê ZAROK Ú ÇIROK – (Destpeka Pedagojiya Kurdi) ji layê weşanxaneya Dozê ve derket. Pirtûk ji du beşan pêk tête. Beşa ewil li ser heyamên geşedaniya zarokan, li ser geşedana ziman, perwerdeya zarokan û li ser hin nerehetiyên heyama zarakatiyê sekiniye. Beşa dudoya jî li ser vegotinê gelêri û bi taybet li ser çirokê sekiniye û lêkolaye da ku ev ci bandora xwe hene li ser perwerde û psikolojiya zarokan.

Hîn nimûneyên vegotinê gelêri ji layê psikologîk û pedagojîk ve hatiye analîzkirin. Di dawiya pirtûkê de 2 testen psikolojîk hatine wergerandin bo zimanê kurdî da ku dê û bav bi rehetî karibin wan li ser xwe pêkbînine. Herwiha Ferhengokek jî bi sê zimana kurdî (kurmancî) tirkî û îngilizî hatiye amadekirin.

Nivîskarê pirtûkê Ramazan Pertev ji Diyarbekirê ye, danişmendê psikologîk e û li ser zimanê kurdî lêkolîn û lêgerînê wi hene.



Di edebiyatê da nivîskar û xwendevan Pasa Uzun

Leo Tolstoy kitaba xwe ya “şer û aşiti”, ji bo sererast-kirinê dide xanîma xwe. Xanîm, kitabî wî sererast dike û li wî vedigerîne. Tolstoy ji wê dipirse; gelo di der heqê kitabê da dîtinê wê ci ye?

Bersîva ku Tolstoy ji xanîma xwe digire eve.

“Gava kitaba te ji nû ve dinivisînim, ez dikevîm nav di-nyaya helbestan. Li wê derê ez li xwe hay dibim ku; ya ku baše ne romana te ye, ya baş û baqîl ez im.”

Lêkolînerê alman Wolfgang Iser dibêje;”xwendin platformekê wisaye ku, li wê derê nivîskar û xwendevan bi hev ra tev lîstikek fantastik pêktînin.”

Nivîskarê polonî-ingiliz Joseph Conrad di nameyekê xwe da ji hevalê xwe ra wisa dinivisîne;”xebera xweş ew e ku te ji kitaba min hezkir. Hezkirina te tê wê maneyê ku, nîvê kitabekê nivîskar û nîva din jî xwendekar dinivisîne.”

Hinek dîtin û fîkrê din yên der heqê pêwendiyên di navbera nivîskar û xwendevanan da ev in:

“Ne tenê nivîskar hunermende, xwendevan jî huner-mende.”

“Nivîskarê ku bi xwendevanê xwe ra hevkârî dike, ni-vîskarekî hêjaye.”

“Kitaba baş ew e ku xwendevanan li tecrube û serpê-hatiyên wan yên raborî, vedigerîne. Tiştên ku hatine ji bîrkirin, têñ bîra mirovan.”

“Bi xwendina kitabêñ edebî mirov nabe mirovekî baştır.”

Gelo mirov dikane baweriyekî zêtir bi kesêñ ku kitabêñ edebî dixwînin, bîne? Na!”

“Mirov, bê xwendinê ji dikane şexsiyetekî dewlemend yê ruhî û fikrî pêşda bibe.”

“Di edebiyatê da dubare kirin, terzê mirovan dikuje.”

“Nivîskarekî baş, di qismekê da gotinek du caran bikarnaîne.”

“Di romanê da bûyera bingehîn eslî ye, kakil e. Nivîskar divê ji wê kakilê derkeve rê û tevger bike. Divê carbicar paşda û pêşda biçe ku xwendevan bikanibe bêhna xwe bigire û xwe di ciyekê weke hefsxanê da his neke.”

“Her nivîskar bi awayekê, bi terzekê dinivisîne.”

Nivîskarê swêdi Jan Guillous, ji bo nivîsandina romanek hêja çar şîretên jêrîn li nivîskaran dike.

“Tiştê ku tu dinivisînî, divê zelal be û ji aliyê xwendevanan bê famkirin. Enerjiya xwe bi hewldanêñ helbestkî serf meke.”

“Tiştê ku tu dinivisînî, divê di der heqê tiştekê gîring da be. Jîyan û mir in, ji wan mijarêñ gîringin.”

“Tiştên ku tu dinivisînî, divê ji aliyê xwendevanan ve bêñ naskirin. Ji ber wê yekê, ciyêñ ku xwendevan nasdikin û zanin, bikarbînin.”


“Bêguman te romanêñ nivîskarêñ din xwendîye û tu ji wan hin tiş hînbûye. Tu wê hînbûyina xwe, di nivîskariya xwe da bikartînî. Kî çi dibêje bila bibêje, tevgerek wisa pirr xwezayî û normale. Sedîdased oriijinalitet tu derekê da tuneye.”

“Tehlûka herî mezin ewe ku; ji ber nav û dengê xwe, nivîskar dikane di bîr û baweriya xwe da bibe qels. Ji

Weke mîsal em bibêjin; nivîskar Ahmed rabû romanek nivîsand û romana xwe li gor “urf û edetên” kurdan nivîsand. Di romanê wî da keçikek ji ber mesela namûsê ji aliyê bav û birayê xwe tê kuştin.

Nuha Ahmed efendî dê çawa tevger bike? Gelo ew ê li hember bav û birayê keçikê çawa bike? Ew ê hîsiyatên wan, fîkrîn wan, dudiliya wan dê çawa ji xwendevanan ra, ji xwe ra îzah bike?

Bêguman Ahmed efendî dê nikanibe gûyekê jî bela bike. Di destpêkê da bi prensîba ji “urf û edetan ra hurmet” ve derketiye rê. Bi îrade û bîryara xwe, xwe kiriye “koleyê nasnameya nivîskariyê”. Naxwaze ku xwendevan û hevwelatiyên wî ji gotinên wî eciz bibin. Naxwaze “tiştên xelet” bike û “tiştên xelet” bîbêje. Gelo mirov ji yekî mîna Ahmed efendî ra dikane ci bîbêje?



bo ku tiştên xelet neke û tiştên xelet nebêje, tiştên ku xwendevan ji wî hêvî dike û dipê, dinivisîne.”

Nivîskarê navdar yê swêdî Stig Dagerman, wê rewşê wisa izah dike;”nivîskariya min, ez kirime kole. Ji tırsa ku ez ê navûdengê xwe xira bikim, cesareta min nemaye ku ez nivîskariya xwe bikarbînim. Di bin nasnamaya xwe ya nivîskarîyê da ez xwe evqas kole dibînim ku her hevoka xwe bi tırs dinivisînim.”

“Ji aliyê din jî nivîskar heye ku li nivîsarêñ xwe vengere. Ji qelema wan ci derdikeve, ew e.”


“Gelo ji bo ci mirov dinivisîne? Bersîva normal ev e; nav û deng û pere. Ji bo mejbûriyetê jî mirov dinivisîne. Tenêbûyin, ciyekê teng, bûyerên trajîk û hwd. jî dikanin bibin sedemêñ nivîsandinê.”

Ew fikir û dîtinêñ jorîn ji hezaran desteyek e. Kurdêñ ku bi nivîskariyê mijûl dibin, bi taybetî jî yên ku bi edebiyatê mijûl dibin, divê wan nuxteyan bigrin ber çavan û li ser wan bifikirin. Weki Jan Guillos dibêje, ne hewceye ku nivîskarêñ kurd dinyayê jî nû ve kişf bikin. Û ne mimkune jî. Divê em jî weki her kesî jî edebiyatê xwe û ji edebiyatê dinyayê hîn bibin û wê hînbûyina xwe di nivîskariya xwe da bikarbînin.

Berê vê çendekî ez rastî hevalekî nivîskar hatim. Em piçek li ser astengiyêñ nivîskaran axifîn. Di ciyekê suhbetê da tiştek wisa got,”divê em kurd li gor urf û edetêñ xwe, berhemêñ edebî biafirînin.” Min tiştek negot, lêbelê ew gotina wî jî min ra pirr û pirr ecib hat û bala min kişand.

Nuha em li ser wê gotinê piçek biponijin. Bi têginekê (kavram) tûj em dikanin, yan jî ez dikanim bibejim, çanda me kurdan ji sérî heya dawiyê li ser “tabûyan” hatiye avakirin. Ne hewceye ku wan tabûyan yekoyek bijmîrim, yên di civata kurdan da hatiye dinyayê û li wê derê mezin bûye, wan tabûyan nasdike û dizane. Piraniya wan weki urf û edet têñ navkirin û li ser civatê tesîrêñ mezin çêdikin. Pirr caran dibin sedemêñ bûyerên trajîk û xemgîn. Vê mijarê ez dixwazim bi mîsalekê vekim.

KOVAR Ü XWENDEVAN



Di weşandina kovareke de ya herî girîng berdewambûna weşanê ye. Ji bo berdewambûna weşanê jî xwendevan pêwist e. Heger xwendevan li weşanê – kovarê - xwedî dernekeve, nekire, nexwîne, nebe alîkar, ew weşan jiyana xwe ya weşanî nikare bidome.

Piştî salên 90'î li Tirkîyê gelek kovarên baş derketin, lê nikaribûn jiyana xwe ya weşanî bidominin. Yênu ku ji alî dewletê ve dihatin girtin, em li cihek bihêlin, piraniya wan kovaran ji alî aborî ve qels diketin û piştî çend hejmaran dihatin girtin.

Li Ewropayê ji gelek kovarên kurdan û yên tirkan ji ber sedemên aborî nikaribûne weşana xwe bidominin, loma jî weşana wan sekiniye. Weşanên bi tirkî û kurdî hinek têne firotin, lê yên xwerû bi kurdî li Ewropayê kêm têne firotin.

Domandina weşana kovaran bi xwendevanan ve girêdayiye. Heger gelek aboneyên kovareke hebe, heger ew kovar baş bê belavkirin û firotin, ew kovar demek dûr û dirêj dikare weşana xwe bidomîne. Kovarên rêxistinêni siyasi umirdirêj in, lewra ji ber ku bi pereyên rêxistinan, bi heqê endamtiya endaman têr derxistin. Lê kovarên ku ji alî komek mirovên rewşenbir yên heweskar ve têne derxistin, temenê weşana wan kin e. Kovarên weha baş nayêñ belavkirin, nayêñ firotin, aboneyêñ wan hindikin, loma umirkin in.

Li Ewropayê bi sedhezaran kurd hene, bi sedan komeleyên kulturi hene, lê ci heyfe ku vana nabin aboneyêñ kovarên kurdî, kovarên kurdî nakirin û naxwinin. Yêñ ku kovarên kurdî derdixin di rûnê xwe de diqijin, bi zeararê kovarê derdixin û dikevin binê deynan. Ez dizanim gava ku hinek kes vê nivisê bixwinin dê bibêjin “madem ku zirar dikin, dikevin binê deynan bila dernexin.” Çawa dernexin... Ez dernexim, tu dernexî, ew dernexe, dê ki derxe? Dewlemendêñ kurdan kovarên kurdî dernaxin. Derxistina kovarên kurdî dimîne li stuyê partî û rêxistinêñ kurdan û donkişotêñ heweskar yên wek min.

Kovar derxistin rîskek e. Heger hinek xwe nedin ber vê rîskê dê kovar dernekevin. Lê heger herkes ji vê rîskê bitirse û kovar dernexe, dê ki derbixe? Herkes bibêje; kovar derxistin zîrar e, ez çîma xwe bixim binê rîska deyndariyê, wê demê dê kovar dernekevin.

Derketina kovarek xwerû bi kurdî ji bo çand, edebiyat û zimanê kurdî destketinek e netewayî ye, hêjayiyeke çandî ye. Kovar dibistana niviskaranin. Divê di serî de nivîskar li kovarê xwedî derkevin.

Kovarên kurdî bi fedakariya mirovên dilpak û welatperwer têñ weşandinê. Divê her kurdê dilpak, welatparêz, qîmet û rûmetê bide kovarênu ku xwerû bi kurdî derdikevin. Kurdêñ welatperwer, rewşenbîr, nivîskar û siyasetmedarêñ kurd divê bibin aboneyêñ kovarênu kurdî. Kovara Ronî li benda abonetiya nivîskar, rewşenbîr, siyasetmedar û xwendevanêñ kurde. Di dema weşana kovara Helwest de hinek lêkolinerêñ biyanî ku fêrî Kurdî bûbûn, bûn abone. Hinek dostêñ gelê kurd ku bi dil û can fêrê zimanê kurdî bûne û bi dilxweşî kovarênu kurdî dixwînin, alman, amerîkî, swîsrî, holandî bûn abone. Em hêvidarin ew vêca bibine aboneyê kovara Ronî.

Me wexta ku dest bi weşana kovara Helwestê kir, gelek kes bi şik û guman bun ku dê Helwest yek, du hejmar derkeve û bisekine, weşana wê raweste. Lê Helwest ne-sekiniya, 12 hejmar derket û niha ew bi nave kovara Ronî rêveçûna xwe didomîne. Kovara Ronî dê kovarek bi naverok û çapa xwe bedew be, kovarek wek Helwestê kulturî û literature be. Û herweha dê giranî bide ser danasîn, nirxandin, analîz û şîroveya pirtûkêñ kurdî yên edebî. Di hejmarêñ pêş de em ê di derbarê pirs û pirsgirêkêñ çandî, edebî de dosyayêñ taybet amade bikin û biweşînin. Em ji niha ve dosyayek li ser rewşa romana kurdî, dosyayek li ser pirs û pirsgirêkêñ zimanê kurdî û dosyayek li ser danasîn, analîz, nirxandin û şîrovekirina pirtûkêñ kurdî û valahiya rexnegiriya edebî amade dikan. Em ji nivîskarênu kurd daxwaz dikan ku ew ji niha ve li ser van mijarênu dosyayan lêgerîn û lêkolîn bikin û nivîs amade bikin.

Belê, Kovara Helwest 12 hejmar derket û rawestiya. Niha kovara Ronî wek berdewama kovara Helwest derdikeve. Kovara Helwest li Swêdê derdiket û nedigîst welêt. Şansê kovara Ronî heye ku hem li Stenbolê û

hem li Stockholmê derdikeve û li seranserê Ewropa û Kurdistanê tê belav kirin.

Dema ku me kovara Helwest derdixist, gelek rewşenbîr û nivîskarên dilsoz û herweha hinek wergêrên kurd yên hêja bi nivîs, gotar, pexşan, danasîn, analîz, nirxandin û wergêrên xwe alîkariya kovara Helwestê kirin. Em ji wan re spas dikan. Em hêvîdarin ew ê ji kovara Ronî re ji alîkarî bikin ku naveroka kovarê dewlemend be. Di hêla danasîn û nirxandina pirtûkêñ kurdi de keda M. Yilmaz, Dawê Xanê, M. Nisêbînî, X. Uso û hwd, gelek e. Di hêla wergerê de ji keda N. Zaxuranî, M. Beşîr, Husein Muhamed û G. Çiyan gelek e. Em hêvîdarin ew ê di kovara Ronî de ji piştgiriya xwe bidomînin û keda xwe têxin nav keda kedkarêñ kovara Ronî û ji bo serketina kovarê hewl bidin. Kovara Ronî dê bi alîkarî û piştgiriya kesêñ dilpak rêveçûna xwe ya weşanê bido-mîne.





Rehmetiyê Mehmed Uzun ji kovara Helwestê gelek hez dikir . Ew bûbû aboneyê kovarê û her hejmara ku derdiket, dixwend, telefon dikan hejmara nû ya kovarê pîroz dikir, ji bo mijarêñ balkêş pêşniyaz dikir û digot "Ez ji vê kovarê gelek hez dikim." Û herweha di hêla manewî ve moral dida, piştgirî dikir.

Di kovara Helwestê de danasîn û nirxandina gelek pirtûkêñ çîrok, helbest û romanêñ kurdî hatin kirin û agahdariyêñ derbarê çand û lîteratura kurdî de hatine weşandin. Kovara Helwest ji bo edebiyatbezan bûbû dibistaneke kulturî û lîteraturî. Em ê heman tişt di kovara Ronî de ji pêk bînin û li ser şopa kovara Helwestê weşana kovara Ronî bidomînin.

Lokman Polat


Kovara Ronî bixwînin, bibin abone!

Anonsa pirtükên kurdî - Bisewtin!



www.arsivakurd.org

RONİ



PIRTÜKÊN KURDÎ BIXWÎNIN!

